Ji arşîvê: Chris Kutschera, *Ji têkoşîna bo xweseriyê ber bi meyla serxwebûnê ve (nîsan 1974)* ▶ R. 12

LE MONDE diplomatique kurdî

Çiriya paşîn 2010 - Hejmar 12 · www.lemonde-kurdi.com · info@lemonde-kurdi.com · 24 Rûpel

Dr. Selîm Temo
Hikumeta tirk ji bo çi li zanîngehan beşê kurdî da vekirin? Ma gelo ev jî ne lîstikeke dewletê be ? Serboriya me ya Mêrdînê çi nîşan dide?
▶ R. 2

Dosye
Rêxistina Ewlekarî û Hevkariya Ewropayê (REHE) çi ye? Di nava NATO û YN'yê de, hêz û desthilatdariya wê heta ku ye?
▶ R. 6

Sophie Pommier
Di qada siyaseta navneteweyî de Misir dixwaze roleke xurttir bi dest bixe. Li Rojhilata Navîn gelo cîh heye ku welatekî din bibe navenda çareseriyê?
▶ R. 15

Isabelle Saint-Mezard
Hindistan bi Îsraîlê re hevkariya leşkerî dike, lê ji hêla din ve jî bi Îranê re peywendiyên bazirganiyê datîne. Gelo Hindistan doza çi dike?
▶ R. 16

Ignacio Ramonet
Xelatgirê Nobela wêjeyê Mario Vargas Llosa çawa ji piştgiriya şoreşa Kubayê vegeriya ser heyraniyeke neolîberalan?
▶ R. 21

Fransa

Zengila fransî

Serge Halimi

Ev çil sal in ku Fransayê xwepêşandanên weha mezin nedîtibûn. Kesayetiya Nicolas Sarkozy, quretiya wî û hewla wî ya perçiqandina "dijberan" bû sedem ku li dijî wî eniyeke bihêz û berfireh were ser hev. Lê belê, hêrsa pind û girseyên mirovan ji rewş û hewesên şexsekî newelidîne helbet. Ew bersiv in ji bo tercîha medeniyeta nesax, ji bo behaneya qeyrana aborî ku bi destê komeke hikumetên ewropî ve tê birêvebirin û di paleta wan a siyasî de rengên rastgirên bêtirs û bêxem û çepgirên serşor û meslehetxwaz hene. Li Îtalyayê, birêveberiya Silvio Berlusconi, li gorî ya sosyalîstên weke George Papandreou li Yûnanistanê yan jî ya José Luis Zapatero li Îspanyayê, ne xerabtir e û ne jî serkevtîtir e. Ew jî xizmetguzariyên giştî û ewleyiya civakî dixin xeterê. Hemû, ji bo razîkirina ajansên notdanê, wisa tevdigerin ku mirov dibêje qey hewl didin ku buhayê talana ku banqeyan bi serê welatan de aniye ji berîka karkeran derxin. Digel vê yekê, banqeyên ku berpirsên vê şêlûbêlê ne xwe digêzirînin, lewre qet ne xem û berpirsiyariya wan e ku xwe wek "dilêr" û sadiq bi nîşanî nifşên dahatû bidin.

Ne ku ev "kolan" e dişiliqe, ev xelkê Fransayê ye ku derdikeve ser dikê. Tu meşrûbûneke birêveberan nikare xwe bide ber dijayetiya vî gelî. Parlamento di nav kêşmekêşa kampanyayeke serokdewletiyê de hat hilbijartin ku wê heyamê Sarkozy niyeta xwe ya reforma teqawîtiyê vedişart, lê belê piştî ku cîhê xwe qahîm kir, ev reform vê carê weke "mohra" dewra wî ya serokdewletiyê hat pêşkêşkirin. Çar meh berî ku bê hilbijartin, Sarkozy radigihand ku *"divê mafê teqawîtbûna di 60 saliyê de berdewam be"*. Salek bi şûn ve, serokkomarê nû, di bareya dirêjkirineke muhtemel a vî mafî de, weha cext li ser dikir: *"Ez wê yekê nakim* […]. *Ez bi vê îddiayê derneketime ber gelê Fransayê. Lewma, maf û selahiyeta min nîne ku ez reformeke wisa bikim. Û ev yek ji bo min girîng e."* Fransî herweha li dijî otorîteya tehrîqker a desthilatdariyê daketine kolanan, lewre bi peymaneke destûrî ya ewropî tên birêvebirin ku wan bi xwe di referandûmê de bi rêjeyên mezin red kiribû û hingê hilbijartiyên ji partiyên rastgir (bi piştgiriya çend sosyalîstan) bi rêya dengdana li parlamentoyê ev biryar dabû sepandin.

Ciwan têgihiştine ka çi dê bê serê wan. Her ku kapîtalîzm qeyranên aborî lêk rêz dike, hişmendiya xwe jî hişktir dike. Ji bo ku kapîtalîzm li ser pêyan bimîne, divê civak bêtir biderize: weke nirxandinên [xebatkaran] daîmî, reqabeta di navbera xebatkaran de, westa li ser kar. Reşxêza dawiya raporta Attali pêşniyaz dike ku êdî heta sala 2013'an maf weke xwe bimînin, pareke mesrefên nexweşiyên demdirêj (kansêr, dîabet) li nexweşan bê spartin, rêjeya BNZ [Baca Nirxê Zêdeyî] bê bilindkirin; û, gava ev hemû sazkarî têne encamdan, "mertala bacê" eynî weke xwe bimîne, qet dest nedin wê. Kevneşêwirmendê taybet yê François Mitterrand yê ku digot *"deh salên şert û bendên hişk ên sazkariyên aborî hene li ber me"*, soz da ku ew sazkariyên hişk ên di warê aboriyê de dê bi rêjeya pêdivî çavkaniyan dabîn bike.

Meha bihurî, 7'ê çiriya pêşîn, di xwepêşandaneke xwendekarên lîseyê de, xwendekarek wateya tevgera xwe weha şirove dikir: *"Serê pêşiyê em perwerde dibin: ev yek li dibistanê pêk tê. Paşê em dixebitin: ya zehmet ev e. Û paşê, teqawitî heye: yanî qerebû. Heke qerebûyê ji dest me bistînin, çi dimîne ji me re?"* Lîberalên li meydanê tinazan bi van ciwanan dikin ku di vî umrê xwe de li teqawitiya xwe difikirin. Nikarin bibînin ku fikir û saweke weha di heman demê de tawanbariyek e li polîtîkayên wan ên ku ev sî sal in biryardar û desthelatdar in û bi ser vê dahatûya bêhêvî de vedibin. Kortej û grev rê û rêbazên herî bikêrhatî ne ji bo berevajîkirina qedereke bi vî rengî.

Wergera ji fransî: Ergîn Opengîn

Almanya: 4,50 €
Awûstûrya, Belçîka, Fransa, Hollanda: 5,00 €
Brîtanya: 4 £, Danîmarka: 40 DKK, Norweç: 40 NOK,
Swêd: 50 SEK, Swîsre: 6,50 CHF, Tirkiye: 7 TL

Serhad Bapîr:
Bê nav 7, (2005), Don, 21 cm x 15.5 cm

Pîrozî û avakirina neteweyan û wêje

Guman

Îbrahîm Seydo Aydogan *

Herçend di netewebûyina civakekê de xwedan dewletbûyin ne şertê bingehîn be jî, dewlet di wê netewebûyinê de xwedan cîhekî girîng û sereke ye. Gava ku milletek him bê dewlet be û him jî di nava dewletên milletên din de bi sînoran hatibe dabeşkirin û bindestkirin, û ji parçeyên xwe yên din hatibe cudakirin, û di ser de jî, nasnameya wî û zimanê wî hatibe redkirin û bi qasî sedsalekê di siyaseteke asîmîlasyonê ya tund re hatibe derbaskirin, divê pêvajoya netewebûyinê jî li ser bingehine din were avakirin. Di rewşa milletekî weha yê parçekirî de, netewebûyin li ser bawerî an jî bîrdoziyeke hevpar tê avakirin. Di rewşeke weha de jî netewebûyina wê civakê bi xwe jî bi pirsgirêk e, lewre li parçeyên cuda û di nava bandora siyaset û ol û bîr û baweriyên cuda de avakirina bingeheke hevpar ne hêsan e.

Di nava civakên ku hê netewebûyina xwe temam nekiriye de, her tiştê nû cihê gumanê ye. Ji xwe di zanînê de guman pêvajoyeke gihîştina rastiyê ye. Civakeke di rewşa ku me li jorê behs kir de, ji ber talankirina bîra giştî û tahrîbkirina nirxên hevpar an jî yên ku dikarin bibin hevpar, bi demê re, dikare bi kesên ku wê ava dikin ve jî ji eslê xwe, bingehên xwe, û herweha, bi rêya van bingehan ve, ji parçeyên xwe yên din bi dûr bikeve. Ji ber ku ew bindest e, ne weke xwe dimîne û ne jî dişibe serdestê xwe; hingê dikare zû *dejenere* bibe. Ev dejenerebûyin him di warê çandî û him jî di warê takekesî de ye.

Gava ku li ser civakekê xetereya dejenerebûyinê hebe û ev dejenerebûyin bikare xwe bera nava kesên wê civakê bike, hingê berhemên wan kesan jî divê bi tevdîr werine nirxandin. Heger em bibêjin ku huner û wêje jî berhemeke takekesî ye ku di nava civakekê de û bi çand û zimanê wê civakê ve tê avakirin, hingê di wêjeya zimanê civakeke bi vî rengî de, *guman* dê helwêsta me ya yekem be. Pirsên ku di bingeha huner û wêjeyê de hene, mîna "çi, çima, çawa û ji bo kê", ji bo civakeke mîna ya Kurdan divê tim di bîra mirov de be, lewre civaka me ji civakên dora xwe û yên dûrî xwe bêtir dûrî çandeke homojen e.

Em vê homojeniyê di warê çandî de fahm dikin, lewre, em dizanin ku civakeke bi temamî homojen nikare peyda bibe, heger sîstemeke dîktatoryal ne li dar be; lê dîsa jî bi awayekî çandî, çi di warê wêjeyê, çi di warê zimanî, çi di warê hunerî an jî mîmariyê de be, homojeniyeke nisbî dikare were avakirin da ku mirov bikare behsa hin taybetmendiyên berhemên milletekî bike ku ew jî ji taybetmendiyên wî milletî bi xwe tên.

Herçî Kurd in, di nava axeke çar perçeyî û warekî şeş perçeyî (teva Kafkasya û Rojavayê) yê weha de ku bandora welat, çand, ol, ziman û siyasetên cuda li ser heye, civak nikare di tu waran de homojen be. Ji xwe di dema bêdewletiyê de mirov nikare ji binî ve behsa homojeniyê bike. Heger mirov pirsgirêkên civaka Kurdan yên dirokî û siyasî û takekesî jî li van ramanên jorê zêde bike, sînorên gumana ku em datînin ser karên wêjeyî û rewşenbîriya Kurdan dê berfirehtir bibin.

Di nava civakeke weha de ku ji aliyê çandî, siyasî, civakî û olî ve dûrî homojeniyê ye û herweha ji aliyê zimanê wê de jî, ji aliyê zarava û alfabeyan ve, bi rêya qedexeyên dîroka wan be jî, dabeşkirin û cudahiyên xurt hene, behskirina wêjeyeke neteweyî jî cihê gumanê ye.

Li welatên ku Kurd lê dijîn, sîstemên siyasî yên cuda li dar in. Her sîstemekê, li gora xwe siyaseteke pirsgirêka kurdî jî bi rê ve biriye. Di rewşeke weha de ku perwerdeya kurdiyê tunebe û nivîskar xwe bi xwe fêrî xwendin û nivîsandina bi zimanê xwe bibin û hejmara pirtûkên ku bikarin bi zimanê xwe bixwînin ewçend kêm be, mirov divê ji bo peydabûna wêjeyeke baş, gellekî bi sebr be. Lê belê, divê em çarçoweya vê sebrê jî diyar bikin. Lewre, ev sebr û bêhnfirehiya ku tê xwastin, divê nebe sedem ku mirov xwe ji her tiştî re kerr bike. Lewre gava ku sînorê vê sebrê zêde fireh be, hingê wateya peyva wêjeyê û rewşenbîriyê jî dikare were guhertin û her tişt dikare li ser navê wêjeyê were çapkirin û her kes dikare bibe rewşenbîr ku aloziyeke weha ya cîhana zimanekî ya bîrdoziyê

▶ R. 18

Bila her kes li ber hêlîna xwe bireqise

DR. SELÎM TEMO *

Mafê perwerdeya bi zimanê zikmakî mafekî xwezayî ye. Mirov bi mirovahiya xwe ve, bêyî daxwaz û xwestinê weke xwediyê vî mafî tê ser rûyê dunyayê. Lê weke ku tê zanîn, li Komara Tirkiyeyê (KT) ne bi tenê ev maf, zimanê kurdan û hebûna wan bi xwe jî hatiye înkarkirin. Dema mirov li serpêhatiya Kurdan a perwerdeya bi zimanê zikmakî ya sedsala dawîn dinihere, hin xalên balkêş xuya dibin. Di vê nivîsê de em dixwazin li ser vê serpêhatiyê rawestin û bi serpêhatiya avakirina beşê Ziman û Wêjeya Kurdî li Zankoya Artukluyê ve girê bidin.

Kurd weke neteweyeke ev bû du sed sal ku ji bo mafên xwe yên însanî têdikoşin û bedelên gellekî giran didin. Di vê çarçoweyê de wêjevanan jî cîhê xwe girtiye û azmûneke dîrokî daye. Mirov dikare bibêje ku wêjeya kurdî di her du sedsalên dawîn de alîgirê têkoşeran e û bi her awayî –an allegorîk an rasterast, di nav dozê de bûye. Weke mînak Pîremêrd, Goran, Şêx Nûrî Şêx Salih, Cegerxwîn, Reşîdê Kurd, Hejar, Osman Sebrî, Hêmin, Îbrahîm Ehmed navên sereke ne ku di vê mijarê de tên bîra mirov. Di serî de ji Ehmedê Xanî heya Mela Ehmedê Paloyî û Şêx Memdûhê Birîfkanî bi dehan wêjevanan rêziman nivîsîn, ferheng amade kirin, bi hezaran çîrok, peyv, gotinên pêşiyan, biwêj berhev kirin. Ji aliyê din ve kesên weke Şêx Mehmûdê Berzencî (“Le têkoşênî rizgarî minî aware damaw im / Hemû bapîrekanî dilnewaz im ya Resûlellah”), Şêx Seîdê Pîran, Salih Begê Hênêyî ku dema çû ber sêdarê helbest xwendin (“Kul bize zulm u mücazat etse, perva etmeyiz / Çünkü te’yid-i ilâhî ile mansûr olmuşuz” - Ebd li me zulm û zordarî bikin, em natirsin / Ji ber ku em bi teyîda îlahî serdest bûne), Elî Şêr ku bi du sê zimanan helbest dinivîsî (“Me ra bişîn Şahê Merdan / Ew dermanê hemû derdan”) û hwd. ku serek û pêşengên serhildanan bûn an helbest nivîsîne an jî têkiliya wan bi wêjeyê re hebûye. Hemû navên ku me hildaye û helbet navên din, bi hev re têkoşîna çandî jî şopandine. Ji ber ku zimanê kurdî (çi kurmancî, çi kirmanckî, çi soranî, çi hewramî) nasnameya gelê kurd e, kurdayetî bêyî zimanê kurdî nikare were terîfkirin. Helbet serdest jî bi vê yekê dizanin û ne tenê li perçeyekî welêt, li derveyî welêt jî her car mudaxilê karên zimanî bûne. Lê kurdî jî weke berfîna zivistanê her car ji nav berf û seqemê serî hildaye û ber bi asîmanê rûmetê ve hilkişiyaye.

Di vê serpêhatiya dûredirêj de perwerdeya bi kurdî hema bêje her car di rojeva rêxistinên Kurdan de bûye. Tu kovar tune ku hin rûpelên xwe bo fêrkirin û pêşdexistina kurdî veneqetandibe. Tu rêxistinek tune ku di bernameya xwe de cî nedabe mafê perwerdeyê. Lê heke mirov ji aliyê pratîk ve li meselê binihêre, tê dîtin ku karên hatine kirin belavbûyî ne. Em dizanin ku li medreseyan perwerdeya bi kurdî dewam dike. Digel vê yekê kurdî, di medreseyan de zimanê duyem e. Yekem car dibistana nûjen a kurdî ji aliyê rêxistina Gihandînî ve, bi xebata Ebdurezaq Bedirxan û Smayîl Axayê Şikakî, di dawiya sala 1912’an de, li Xoyê hatiye vekirin. Dibistana kurdî ku di 22’yê çiriya pêşîna 1913’an de derbasî avahiya xwe bûye, ji 8 waneyan dihate pê û 700 xwendekar li wir dihatin perwerdekirin. Lê vî karê pîroz bi tenê 5 salan dewam kir. Digel ku em dizanin Komeleya Hêvî jî hin karên fêrkirina zimanî kiriye, derdikeve holê ku ev bû sed sal ku perwerdeya bi kurdî li Bakur, ji aliyê fermiyetê ve di xew û tarîtiyê de maye.

Piştî salên dirêj, li Bakur di sala 2004’an de qursên zimanê kurdî hatin vekirin ku di serdema KT’yê de qursên fermî yên pêşîn in. Lê weke ku ji aliyê her kesî ve tê zanîn, zêde neajot, qurs hatin girtin. Divê mirov bibêje ku zimanê zikmakî li qursan nayê fêrkirin. Divê di nava malan de bê fêrkirin û li dibistanan bi heman zimanî perwerdeyê hebe. Piştî ku qurs hatin girtin, di bin banê hin derdorên Kurdan de qursên nîvfermî vebûn. Dezgehên ku qurs vekirin û girtin jî, di vê pêvajoyê de xwe nû kirin û bi rêya TZP û Kurdî-Der’an xwe organîze kirin. Nuha li Ziwan-Kom, (demekê be jî) li navenda kovara Vateyê, li hin şaxên Nûbihar-Der'ê, li Kurd-Kav'ê, li Egitîm-Sen'ê ku sendîkaya mamosteyan e û li hin dezgehên din qurs didomin.

Di sala 2009’an, di sezona duyem (bihar) de, li Zanîngeha Bilgî ya Stenbolê kurdî (kurmancî) weke dersa bijarte hate dayîn ku nuha jî didome. Di sala perwerdeyê ya 2009-2010’an de jî li Dêrsimê, li Zanîngeha Tunceliyê dersên kurdî (kurmancî û kirmanckî/zazakî) dest pê kir. Nuha li zankoyên weke Sabancî û Bogaziçiyê jî, bi awayekî nîvfermî dersên kurdî tên dayîn. Her çi qas ev çend xalên dawîn nû hatibin pê jî, dema helwesta avakirina beşa ziman û wêjeya kurdî li Zankoya Artuklu ya Mêrdînê dest pê kir, panorama weha bû.

Mixabin çapemeniya kurdî çawa jê re xuya be wisa dibîne. Lewra zû bi zû helwesta li Mêrdînê jî tev li “vebûna demokratîk” a hikumetê kirin. Di eslê xwe de vê helwestê beriya vebûnê dest pê kiribû. Cara pêşî, di çiriya pêşîna 2008’an de daxuyaniya rektorê zankoya navborî, birêz Prof. Dr. Serdar Bediî Omay, di rojnameya *Taraf*ê de derket ku qala daxwaza vekirina beşekî dikir. Piştî demekê ji zankoyê li min geriyan û bo civîna îstîşarê ez hatim vexwendin. Her çi qas li Tirkiyeyê hilbijartin di rojevê de bûn û mijara TRT6’ê dihate munaqeşekirin jî, rabûm û çûm Mêrdînê. Yanî ji dewletê tu kesî ez di xapandina vebûnê de bi kar neanîme, hay û bayê min ji dewletê tuneye.

Weke ku me li jorê jî diyar kir, rewşa fermiyet û perwerdeya bi kurdî weha tarî bû. Diviya destpêk ji derekê biherikiyaya. Piştî ku min bawer kir ku avakirina wî beşî ne di nava çarçoweya vebûnê de ye, min tenê ew şert danî ku em piştî hilbijartinê dest bi kar bikin, ji bo ku AKP vê yekê ji bo hilbijartinê weke propagandayê bi kar neyne. Doktoraya min di 9’ê gulanê de ji juriyê derbas bû. Di 24’ê gulanê de jî hatim Mêrdînê û min dest bi amadekirina dosyeya serîlêdana beşê nû kir. Hingê digel ku Dr. Evdirehman Adak ji Amedê hinekî aliyê min dikir jî, demeke dirêj bi tena serê xwe bûm. Piştî dosye çû YOK’ê (Lijneya Perwerdeya Bilind ku hemû zanko û karên akademîk di bin banê vê dezgehê de ne), nameyên îxbar û zextan dest pê kir. Dosyeya me ketibû destê sîxûr û guhbelan, di malper û rojnameyên faşîstan de digeriya. Dosyeyeke çawa bû? Ji destpêkê heya îro di wêjeya kurdî de çi hebe, kêm zêde di dosyeyê de jî ew hebû. Bernameya çar sinifan tevî hemû pilan, çavkanî û bernameya hefte bi hefte di dosyeyê de cîh girtibû. Piştî ku serîlêdan hat bihistin, tevî serok û cîgirên serokê YOK’ê, gellek navan di gellek cîhan de nerazîbûna xwe nîşan da. Li gorî planê YOK’ê li Enqere û Stenbolê du beş dê vebûna! Dîsa li gorî gotinên wan, nedifikirîn ku li welêt destûra beşekî bidana. Bi caran ev daxuyanî belav bûn. Lê YOK’ê tu amadekarî ji bo “beş”ên Enqere û Stenbolê nekiribû.

Li Tirkiyeyê di karên akademîk de sîstemek heye; heke hûn bixwazin beşekî ziman û wêjeyê vekin, du pîvek divên:

1. Fakulteya/kulliye wêjeyê,

2. Sê asîstant profesor, yanî alk. doç. dr.

Me ev her du şert jî anîbûn cîh. Lê YOK’ê destûra beşê me neda, ya “binbeşekî” da. Hin rektorên dewletê jî (weke rektorê Zankoya Gaziyê, Riza Ayhan) çavên lijneya bilind bi dadkirina dîwana bilind tirsandin. Min li hemberî biryara YOK’ê reaksiyona xwe nîşan da ku nivîskara *Taraf*ê, Amberîn Zaman, li ser nivîsî. Piştî vê reaksiyonê, ji YOK’ê hate gotin ku ew ê ne binbeşek, du sê binbeşan, di ser de jî Enstîtuya Kurdolojiyê bidin! Li ser vê yekê ez û hevkarê xwe Evdirehman Adak hefteyekê li ser biryara nû xebitîn û me dosyeya enstîtuyê tevî sê binbeşan (“Ziman û Wêjeya Kurdî”, “Dîroka Kurdî” û “Lêkolînên Çandî”) careke din şand Enqereyê.

Di dawiya tebaxê de YOK dîsa civiya, lê tu biryar nestend. Di 10’ê îlonê de biryarek diyar kirin ku nayê aqilê kesî jî! Sê rojan li ser hev daxuyaniyên cîgirê serok, Îzzet Özgenç, di çapemeniyê de cîh girtin. Li gorî gotinên wî, ji bo lîsansê destûr nedabûn, ji bo majister û doktorayê jî destûr nedabûn, ji bo post-doktorayê destûr dabûn! Di pey re Özgenç got ku ew destûrê nadin helwestên terorîst û bi terorê ve girêdayî! Gotina dawî ji bo Zankoya Dîcleyê, ya rasttir, ji bo Baroya Amedê hatibû gotin. Baroyê 10-11 meh berê (piştî daxwaza mebûsê Sêrtê yê Partiya Civaka Demokratîk, yê ku li parlamentoya Tirkiyeyê ev yek anîbû zimên) daxwaznameyek bo Zankoya Dîcleyê nivîsîbû û daxwaza beşê kurdî kiribû. Özgenç ku hiqûqnas bû, daxwaza baroyê weke daxwazeke terorîst “şîrove” kiribû. Dawiya dawî, Özgenç got ku biryara “Enstîtuya Zimanên ku li Tirkiyeyê Dijîn” dane. Li ser vê yekê, rektorê me jî daxuyaniyek belav kir ku di dîroka KT’yê de li hemberî YOK’a ku dezgeha derbekerên 12’ê îlonê ye, hê daxuyaniyek weha tund ne hatiye dîtin û ne jî bihîstin.

Rewş êdî ayan dibû, lê min xwest mudaxeleyeke dawî bikim ku ew jî, ji holê rakirina bêstatubûna “wanebêjên” kurdî bû. Weke ku me got, di hin zankoyan de kurdî weke dersa bijarte dihate dayîn, hin zankoyan jî dixwast di salên bê de heman tiştî bikin. Lê kesên ku ders didan ne kadroyên zankoyan bûn. Weke ku min cara pêşî di 19’ê sibata 2010’an de, li panêla Kurdî-Der’a Enqereyê diyar kiribû, me dest bi amadekirina qursa wanebêjiyê kir. Bi hezar hetik û cersî min amadekarî temam kirin. Kesên ku dixwazin dê di azmûneke zanîna kurdî re derbas bibûna û bi dû re jî dê biketana mulaqatê. Axir, roja azmûnê hat.

Roja 29’ê hezîrana ku, di dîroka KT’yê de yekem car bû, li dezgeheke fermî azmûneke kurdî çêdibû. 533 kesan serî li azmûnê dabû. 34 Kirmanc bûn, 499 Kurmanc. Me 50 qursiyer girtin; 12 Kirmanc, 38 jî Kurmanc. Di nav keftûleft û xwêdanê de min nehişt ku dilê tu kesî bimîne. Digel teqîbat, tenêtî û zextên dozgerê Mêrdînê ku dest danîbû ser pirtûkên min ên ku ji Swêdê hatibûn, bi kêfxweşiya pêkanîna karekî baş vegeriyam mala xwe.

Di vê navberê de, li dora sibatê êdî diyar bû ku ew ê tu beş meşan nedin, min digot qet nebe em du majisteran vekin. Lê divê muheqeq navê yekê “ziman û wêjeya kurdî” be. Hingê Adak jî li ser vê biryarê bû. Ji bo majisterê, li gorî sîstema KT’yê divê ji asta doçent û profesortiyê du kadro hebin ku em her du jî alk. doç. dr. bûn. Îcar navê Kadri Yildirim, ji aliyê Adak ve hate rojevê ku hingê li Dîcleyê doçent bû.

Piştî hatina Yildirimî helwêsta me ya li dijî YOK’ê şikiya. Ji ber ku Yildirim endamên lijneya avakirina beşê hêdî hêdî ber bi pejirandina biryara YOKê ve kişkişand. Lê Xwedê giravî ez serokê beşê kurdî bûm û min ev yek nedipejirand. Di wê navberê de bi ceweta dostekî nivîskar min ji Hüseyîn Çelik ku cîgirê serokwezîr e randevû stend. Em çûn cem wî, Kadri Yildirim nehat. Çelîk bi serokê YOK’ê re peyivî û daxwaza du majisteran gotê. Em bi vê sozê vegeriyan Mêrdînê. Lê tu pêşketin çênebûn. Xuya bû ku hikumeta AKP’yê jî, refleksa sed salî nîşan dida ku ev refleksa sed salî, tenê li ser teslîm-stendina Kurdan hatiye avakirin. Her çi qas, weke li jorê jî hatiye gotin, ji mijarê sar bûbim jî, min digot qet nebe em wanebêjan perwerde bikin. Lê bernameya wanebêjiyê jî weke gellek karên hin kurdan “ettehiyato çawa lê hato” bû. Divê sê meh bûya, lê belê, hê nebûbû du meh, bernameya perwerdeya wanebêjan ji aliyê Kadri Yildirim ve, bêyî ku ji kesî were pirsîn, hate birrîn. Me sozek dabû beşdarên azmûnê ku me dê ji her yekî re pirtûkek û nameya spasdariyê bişandaya, lê ew jî nekirin.

Dawiya dawî, di dawiya tîrmehê de êdî wextê serîlêdana majisteran hat. Ji bo vê yekê em dîsa civiyan. Min jî biryara xwe ji bo lijneya kurdî diyar kir ku ez nakevim nav karekî weha, ji endamtiya lijneyê û serokatiya binbeşê kurdî îstifa dikim. Kesên grûpê carekê tobeya xwe xirab kiribûn. Weke ku wezîfeya wan astengkirina karê bi rêk û pêk be, li hemberî her tiştî sekinîn. Rabûn û xwe bi domandinê ve girêdan, “majister” vekirin ku nuha du kes in; Evdirehman Adak û Kadri Yildirim.

Weke me li jorê got, despêkek diviya, lê gelo destpêkeke weha? Ma piştî çîroka sedsalî ku em “famekorî” kirin, ne diviya ku destpêk programatîk û tije bûya? Rektorê zankoyê weke zanîstekî xwedîetîk hevparê nerazîbûna Kurdan bû, lê Kurd? Ez bi tena serê xwe di binê bar de bûm, lê gelo derdorên Kurdan nikarîbûn alîkariyek bidana? Kurd doza gellek tiştan dikin ku mafê wan yê her tiştî heye, lê gelo ji bo kîjan daxwazê amade ne? Bi ya me, entelektuel ne mecbûr e helwesta gelemperî nîşan bide. Lê mafê tu derdorê heye ku entelektuelekî pêşî xayîn îlan bike, di pey re jî leheng bipejirîne? Dîsa bi ya me, Kurdên Bakûrî ji xwe weke federasyoneke de-facto dijîn. Dikarin dezgehan jî ava bikin, heya di fermiyetê de bê nasîn. Heta min li Amedê ji çend kesan re jî got ku dikarin li navenda bajêr du daîreyan bigrin û li ser derî weha binivîsin: “Zankoya Ehmedê Xanî”. Gelo îradeyeke weha heye? Ma enstîtu, dezgeh û weqfên Kurdan dikanên nîsk û nokan in ku nikarin dibistaneke weke ya Gihandînî ku sed sal berê li ser hîmên fidakariyê bilind bûbû ava bikin?

* Nivîskar, akademîsyen û kevne-serokê beşê Ziman û çanda Kurdî li Zanîngeha Artukluyê (Mêrdîn).

Le Monde Diplomatique kurdî
Ji aliyê Independent Kurdish Media Group GmbH ve tê weşandin

INDEPENDENT KURDISH MEDIA GROUP GMBH
Carnotstr. 4
10587 Berlin / Almanya

Lijneya Weşanê
Murad Satik
Riza Dînç

Le Monde Diplomatique kurdî

Redaksiyona Zimanî
Îbrahîm Seydo Aydogan

Alîkarên vê hejmarê
A. Celîl Kaya
Semra Polat

Berpirsê Hunerî
Hasan Huseyîn Deveci

Designer
Fabio Biasio

Tel: 00 49 (0)30 330 990 420
Fax: 00 49 (0)30 330 990 429

info@lemonde-kurdi.com
www.lemonde-kurdi.com

ABONETÎ
Independent Kurdish Media Group GmbH

Berliner Volksbank
Konto: 2284 123 010
BLZ: 100 900 10
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 00
BIC/SWIFT: BEVODEBB

Abonetiya Salane:
Almanya: 50 €
Derveyî Almanyayê: 60 €
Abonetiya dîjîtal: 20 €

Le Monde Diplomatique

Damezrîner
Hubert Beuve-Méry

Birêveberê giştî
Serge Halimi

Sernivîskar
Maurice Lemoine

Cîgirên Sernivîskarî
Martine Bulardi
Philippe Rivière
Anne-Cécile Robert

Redaksiyon
Alain Gresh
Mona Chollet
Pierre Rimbert
Dominique Vidal

Birêveberê hunerî
Alice Barzilay

Dokumantasyon
Olivier Pironet

Sekreter
Sophie Durand
Monique Salomé

Tel: 00 33 (0) 153 94 96 01
Fax: 00 33 (0) 153 94 96 26

1-3, rue Stephen-Pichon,
F-75013, Paris, France

Dîroka neteweperestiya Kebekê

Şoreşa bêhnfireh pêk nehat

BENOÎT BRÉVILLE *

Çarsedsaliya bajarê Kebekê sala 2008'an bi mirêsdariyê û bêpîvan di nava derxistineke pêş a serfiraziya yekîtiya neteweyî ya Kanadayê de hate pîrozkirin. Bi xêra sed û pêncî milyon dolarên ku hikumetên cuda dane, fîloyeke ji çil keştiyên babirkî ji La Rochelle'ê (1) da rê da ku derbaskirina Atlantîkê temsîl bikin, konserên belaş hatin organîzekirin (Céline Dion, Paul McCartney...), filmek li ser dîroka Kebekê bi dehan hefte her êvar li ser ekraneke li derve ya 60 metroyî bilind û 600 metroyî fireh hat nîşandayin, û hwd. Li hemberî vê, salvegereke din hebû ku bêyî ku zêde balê bikişîne derbas bû: pêncî saliya "şoreşa bêhnfireh", destpêka bipêşketina xweseriyeke pêşverû ku bi avakirina sîstemeke civakî ya bipêşketîtir bi dawî bû. Ji hingê ve, ji ber ku neteweperestiya kebekî dev ji armancên pêşverû berdaye, bû sedema wendabûna wê. Gelo dîrokê karîbû rêyeke din bidaya ber xwe?

Sala 1960'î, serokê Partiya Lîberal a Kebekê (PLQ) Jean Lesage li şûna damezrînerê Yekîtiya Neteweyî ya zêde muhafezekar Maurice Duplessis bû serokwezîr. Li vê devera fransîaxêv ku paytexta biyanî lê serdest e, xetimîna aborî bûbû sedema bêkariyeke zêde (sala 1960'î, % 9.2) û bêyî ku destwerdaneke dewletê hebe, ya ku li qadên perwerde, tenduristî û xizmetên civakî de serdest dêra katolîk bû. Hikumeta nû ku slogana "xwediyê mala xwe" afirandî, dest bi "modernkirina" Kebekê kir – wateya peyva modernkirinê hingê ne kêmkirina ji xizmetên civakî bû.

Keynesyanîzma col ya neteweperestiya aborî ya mîmarên "şoreşa bêhnfireh" rê li ber peydabûna dewleteke civakî ya ku îlhama xwe ji Brîtanyayê girtî vekir. Yekdestdariya sîgorteya tenduristiyê lêçûnên sektora tenduristiyê girtin ser xwe û ya teqawîtbûyinê ya Kebekê jî kete şûna sîstema teqawîtiyê ya dewleta federal a Kanadayê ku têrê nedikir. Bi misogerkirina belaşbûna perwerdeyê hikumeta lîberal kir ku perwerde were demokratîzekirin. Û ji bo ku para dewletê di aboriyê de zêde bike, şîrketên dewletê (qaseyên veşartin û bicîhkirinê, şîrketa giştî ya fînansmanê û hwd.) ava kirin. Şîrketên elektrîkê (Shawinigan Water and Power Company, Quebec Power, Southern Canada Power...) bi tevahî kirin malê dewletê û vê yekê kir ku Hydro-Quebec bibe nîşana serfiraziya fransîaxêvan ya ji nû ve peydabûyî.

Van reforman hemûyan kir ku di sektorên dewletê û sektorên nîvdewletî yên herêmî de hejmara karker û karmendan gellekî zêde bibe. Tu alaqeya "şoreşa bêhnfireh" bi şoreşeke civakî û gel re nîne: ew ne li ser rêyan, lê belê di hundirê buroyan de pêk hat. Ew sîstema aborî rexne nake, lê rê li ber peydabûna bûrjuwayeke nû ya fransewîaxêf vedike. Di erka dewletê û sektora taybet de û her weha di nava şîrketên kebekî yên mîna Bombardier an jî Quebecor'ê de jî ku carinan di asta global de derdikevin pêş, qiymeta vê bûrjuwayê zêde dibe. Elît zimanê xwe diguhere.

Civat diqirqile

"Şoreşa bêhnfireh" a xwe ji tevahiya tesîrên sosyalîst şuştî dîsa jî hîmê neteweperestiya çepgiran pêk tîne. Neteweperestiya ku berê di destê dêrê de bû – dêrê xwe weke parêzvanê ziman, çand û dînê Kebekiyan nîşan dida – ji hingê ve kirasekî aborî û civakî li xwe dike. Kombûna ji bo Serxwebûna Neteweyî (RIN) ya ku sala 1960'ê hatiye damezirandin veguherî yekemîn tevgera siyasî ya xweserîxwaz a çepgiran. Ev tevger mêtingeriya kapîtalîzma anglo-sakson ya li ser karkeran aşkere rexne dike û ji bo grevê pişta karkeran digire: di karxaneyên Dominion Ayers, Canadian Gypsum, Armstrong Corck yan jî Best Ever Shoes'ê de milîtanên wê tevlî xwepêşandanan dibin û belavokan belav dikin. Eniya Azadkirina Kebekê (FLQ) ku sala 1963'an hatiye damezrandin jî rengê radîkal yê vê polîtîkbûna neteweperestiyê ya li çepê pêk tîne. FLQ piştgiriya tevgera çekdar dike.

"Şoreşa bêhnfireh" di heman demê de dibe sedema xurtkirineke rewşenbîrî û civakî. Fikra marksîst kete zanîngehê û kir ku kovar û weşan derkevin holê ku li gorî aliyê hatî girtin rê da ber nîqaşên civakê. Di qada hunerî de şêwazeke nivîsê ku "devoka kebekî" li ser qaxezê bi cîh dike, û jê re dibêjin *joual,* wejeyeke weha pêşniyar dike ku guh bide gel. Bi "sînemaya yekser" derhênerên belgefîlman bêyî ku çivan bidin xwe şert û mercên jiyana Kebekê dikin fîlm. Ev kelekel li taxên karkeran jî belav dibe, cîhê ku komeleyên xelkê (kooperatîvên berxwuriyê, klînîkên gel, komeleyên kirêdaran) lê peyde dibin da ku berjewendiyên herêmî yên karkeran biparêzin.

Di vê rewşa rexneya civakî ya zêde de endamên ku ji Partiya Lîberal a Kebekê veqetiyan û di nava Tevgera Desthilatdarî-Komeleyê (Mouvement Souveraineté-Association) de gihîştin hev, sala 1968'an Partiya Kebekî (PK) damezirandin ku RIN'a ku hê nû hatibû fesihkirin û Kombûna Neteweyî (Ralliement national) ya muhafezekar di nava xwe de vehewand. PK'ya ku bi destê elîta nû ya fransîaxêv ku bi xwe encama "şoreşa bêhnfireh" bû tê birêvebirin, dixwaze meyilên neteweperest bigihîne hev û çîna karker bixe nav refê serxwebûnê. Ev stratejî bi hilbijartinên herêmî yên nîsana 1970'ê de hat piştrastkirin, di van hilbijartinan de PK'yê % 23.6'ê dengan bi dest xist. Heft parlemanterên wê li herêmên hilbijartinê yên karkeran an jî xizanan (Maisonneuve, Gouin, Saint-Jacques, Sainte-Marie, Bourget, Lafontaine, Saguenay) kursiyên xwe bi dest xistin. Serokê partiyê René Levesque kêfa xwe tîne: "*tiştek bi taybetî girîng e: piştgiriya ku me di nava çînên gel de peyda kir, çînên ku me herî zêde di ser guhê xwe re avêtiye.*" Heke serkevtin hê nehatiye bi dest xistin yekane sedema vê ew e ku "*hêzên pereyan, hêzên* statu quo*'yê ditirsiyan ku îmtiyazên xwe ji dest bidin*".

PK'ya ku bi kelecana civakî û rewşenbîrî ve êdî ber bi çepê ve hatiye kişandin, pesnê reformên pêşverû dide ku ji prensîbên "şoreşa bêhnfireh" dibihurin. Di dema kongreya sala 1972'an de endamên wê nîqaşa beşdarbûn û birêvebirina hevpar dikin, û biryarê didin ku konseyên karkeran û komîteyên şîrketan ku ji aliyê karkeran ve werin hilbijartin, damezirînin. Bêyî ku li ber rewabûna sîstema kapîtalîst rabe, manîfestoya wê digot "*em ê her tê de bixebitin ku ew berhemên ku halêhazir şîrket*ên taybetî *wan tînin ser bazarê, ber bi sektora dewletê ve biçin*" û pêşxistina aboriya kooperatîf erê dike (2). "Hêzên pereyan" fikaran dikin: li gorî serokê konseya karsazan Charles Perreault serxwebûnxwaz dixwazin "*rola ku dewlet li welatên sosyalîst ên rojhilatê Ewropayê pê radibin, bidin dewletê (...), dixwazin hilberînê bi navendekê ve girê bidin, planeke mecbûrî ava bikin û desthilatdariya tevahî bixin destê dewletê. Divê em li bendê bin ku aborî kêmûzêde weke ya li Polonya, Çekistan yan jî rojhilatê Almanyayê bi pêş keve.*" (3)

Di hilbijartinên sala 1976'an de PK bi ser ket û bû sedema matmayineke giştî. Bi soza referandûma li ser desthilatdarî-komeleyê di dawiya dewra wî ya desthilatdariyê de, René Lévesque bû serokwezîr. PK'ya ku di vê navberê de bû desthilatdar siyaseteke bacê ya bi tevahî guhertî qebûl kir. Ji budceya xwe ya destpêkê û pê ve kevne-aborîzanê "şoreşa bêhnfireh" wezîrê maliyê Jacques Parizeau êdî pîvana bacê li gorî mûçeyên reel hesab nedikir (û ne li gorî mûçeyên navlêkirî yên li pey buhayan tê). Wî lêçûnên dewletê gihandin asta herî jor, baca li ser karê şîrketan kêm kir û hejmara karmendên dewletê jî cemidand. Roj êdî ne roja mezinbûna dewletê bû, ya piçûkkirina wê bû: stûnên dewleta civakî di bin barê qeyrana aborî de diteweiyan. Piştî birêvebirineke hişk a aboriyê ya çar salan, hikumetê êdî hew karîbû xwe bisipartaya pirsa civakî. Wê êdî li ser tevlêbûyina dezgehên fermî pirs ji xelkê kir û çû referandûmê; "na" bi hêsanî û pirranî (% 59,5) bi ser ket.

Vê têkçûyinê kir ku neteweperest û çepgir bikevine reşbînî û bêmadiyeke xirab. Sala 1982'an di encama lihevnekirinên îdeolojîk û dijberiyên navxweyî de du rêxistinên sereke yên radîkal (Herne şerr! Û Partiya Kommunîst a Karkeran) ji hev de ketin, lê belê bi yekdengiya Margaret Thacher û Ronald Reagan, PK'yê bi kêmkirina lêçûnên dewletê bersiv da xirabçûna aborî. Têkçûyina hêviyan ya li pey hev, bû sedema ji nû ve derketina holê ya îdeolojiyên dijberiya kollektîf ên ku bi kêrî ekolojiyê û "îdeolojiyên ezeziyê" tên. Ev "îdeolojiyên ezeziyê" têra xwe ji aliyê bazirganiyê û reklaman ve hatin bikaranîn û berê awirên xwe dane ser jiyana taybet, başbûna bedenê, derûnê û hîssiyatê. Rewşenbîr her ku diçe bêhtir ji qada gel dûr dikevin: angajmana dehsalên bihurî cîhê xwe ji dewra serdestiya pisporên zanîngehan û şêwirmendên mîrî re hişt. Çepgirên kebekî her ku çû bêhtir serxwebûn jî bîr kir, li aliyê din tevgera xweserîxwaz a ku li dora PK'yê kom bûye mijara civakî û aborî dide aliyekî û li dora neteweperestiyê digere.

Bi fikara zêdekirina xweseriya herêma Belle Province'ê Partiya Kebekî her ku çû bêhtir veguherî parêzvaneke dilsoz a bihevguhertina serbest. Ji bo vê heger lazim be amade bû ku tev li hikumeta fédéral jî bibûya. Sala 1989'an tevî patronên şîrketan û serokwezîrê muhafezekar Brian Mulroney piştgirî da Peymana Bihevguherîna Serbest (ALE) ya di navbera Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê û Kanadayê de. Sala 1993'an, tevî ku herêmên din, pirraniya sendîkayan û raya giştî li dijî Peymana Bihevguherîna Serbest a Bakurê Amerîkayê (ALENA) bûn jî PK'yê bê şert helwêsta xwe parast û piştgirî da hikumeta lîberal a Jean Chrétien. Argumana wê jî ev bû: heke girêdana aboriya Kebekê bi Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê re zêde bibe, di rewşa serxwebûnê de ev yek wê destûrê bide ku Kebek xwe li dijî zextên malî yên muhtemel ên Kanadayê biparêze. Xetereyên yekrengkirina çandî û zirarên civakî yên ku ev peyman dibe sedema wan ne xema wê ne.

Asêbûyina di nava pirsgirêkên nasnameyî de

PK dîsa jî nafikire ku navika xwe ya bi Ottowayê ve ye, bibire. Li gorî desthilatdarî-komeleya ku sala 1995'an hatiye pêşniyarkirin, tevahiya peymanên navneteweyî (di navê de endametiya Rêxistina Peymana Bakurê Atlantîkê NATO'yê jî heye) dê bihatana erêkirin, dolarê Kanadayê dê dewam bikiraya û devereke bihevguhertina serbest dê bihataya parastin – ango Kebek bi tevahî diket nava sîstema bakurê Amerîkayê: dewleta siberojê ji roja jidayikbûna xwe û pê ve wê ji beşek navgînên xwe yên kirin û çalakiyan bê par hiştî be. Serkevtina "na"yê ya 29'ê îlona 1995'an li ser hemanekê bû (% 50,6).

Weke nîşaneke werçerxa çandî ya neteweperestiya Kebekê, serokwezîrê ku endamê Partiya Kebekê ye, Jacques Parizeau, têkçûyinê bi "*pere û dengên etnîk*" rave dike. Rast e, koçberên nûhatî ku pirraniya wan ji çînên herî jêr in, alaqeyeke zêde nîşanî partîzanên desthilatdariyê nadin. Bi xeyala Kanadayê ew dev ji welatê xwe ber didin da ku li Montréalê bi cîh bibin û alîgiriya wan a doza neteweperest divê hê bi tevahî nû were avakirin. Ji sala 1981'ê û vir ve di belgefîlmê Denys Arcand ê bi navê "*Le Confort et l'indifférence (konfor û xemsarî)*" de koçberekî yewnanî dema çêlî referandûma pêşî dike, rêya ku mirov divê bidin ser, nîşan dida: "*Kapîtalîst hemû dibêjin dengê 'na' bidin (...) Ez karker im û ez ê pişta karkerên Kebekê bigirim. Heke hêza karkerên kebekî* zêde bibe, hêza min jî dê zêde bibe. V*aye sedemeke din ji bo ku mirov dengê 'erê' bide*". Jê nehat ku projeyeke civakî ya ku mumkin bû koçber jî bi fikrê serxwebûnê ve girê bidana, PK nuha hewl dide ku baweriya koçberan bi başiyên çanda Kebekê bîne û bi vê jî xwe di nava pirsgirêkên nasnameyî de asê kir ku tê de projeya netewe bi xwe têra xwe dike. Herdu partiyên sereke bernameyên aborî yên dişibin hev şopandin – qutkirina lêçûnên xizmetên civakî yên PK'yê di 1996-1997'an de û yên PLQ'yê di 2004'an de –, ji hingî ve pirsgirêkên çandî û zimanî mijarên nîqaşên raya giştî ne. Delîla herî nû pêşniyara "qanûneke laîkiyê" ya PK'yê ye. PK'yê sala 2010'an bi vê bersiv da komîsyona li ser "lihevkirinên mantiqî" ya ku ji 2006'an ve hewl dide ku dubendiya bala siyasî û çapemeniyê li ser mijara koçberiyê zêde bike.

* Dîroknas. Navenda dîroka civakî ya sedsala 20'an a Zanîngeha Paris 1'ê.

1- Li rojavayê Fransayê, li qiraxa okyanûsa Atlantîkê

2- Quand nous serons vraiment maîtres de chez nous (Gava ku em bi rastî jî bibin xwediyê mala xwe), weşanên Partiya kebekî, Montreal, 1972

3- Radio-Canada, 9'ê gulana 1972'an

4- Diane Lamoreux, "Le rôle des intellectuelles et intellectuels en sciences sociales dans le débat politique actuel", (Rola rewşenbîran û rewşenbîr di zanistiyên civakî û di nava nîqaşên siyasî yên rojevê de) in L. Balthazar, G. Laforest û V. Lemieux, Le Québec et la restructuration du Canada, 1980-1992. Enjeux et perspectives, (Kebek, û ji nû ve avakirina Kanadayê, 1980-1992. Armanc û perspektîv), Septentrion, Sillery, 1991

5- Bixwîne: Jean Pichette, "Régime minceur, version social-démokrate" (Parêza zeîfbûnê, versiyona sosyal-demokrat) û Gérard Duhaime "Offensive contre l'État social au Québec" (Li Kebekê êrîşa li dewleta civakî), Le Monde diplomatique, çileya paşîna 1997'a, û tîrmeha 2004'an

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

Hewldana bidestxistina bi şûn ve

Kevneserokwezîr û hîmdarê şoreşa bêhnfireh Jacques Parizeau (*Le devoir*, 8'ê çiriya paşîna 2008'an) di sala 2008'an de digot ku "*heger em bazarê jî amade bikin û mirovan fêrî wê bikin, ew ê xirab nebe*". Fêrî çi ? Taybetkirina qismî ya Hydro Québec'ê ku monopola enerjiya dewletê di destê wê de ye û di 1963'an de ava bûye. Deftera pêşniyarên sempozyûma salane ya Partiya Kebekî ya gulana 2010'an biryar daye ku "*xizmetên ku halêhazir ji aliyê Yekdestdariya Sîgorteya Tenduristiyê ve miso gerkirî ne*" di ber çavan re derbas bike. Kêmkirina xizmetên civakî û taybetkirina şîrketên dewletê: ji bo rêxistineke hê jî ji xwe re dibêje "*pêşverû*" û girêdana xwe ya bi "şoreşa bêdeng" re îddîa dike, pêşniyarên ecêb in.

Sala 2007'an partiya Kebeka Hevgirtî (Québec solidaire) hat damezrandin. Ev partî karûbarên civakî li pêşiya pirsa neteweyî digire. Ev partî di nava çepgirên Kebekê de ku sîh salan siya ewrên neolîberalîzma Partiya Kebekê li ser wan bû, weke rohniyekê xwe dide der. Êdî ev partî divê ji nû ve çînên gel bi dest bixe ku di mijara piştgiriya serxwebûnê de zêde bê alî ne. Erkeke gellekî mezin e. Di hilbijartinên herêmî yên 2008'an de partiya "ekolojîst, femînîst, serxwebûnxwaz û rexnegira globalîzmê" yek parlemanter da hilbijartin. Ev serkevtina li taxeke halxweşan a Montréalê, Plateau Mont-Royalê û encamên lawaz ên li herêmên hilbijartinan ên xizanan an jî gundan, dikin ku mirov guman ji kapasîteya Kebeka Hevgirtî bike ku bibe partiyeke gel.

QAZAKISTAN

Qazakistan an jî jeopolîtîkaya Ewrasyayê

RÉGIS GENTÉ *

Qazakistan bi hemû hêza xwe ve hewlê dide ku amadekariyên kombûna bilind a Rêxistina Ewlekarî û Hevkariya Ewropayê (REHE) bike ku divê di rojên 1 û 2'yê çileya pêşîn de pêk were. Ev kombûn li Astanayê, li paytexta nû ya vê komara Asyaya Navîn a Sovyetên berê, pêk tê. Di destpêka 2010'an de, kêm kesan bawer dikir ku rêveberê vî welatî birêz Nûrsûltan Nazarbayev – yê ku nuha welatê wî ji REHE'yê re serokatiya demkî dike- bikare bala nûnerên 56 welatên endamên vê rêxistina navneteweyî bikişîne ser herêma navîn ya Asyayê. Ev nûner ji serokên dewlet an jî hikumetan û ji wezîrên karên derve pêk tên.

"Destpêkirina gotûbêjên aşkere û di asta jorîn de mijara gotinan nîne. Pêwîstiya civakên Ewrasyayê bi belgeyeke giştî heye ku wan hemûyan li gorî pîvanên Helsînkî û Şerta Parîsê bi hev ve bide girêdan", ev gotin yên berpirsê beşê REHE'yê di wezareta karê derve ya Qazakistanê de, birêz Serjan Abdykarimov in û di rojnameya rûsî Vremya Novostei de hatine weşandin.

Em nikarin bibêjin ku Astanayê hewl daye ku bala derdorên navneteweyî bikişîne ser xwe. Herweha, em nikarin xemên wê yên li ser parvekirina berpirsiyariyên cîhanê nebînin, ew di xemên xwe de ji dil e. Li vê derê, em di derbarê pêwîstiyên veguhertina rêxistinekê de ku ev bi salan e li ser pîvanên bingeha xwe dilerize, neaxivin. Ji her tiştî girîngtir, divê em li vê derê bibiryarbûna serokê Qazak, a di derbarê tenzîmkirina vê çalakiyê de, bibînin û bizanin ku ew dixwaze wateya jeopolîtîk a Qazakistanê derxîne pêş û siyaseteke nû ya karê derve biafirîne.

Bikaranîna gotina "ewrasyayî" ji aliyê Abdykarimov ve bêwate nîne: li vê derê ew dixwaze balê bikişîne ser zimanê fermî yê vê komara ciwan ku rayedarên wê dixwazin di navbera pirsgirêkên navxweyî û yên derve de girêdanekê bidin çêkirin. Gotina ewrasîzmê xwediyê wateyeke îdeolojîk e, ew ji aliyê neteweperestên rûs ve hatiye bikaranîn. Bi vê gotinê, wan xwestiye nasnameya welêt li gorî jeopolîtîka wî ya "çandî" û rewşa wî ya di navbera Ewropa û Asyayê de diyar bikin. Serokkomar Nazarbayev di pirtûkeke xwe de weha dibêje "Qazakistan li Asyaya Navîn e, li vê herêmê tenê li vê dewletê mirov dikare çanda Ewropa û ya Asyayê bi hev re bijî. (…) Dewlemendiya curbicur a çandan dikare bi me bide qebûlkirin ku em hêsantir çanda Ewrasyayê bihewînin". Daxwaza ewrasîzmê di destpêka salên 1990'î de derketiye holê ku wê demê ev welat nû derbasî pêvajoya serxwebûnê dibû. Ewrasya weke tercîheke girîng a li dijî bandora Rûsan derketiye pêş. Wê demê nîzama navxweyî pirsgirêka herî mezin bûye: Nazarbayev ji daxwaza Moskovayê ya di derbarê axa li bakurê Qazakistanê de ku şêniyên wê herêmê bi pirranî rûs in, ditirsiya.

Di têkîliyên navneteweyî de, ewrasîzm ne bi tenê derfetê dide ku ew li hemberî Rûsyaya mezin rêzê bigire û ji wê jî rêzê bibîne, herweha bi kêr tê ku ev dewleta ciwan bikare girîngiya xwe ya jeopolîtîk bide naskirin û ji xwe li qada navneteweyî siyaseteke derve û gotareke fermî ava bike. Ji 1997'an û vir ve Astana paytexta Qazakistanê ye, herweha ew, bi zimanê fîzîkê, şiklê heman stratejiyê yê "3D" ye. Ev bajar li nava Qazakistanê, li ser axeke azib, ji aliyê Nikita Khrouchtchev ve hatiye avakirin. Ew ji Almatayê çêtir li ser axa Qazakistanê hakim e. Ji ber ku paytexta Qazakistanê ya kevn, Almata, li başûrê welêt e, li dûrî wan herêman e ku şêniyên wan bi pirranî rûs in.

Mîmariya bajarê Astanayê li gorî modeya ewrasyayî hatiye çêkirin: mozaîkeke ultra-modern, avahiyên wê bi giranî bi cam in, dekorên wan jî li gorî stîla rojhilatî û sovyetîk in. Herweha mîmariya birca Bayterek ku li navenda bajêr e û bilindiya wê 90 metre ye, li gorî dara jiyanê ya bapîrên Qazakan hatiye çêkirin. Bi giranî bi hesin û camê hatiye avakirin, weke ampûleke ku di nava diriyan de hatibe çandin, ev avahî weke sembola "ronesansa" gelê qazak e. Tu rêveberekî biyanî bêyî ku serdana vê avahiyê bike û çend gotinên hêja li ser wê bike, ji vî bajarî naçe.

Eger hewce ye ku em xeta girîng a siyaseta derve ku ji aliyê birêz Nazarbayev ve tê meşandin bînin zimên, beriya her tiştî em dikarin bibêjin ku ew tim hesabê Moskovayê dike. Ew naxwaze ne jestên mezin ji bo hêza desthilatdar bike, ne jî ji provokasyonan re derfetan bihêle –hin rayedarên din ên komarên sovyetên berê weha dikin-. Di hemû biryarên serokê dewleta qazak de ev pîvan hene: giraniya Rûsyayê digire ber çavan… nahêle reaksiyona wê bikişîne ser xwe.

Divê were zanîn ku sînorê vê komara Asyaya Navîn bi Rûsyayê re 7511 kîlometre ye. Asta bazirganiya di navbera van du welatan de jî hêjayê gotinê ye: di nava 14 herêmên Qazakan de 7 hebên wan cîranên Rûsyayê ne. Di van herêman de tu fîrmayek tuneye ku bi Moskovayê re bazirganiyê neke. Muxtaciyên ji hevdu ku ji dema bloka sovyetê maye, hê jî dewam dike; bi taybetî di warê komunîkasyonê de, ji aliyê Rûsyayê ve tê destekkirin. Digel serxwebûna ku di salên 1990-1991'an de hatiye bidestxistin, siyaseta hevkariya aborî tim hatiye parastin. Di 6'ê hezîrana 2010'an de, li gorî daxwaz û biryara Astanayê, di navbera Qazakistan, Rûsya û Rûsyaya Spî de yekîtiya sînorên bazirganiyê hatiye ragihandin. Ev rewş li gorî berjewendiyên hemû kesan e, çi ji bo Rûsan û çi jî ji bo Qazakan, di pirr aliyan de ew xwediyê heman çandê ne. Zimanê rûsî, bi awayekî dorfireh ji aliyê 16 mîlyon Qazakan ve tê axavtin. Ji Kostanayê heya Almatayê, ji Aktaou heya Pavlodarê, mirov bi giranî li televîzyonên rûsî temaşe dikin. Bi giranî wêje bi rûsî ye, çi ya di asta bilind de be û çi jî di ya zanistî de, ragihandinî an jî gelêrî be… Bi kurtasî, Moskova weke aktorekê ye ku divê di her aliyî de pê re danûstandin hebin û bi wê re were jiyîn.

Birêz Nazarbayev hertim balê dikişîne ser wateya girîngiya têkîliyên bi Rûsyayê re "di siyaseta Qazakistanê ya karên derve de, têkîliyên digel Rûsyayê xwediyê cihê herî girîng e" û weha dewam dike "ev têkîlî, di navbera du welatan de, bi baweriyeke bilind dimeşin". Ji 20 salan vir ve, ev têkîlî hertim di asta bilind de hatiye meşandin û di vê navberê de bi hejmareke mezin serdanên rayedarên payebilind pêk hatine. Ev têkîlî bê navber dewam dikin. Bandora van têkîliyan li ser jiyana siyasî û herweha li ser karê saziyan jî heye. Herweha di navbera partiyên desthilatdar de jî, Partiya Nour-Otan û ya Rûsyaya Yekbûyî, peymanên dualî yên hevkariyê hatine îmzekirin.

Astana, bi hevkariya digel Kremlînê bawer e û piştrast e ku êdî ew welatê mezin dê berjewendiyên wê biparêze. Lewre ew, bandora Moskovayê ya li ser rewşa aborî û çandî, dijberî berjewendiyên xwe nabîne. Çendîn caran daxwazên Qazakistanê bi awayekî aşkere tên zimên û bandorê li ser asta têkîliyên her du welatan çêdike, lê belê tu car ew daxuyanî nebûne sedema qeyranekê.

Li gorî vê komara ciwan a qazak, serxwebûn di siyaseta derve de derbas dibe. Divê bi rêya siyaseta derve hemû berjewendiyên welêt werin parastin û ew ewle be. Di vê çarçoweyê de rayedarên vê komarê dixwazin bi Rûsyayê re têkîlyên baş bimeşînin lê belê nekevin bin bandora wê. Di heman demê de ew dixwazin bi hêzên din re jî têkîliyên xwe baş çêbikin û bimeşînin.

Axavtina li gorî ewrasîzmê derfetan dide ku Qazakistan bi Çînê re, Rojava re (Amerîka, Yekîtiya Ewropayê û welatên heman parzemîna pîr), Asyayê re, (Singapûr, Koreya Başûr, Malezya) û Rojhilata Navîn re jî têkîliyan çêbike. Ne bi tenê di warê îdeolojîk de, Qazakistan dixwaze rola pireya di navbera Asya û Ewropayê de bilîze, lê belê ew hewlê dide ku siyaseteke pirralî, bi rêya REHE'yê, Rêxistina Hevkariya Shanghaî (RHS), Konferansa Hevkarî û Pêşxistina Baweriyê li Asyayê (KHBA), Civaka Dewletên Serbixwe (CDS) û hwd. jî bimeşîne. Bi vî awayî, rayedarên vê komarê dixwazin diyar bikin ku ew deriyên welatê xwe ji cîhanê re vedikin.

SERHAD BAPÎR: **Hawar**, (2005) Teknîka tevlihev, 21 x 15.5 cm

Di encamê de mirov dikare bibêje ku siyaseta derve ya qazak bi dînamîzm û dorfirehiya xwe ve mirov matmayî dihêle. Pêkanîna kombûna bilind a REHE'yê ku divê di destpêka çileya pêşîn de pêk were, yek ji dehan çalakiyên siyaseta vê komarê ya karên derve ye. Ev welat pir însiyatîfan digire, di gellek platformên nîqaşan de beşdar dibe, pêşniyarên xwe di platformên curbicur de tîne zimên. Ev nêzîkahî li hemû deverên Asyaya Navîn tê qebûlkirin, weke garantiya ewlekariyê tê dîtin -bi taybetî ji 11'ê îlona 2001'ê û herweha ji pêşketina pirsgirêkên jeopolîtîk ku di cîhanê de hene û bi vir ve- Birêz Nazarbayev dixwaze Singapûr û Malezyayê ji xwe re weke model bigire ji ber ku van her du welatan karîbûn rewşa xwe ya aborî pêş bixin û herweha asta demokrasiyê jî bilind bikin.

Bextê Qazakistanê di bin erda wê de ye. Ew di nava wan 16 welatan de cih digire ku di cîhanê de herî zêde xwediyê neftê ne. Eger nefta kana Qaşaganê ku di binê deryaya Hazarê de ye li gorî kapasîteya wê were derxistin ew dikare di nava 5 welatên serî de cihê xwe bigire. Lê belê, ev tabloya Mendeleyev e ku dewlemendiyê pêşkêşî vî welatî dike. Divê were zanîn ku di 2009'an de ev welat bûye yekemîn berhemkarê ûranyûmê. Pirr derfetên Astanayê hene ku bikare siyaseta xwe baştir bi ser bixe.

Li Qazakistanê di sektora hîdrokarbonê de Çîn weke aktora di rêza yekem de ye. Wê di sala 2005'an de boriya neftê vekir, da ku ew bikare nefta xam a qazak bikişîne rojhilata xwe. Di ser deryaya Hazarê re Qazakistan dixwaze rêyekê jî ber bi Rojhilatê ve veke. Ev rê ji wê re dibe pire ku ew bikare zêrê reş ê Kaşagan ber bi bazara cîhanê ve bibe. Heman proje ji aliyê koma fîrmaya fransî Totalê ve tê meşandin. Divê were zanîn ku ligel van du projeyan li Bakurê Qazakistanê jî projeyek heye. Ev proje ji aliyê Caspian Pipeline Consortium (CPC) û Atyrau-Samara ve tê meşandin û ew di ser axa Rûsyayê re derbas dibe. Di dawiyê de ji derveyî firotina neftê divê were zanîn ku Qazakistan hewlê dide ku îdeolojiya xwe ya ewrasyayî pêk bîne. Ji bo vê jî ew sozê dide ku di navbera Rojava û Çînê de rêyekê veke- herweha di navbera Çînê û Rojhilatê Ewropayê de jî (rêya erdî û ya hesinî). Bi vî awayî, ew ê di nava bazirganiya mezin de cihê xwe bigire. Di demeke nêzîk de Fransayê jî di siyaseta pirrhêl ya Nazarbayev de cihê xwe girtiye. 6'ê çiriya pêşîna 2009'an, serokkomar Nicolas Sarkozy çû Astanayê û li wê derê serdaneke kurt pêk anî. Di wê serdanê de di navbera du welatan de peymanên hevkariyê hatin îmzekirin û Qazakistan weke hevkarê stratejîk hate binavkirin. Herweha, peymaneke 4 mîlyar euroyî jî hate îmzekirin. Salek piştî re, heman serdanê encam da û di navbera Astana û pîşesaziyên parastinê ên Rojavayî de (EADS – European Aeronautic Defence and Space Company –, Thales, Eurocopter…) peymanên kar hatin îmzekirin. Dema ku Qazakistan van têkîliyan bi welatên Rojavayî re datîne û bi pêş ve dixe, ew hewlê dide ku bi Moskovayê re jî hertim di nava pêwendiyeke baş de be; kirrîna malên amerîkî an jî çînî dikare Kremlînê bi awayekî ciddî aciz bike.

Bêguman lîstoka dengeyê ku Nazarbayev di navbera hêzên mezin de bi rê ve dibe , ji kanên petrolê yên fireh û ûranyûm û dewlemendiyên din jî îstifade dike. Gelo ew ê têrê bike ku ev komara ciwan a Asyaya Navîn bikare dîplomasiyeke baş bimeşîne ?

* Rojnamevan e, li Tiblîsê kar dike û berpirsiyarê Kafkasya û Asyaya Navîn e.

Wergera ji fransî: Ahmet Dere

Hevpeyvîn bi Kanat Saudabayev re

GAËL GUICHARD-SHERBINA

Gaël Guichard-Sherbina: Ji bo Qazakistanê, serokatiya demkî ya Rêxistina Ewlekarî û Hevkariya Ewropayê (REHE) di sala 2010'an de tê çi wateyê?

Birêz Kanat Saudabayev, wezîrê karên derve yê Qazakistanê:

Biryara 56 welatên endamên REHE'yê ya li ser emanetkirina serokatiya demkî tê wê wateyê ku ev welat encamên ku welatê me ji dema serxwebûnê û vir ve di warê pêşketina aborî, civakî û siyasî de bi dest xistine, nas dikin. Serokatiya demkî ya vê rêxistinê, ji bo welatekî post-sovyetîk û asyayî berpirsyariyeke pirr mezin e. Ji roja destpêkê û bi şûn de me li gorî krîterên bingehîn ên vê rêxistinê helwêst girt û bi alîkariya welatên endam û tevlêbûna wan ve, me kar kir.

Ji bo Qazakistanê mijara herî girîng çi bû?

Afganistan yek ji mijarên herî girîng e. Herçend ev dewlet di nava sînorên coxrafîk ên REHE'yê de nebe jî, zêdetirî 43 welatên endam bi wê re aleqadar in û dixwazin ji pirsgirêkên wê re çareseriyekê bibînin. Herweha, digel ku di demeke nêzîk de leşkerên hêza hevpeyman dê ji Afganistanê derkevin, me hemû derfetên xwe bi kar anîn ku ev rêxistin di çareseriya Afganistanê de zêdetir bibandor be. Pirr girîng e ku ji vir û bi şûn ve pêvajoya alîkariya însanî were destpêkirin. Û di vî warî de REHE dikare pirr tiştan bike. Ji aliyê din ve, dema ku me serokatiya demkî ya REHE'yê hilgirt ser xwe, me hêvî nedikir ku li Bîşkekê bûyer biqewimiyana, û di meha nîsana bihurî de ev welat biketaya nava qeyraneke siyasî. Di karê me de ev pirsgirêkên ewlekariyê bûn mijarên herî girîng.

Hûn çawa dibînin, gelo pirsgirêkên li Qirgizistanê dikarin weke kêmasiya REHE'yê werin dîtin, an jî di rûdana wan pirsgirêkan de çi kêmasiyên rêxistinê hene?

Heger hûn ji min bipirsin, ez mijarê wisa formule nakim. Tu kesî hêvî nedikir ku qeyraneke weha biqewimiyaya, ne REHE'yê, ne Qirgizistanê bi xwe, ne rêxistinên din ên navneteweyî û ne jî welatên cîran. Dîsa jî, REHE'yê hemû derfetên xwe kirin xizmeta hewldanên ji bo dîtina çareseriyekê. Ji roja 7'ê nîsanê û bi şûn ve, yanî rojek piştî destpêka bûyeran, Qazakistan, weke serokê demkî yê vê rêxistinê, ket nava hewldanên girîng. Beriya her tiştî bi Sekreterê Giştî yê Neteweyên Yekbûyî, birêz Ban Ki-moon, bi nûnera payebilind a Yekîtiya Ewropayê birêz Catherine Ashton re ku bi karê derve û siyaseta ewlekariyê re wezîfedar e, me diyalogeke baş meşand. Heman rojê nûnerên me yên taybetî çûn Bîşkekê.

Em hertim bi rayedarên nû yên Qirgizistanê re di nava têkîliyan de bûn, nuha jî em bi wan re heman diyalogan dimeşînin, da ku tansiyon bikeve. Ji van zêdetir, serok Nûrsultan Nazarbayev, serokê amerîkî Barack Obama û serokê rûs Dmitri Medvedev hertim di nava diyalogeke nêzîk de bûn. Armanca wan ew bû ku qeyran zêde kûr nebe û Qirgizistan nekeve nava pêvajoyeke tarî ya şerrê sivîl.

Me komek ji polîsan çêkiriye ku, ew bi armanca şêwirmendiyê biçin Qirgizistanê da ku hilbijartinên ku divê di nîvê çiriya pêşîn de pêk werin, baş derbas bibin. Bi armanca çavdêriya hilbijartinên li Qirgizistanê, me komîsyonek di bin berpirsiyariya endamê Civata Giştî ya REHE'yê birêz Kimmo Kuljinen de tenzîm kiriye. Di derbarê pêvajoya hilbijartinan de REHE di pirr aliyan de alîkariya şêwirmendiyê daye Qirgizistanê. Bi awayekî din em dikarin bibêjin ku REHE'yê hewl daye ku ew bi rêxistinên din ên navneteweyî re û bi taybetî bi yên weke Neteweyên Yekbûyî û Yekîtiya Ewropayê re, karekî bi bandor bimeşîne û li vî welatî nirxên demokrasiyê biparêze.

Hûn dibêjin REHE jî tê de kesî nedît bê ev qeyran çawa qewimî. Gelo ev rewş bixwe kêmasiyeke pêşbîniyê dernaxîne holê?

Divê pirs bi van gotinan were kirin. REHE neçar e ku mekanîzmayên xwe yên li ser pêşbîniyê û herweha yên li ser çareseriya qeyranan, di ber çavan re derbas bike. Hebûna ewqas pirsgirêk û rewşên aloz diyar dike ku di mekanîzmaya rêxistinê de kêmasiyeke bibandorbûnê heye. Em hêvî dikin ku ev pirsgirêkên ku hatine "cemidandin" dê bikevin rojeva kombûna bilind ku divê di rojên 1 û 2'yê çileya pêşîn de li Astanayê pêk were.

Tê zanîn ku Qazakistanê, çareseriya van pirsgirêkên ku hatine "cemidandin" kiribû wezîfeya herî girîng a dema serokatiya xwe. Roja 7'ê çiriya pêşînê, we îşaretek dabû ku hûn mijara rêhesina navbera Chisinau û Odesayê bikin rojeva xwe. Ew rê di nava axa Transnistreyê de derbas dibe ku daxwaza serxwebûna xwe dike.

Di rastiyê de ev gaveke baş e. Em li ser vê mijarê kar dikin û hewldanên me jî dewam dikin. Piştî ku rewşa Moldovyayê hinekî baş bû, ev pêvajo dê bikeve asteke din. Ez jî çûm herêma mijara gotinê, li wê derê min bi hin nûnerên her du aliyan re hevdîtin pêkanîn. Lewre, ez bawer im ku em dê bikarin di derbarê çareseriya pirsgirêka Transnistreyê re xweşbîn bin.

Ji wê derê hûn hêvî dikin ku dê çareseriyek were dîtin?

Ez dixwazim bibêjim ku divê gav bi gav em bi pêş de herin. Beriya her tiştî, pêwîst e ku em ji hemû derfetên baş sûdê werbigirin da ku em bikarin bigihîjin asteke çareseriya pirsgirêkan. Lê belê, ez bi taybetî dixwazim bibêjim ku kilîta çareseriyê di destê aliyên pirsgirêkê bi xwe de ye. Em bi tenê dikarin navberkariyê û ji pêvajoya çareseriyê re jî alîkariyê bikin.

Gelo hûn difikirin ku di pêşketina rêxistinê de alîkariyeke we gihiştiyê?

Di nava wî karê ku me daye pêşiya xwe de, beriya her tiştî mijara nêzîkkirina welatên li rojavayê Viyanayê û ên li Rojhilatê xwedî cîhekî girîng e. Herweha, em dixwazin baweriya di navbera welatên endam de jî xurttir bikin. Dîsa, herçend demeke direj e ku pêvajoya şerrê sar derbas bûbe jî, em dixwazin sedemên ku dikarin bibin bingehên pirsgirêkan ji holê rakin. Di hin aliyan de em dikarin bibêjin ku piştî wan 11 salan ku di bin însiyatîfa Serok Nazarbayev de derbas bûne, gellek karên serkeftî ji aliyê welatê me ve pêk hatine, serokatiya demkî ya REHE'yê û destpêkirina amadekariyên kombûna wê jî yek ji wan e. Em bi hêvî ne ku ev kombûna Astanayê dê bibe sedema bihêzbûneke rast a rêxistinê, da ku *civakên ewle* yên ewro-atlantîk û ewro-asya bikarin bi hev re di nava têkîliyên baş de bin û bi ewlehiyê bijîn.

Bi gotina "civakên ewle" hûn dixwazin çi bibêjin ?

Cudahiya sereke ew e ku di navbera herêman de astên curbicur yên ewlekariyê hene. Hin herêm ji yên din zêdetir ewle ne. Dema ku em di derbarê civakan de diaxivin, ev tê wê wateyê ku em dixwazin ku hemû herêm bibin xwedî asteke ewlekariyê ya weke hev û pirr baş.

Di domahiya van yanzdeh salên bihurî de gellek pirsgirêk li hev zêde bûne, vê yekê jî berpirsiyariya REHE'yê mezintir kiriye; cîhan guheriye, lê belê hemû dever weke hev bi pêş ve neketine. Lewre, divê berpirsiyarên neteweyî yên welatên endamên REHE'yê bi awayekî pirr ciddî gengeşiyê bikin û biryaran werbigirin.

Însiyatîfa ku di derbarê peymana ewlekariya Ewropayê de dikeve ser Federasyona Rûsyayê dê bibe mijareke sereke ya kombûnê. Di derbarê ji nû ve formulekirina sîstema ewlekariya Ewropayê de, pirr pêşniyar hatine kirin. Pirraniya van pêşniyaran li gorî rewşa reel a dema pêş in. Em hêvîdar in ku ev kombûn dê ji van mijaran hemûyan re bibe bersiv.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

SERHAD BAPÎR: **Quling**, (2005) Boyaxen bi don, 21 x 15.5 cm

EWROPA

REHE, rêxistineke ewlekariyê ya kêmnas

FABIO LIBERTI *

Rêxistina Ewlekarî û Hevkariya Ewropayê (REHE), li rex Hevpeymaniya Atlantîk (NATO, Rêxistina Peymana Atlantîka Bakûrî) û Yekîtiya Ewropayê (YE), yek ji wan sê rêxistinên navneteweyî ye ku ji bo ewlehiya parzemînê Ewropayê dixebitin. Lê belê tenê ew e ku pêncî û şeş welatan bi xwe ve digire, ji Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê (DYA) di ser Rûsyayê re heta digihîje dewletên Asyaya navîn û dewletên ewropayî. Bi vî rengî, li dunyayê, rêxistina herî girîng a ewlekariya herêmî ye. Digel vê, çalakiyên wê û rola wê bi raz û nihêniyan pêçayî ye: REHE'ya ku di fiîliyatê de li bal pirraniya hemwelatiyan nayê nasîn, gellek caran digel Rêxistina Hevkarî û Geşedana Aborî (RHGA) tê têkelkirin.

Lê belê, REHE di gellek waran de serkêş bûye. Li welatên Ewropaya navendî û Ewropaya rojhilatî heta dawiya heyama şerrê sar, sêwiran û pêkhatina wê di berbelavbûna bizavên parastina mafên mirovan de roleke mezin lîstiye. Bi vî rengî, beşdariyeke xurt kir di rûxîna bloka Sovyetê û bidawîhatina dijminatiya Rojhilat-Rojava de. REHE herweha yekemîn rêxistina navneteweyî bû ku boçûna global a ewlekariyê (polîs, leşker, aborî, mafên bingehîn, û hwd.) ku îro gellek şirîn e li ber dilê Yekîtiya Ewropayê, di çalakiyên xwe de tetbîq kir. Diyar e ku sekreterê giştî yê NATO'yê dil heye ku ji bo Hevpeymaniyê kelkê ji vê têgehê [ewlekariya global] wergire û tê de bixebite ku di civîna lûtkeyî ya bê de ku dê dawiya sala 2010'an li Lîzbonê pêk bê, konsepteke stratejîk a nû bê pejirandin.

REHE bi rengekî resmî sala 1975'an hate damezrandin. Rêxistina ku bi biryarnameya dawîn ya konferansa Helsinkiyê ve hate avakirin, wê çaxê navê Konferansa Ewlehî û Hevkariya Ewropayê (KEHE) lê bû. Heta dereceyekê berhema siyaseta derve ya Henry Kissinger'ê wezîrê karên derve yê Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê bû. Piştî ku Kissinger dest avêt hewldanên xwe yên ji bo aştkirina peywendiyên di navbera Dewletên Yekgirtî û Çînê de –sala 1972'yan, gerra Serokdewlet Richard Nixon bi Pekînê bû nîşana dîsa birêketina peywendiyên aborî di navbera van du welatan de–, hemû hêz û balkêşiya xwe dabû ser vekişandina leşkerên amerîkî ji Vietnamê û ser siyaseta tepeserkirina hemû bizavên çepgir li Amerîkaya Latîn. Ev hewl û çalakvanî, bi cûntaya ku li Şîliyê di rezbera 1973'yan de dest danî ser desthilatê, gihiştine asta xwe ya herî bilind. Li dû îstîfaya Nixon ya di sala 1974'an de, Kissinger rola xwe ya şêwirmendiya ji bo ewlekariya neteweyî ji dest da, lê di hikûmeta serokdewletê nû Gerald Ford de jî her weke wezîrê karên derve ma. Gava li vê postê bû, stratejiya aştbûna digel Yekîtiya Sovyetê da ber xwe ku stratejiya navhatî li ser du stûnan ava ye.

Stûna ewil xwe dispêre rêkeftinên li ser çekên stratejîk SALT 1 û 2 (Strategic Arms Limitation Talks). SALT 1'ê, bi kêmkirina bicîhkirina sîstemên antî-mîsîl, hevsengiya terorê (Mutually Assured Destruction, MAD) teqez kir ku ev yek pêngaveke girîng e ji ber ku ji bo cara ewil di dîrokê de, Washington wekheviya staretjîk a di navbera du super-hêzan de nas dike. Dewletên Yekgirtî ku ji şerrê Vîetnamê û ji nakokiyên digel hevpeymanên ewropayî ji ber destjêkêşana wan a yek-layenî ji parîteya dolar/zêr lawaz ketibû, herweha pêşniyazeke duyem (û kevintir) a Sovyetê jî qebûl kir: birêkxistina konferansekê û avakirina Konferansa ewlekarî û hevkariya Ewropayê –KEHE.

Ev KEHE, ji derveyî naveroka xwe, herweha bû stûna duyem a stratejiya Kissinger. Lewre, encamnameya Helsinkiyê, tevî ku di dawiyê de biryarnameyek bû, bi îmzeya sîh û pênc dewletan, herweha "danûstandinek" bû di navbera van du layenan de li ser du pirsên pirr hesas. Dewletên rojavayî prensîba neguherbariya sînoran dipejirand ku ji mêj ve bû Moskowayê doz lê dikir û bi vî rengî dabeşbûna Almanyayê û destkeftên Sovyetê li Ewropaya navendî û rojhilatî tescîl dikirin. Beramberî van, Sovyetê qebûl dikir ku KEHE li ser piştrastkirina girîngiya parastina mafên mirovan û azadiyên bingehîn bê avakirin –ku bi vî rengî, destê wan kesên mîna xelatgirê Nobelê Andrei Sakharov bi hêz dikir ku bi salan bû di nav kampa wan de têkoşîna pêşxistina mafên mirovan dida.

Îro, REHE rêxistineke ewlekariya herêmî ye ku wek rêkeftina herêmî li gor beşê VIII yê Peymana Neteweyên Yekgirtî tê naskirin. Çalakiyên wê xwe dispêre boçûneke global a ewlekariyê, ji ber ku tedbîrên ku datîne ber xwe di nav sê "zembîl"an de rêkxistî ne: rehendê siyasî-leşkerî (karên polîsan, kontrolkirina belavbûna çekan û çekhilgirtinê, berbendkirina derhatina dubendiyan, birêvebirina kêşeyên li ser sînoran), rehendê aborî û jîngehî (têkoşîna li dijî qezenca bi qelpezanî, pêşxistina plansaziya çavkaniyên avê, piştgiriya bi projeyên jinavbirina gilêşên xeternak) û rehendê mirovane (mafên mirovan, mafên kêmîneyan, wekheviya cinsan, azadiya medyayê).

REHE ji cerga avabûna xwe gellek guherî. Li dawiya şerrê sar, di lûtkeya Parîsê de, sala 1990'an, dewletên endam ji bo Ewropayeke nû Peymana Parîsê pejirand ku di Peymanê de dewletên endam di warê ewlekariya parzemînî de rewşeke nû destnîşan dikir û dawiya berhelistiya di navbera du blokan de berceste dikir. Herweha derfet û alavên zêdetir, nemaze dezgehên daîmî (sekreterî, navenda hilbijartinan, navenda berbendkirina derhatina dubendiyan) û şiyanên karkirinê dixistin jêrxizmeta KEHE'yê, da ku bi rengekî xurt bikare bibe bersiv ji bo qeyranên muhtemel. Sala 1992'yan, mîsyonên meydanî yên ewil li Kosovoyê, li Sancakê, li Voyvodînê û herweha li Makedonyayê hatine birêvebirin. Sala 1994'an, veguhartina KEHE'yê ji bo REHE'yê berdewamî û siberoja wê teqez kir.

Salên 1990'an bi awayekî bûne heyama zêrîn a rêxistinê. REHE xwedanê roleke girîng e di dubendiyên li herêma Balkan. Ji ber nejidiliya Dewletên Yekgirtî bo mudaxelekirina leşkerî li herêmê, rola rêxistina navhatî pirr ji ya NATO'yê zêdetir e. Peymana Daytonê ya sala 1995'an ku dubendiya li Bosna-Hersekê bi dawî anî, berpirsyarî disipart NY, REHE û NATO'yê ku çavdêriyê li rîayetkirina li şertên peymanê bikin. Bar û berpirsiya REHE'yê li Bosnayê bicîhkirina tedbîrên "bawerî û ewlekariyê" bûn, û herweha avakirina peymaneke kontrola belavbûna çekan a li herêmê bû. Lê belê, hewl û çalakvaniya wê û navdariya wê kurtedemî bû.

Rûsya, heyama derketina ji şerrê sar, bi çavekî şikber û nihêran berê xwe dida livên ji bo civandina welatên kevne-sateleytên xwe yên li Ewropaya navendî û rojhilatî di nav refên Yekîtiya Ewropayê û NATO'yê de. Rûsyaya ku şermezar û serşor bû ji ber xirabûna rewşa xwe ya aborî û civakî, nedikarî li hember van pêşhatan tu tiştê bikiraya. Piştî dehsaleke peywendiyên serşorane, bi destpêka desthilata Vladimir Putin re, sala 1999'an, Rûsyayê berê xwe da gotareke nasyonalîst ji bo cih û payeya welatî, weke hêzeke herêmî û cîhanî, pişterast bike. Hetta gava peywendiyên wê yên digel YE û NATO'yê xirab dibûn jî; tevî ku rêxistina navhatî li ser bingeha hevbîriyê bi rê ve diçe, Rûsya hergav wek endamê REHE'yê ma. Lewma, ji sala 1990'î ve û di dewra hemû hikumetên xwe de, Moskowayê hewl daye ku REHE bibe rêxistina berpirsiyar ya ewlekariya Ewropayê.

Serê salên 1990'î, NATO, anku rêxistina parastina hevbeş ku Dewletên Yekgirtî û hevpeymanên wê di şertên şerrê sar de ava kiribû, sebebeke din a hebûnê bi dest xist. Wê ew sebeb li herêma Balkanan, bi rêya çalakiyên dabînkirina aştiyê û piştî çend salên gîrokirinê peyda kir. Heçî YE ye, di destê wê de tu îmkan û dezgehên "ewlehiyê" nebûn. Dewletên Ewropayê axirî di sala 1992'yan de, digel peymana Maastrichtê, siyaseteke hevbeş a derekî û ewlekariyê (SHDE) ji bo hêsankirina birêkxistina dîplomasiya dewletên endam pejirand. Taybetmendiya nediyar vê rêkeftinê, bi dirêjiya salên 1990'î di qeyranên Balkanan de aşkere bû. Jacques Chirac û Anthony Blair, sala 1998'an, bi danezana Saint-Maloyê ku paşê di hezîrana 1999'an de bû mijara Konseya Ewropayê ya Kolnê, destpêka siyaseta ewropayî ya ewlekarî û parastinê (SEEP) radigihand ku paşê, digel peymana Lîzbonê ya sala 2008'an, weke siyaseta hevbeş a ewlekarî û parastinê (SHEP) hate guhartin. Ev siyaset bere bere dewletên ewropayî, ji bo telafîkirina kêmasî û bêçaretiya xwe ya li Bosnayê û paşê li Kosovoyê, li projeyên birêvebirina mîsyonên serbixwe yên dabînkirina aştiyê germ dike. Lewre ev bêçaretî bû sebeb ku bang li Dewletên Yekgirtî û dezgehên NATO'yê bê kirin da ku li ser erdê herêmekê ku li dilê Ewropayê bû, şerr û lêkdanan rawestînin.

Bi vî awayî, serê salên 1990'î, REHE'yê zanî ka dê ji bo dasependina hebûna xwe çawa "valahî"ya siyasî-leşkerî bi kar bîne û di heman demê de Rûsyayê razî bike. Wisa diyar e ku rewşa heyî ji binî ve berevajî bûye, lê belê tevî vê yekê jî ewlekariya Ewropayê nabe alozî û girîfteke çalakiyên ku di navbera NATO, YE û REHE'yê de birêkxistî ne.

Halê heyî, REHE hejdeh mîsyonên meydanî li herêmên weke Balkanên Rojavayî, Ewropaya Rojhilatî (Ûkrayna, Moldovya), Asyaya Navîn yan jî Kafkasyaya Başûrî bi rê ve dibe. Karîgeriya wê ya di çavdêrîkirina pêvajoyên dengdanê û piştgiriya wê ya ji bo bihêzkirina dezgehên neteweyî, bêyî tu gumanekê tê zanîn û pejirandin. Lê belê, wisa diyar e ku rêxistin di nav qeyraneke kûr re derbas dibe. Serokên dewlet û hikumetan, ji sala 1999'an ve nema beşdarî civînên lûtkeyî dibin; bi vî rengî, vîzyoneke stratejîk a demkî ji bo rêxistinê pêk nayê. Serkeftina mezin a danezana Helsinkiyê –ku ji bo cara yekem, hêla ku mafên mirovan wek pirseke navneteweyî, ne yeke navxweyî bê pejirandin– yan jî serkeftina çalakiyên mîsyonên li herêma Balkan êdî tenê weke bîrhatinên dûr in, bi taybetî ji ber nakokî û neliheviyên di navbera welatên rojavayî û Rûsyayê de ku di tevahiya dewra serokatiya George W. Bush de û herweha ji ber bihêzbûna YE û NATO'yê weke aktorên îdarekirina qeyranê bêtir azirîn.

Dubendiya di navbera Rûsya û Gurcistanê ya havîna 2008'an de, û pêşniyaza serokdewletê Rûsyayê Dmitri Medvedev ya ji bo peymaneke nû ya li ser ewlekariya sertaserê Ewropayê, careke din pêdiviya hizreke nû li ser ewlekariya Ewropayê xiste rojevê. Heman faktoran kir ku li ser avakirina ewleyiya parzemînî jî hizirîn û pêdeçûn ji wêdeyî çarçoweya Yekîtî/Hevpeymaniyê hebin.

NATO li cem pirraniya raya giştî ya dunyayê û li cem hejmareke mezin a hikumetan weke dezgeheke di bin serdestiya Dewletên Yekgirtî de tê zanîn. Nemana baweriya bi vî welatî ji ber xeletiyên rêveberiya Bush –nemaze ji ber dagîrkirina Iraqê û pirsgirêkên ku halê heyî li Afganistanê roj bi roj zêdetir dibin û bi vî rengî rewşa vî welatî vedigerînine Vietnama salên 1960 û 1970'yan, lewre her ku diçe hêzên rojavayî di nav dubendiyekê de xerq dibin ku ne dikarin bi ser bikevin û ne jî dikarin dev jê berdin– dê li ser siberoja Hevpeymaniya Atlantîkê bandoreke pirr neyînî û xurt bike.

Konsepta nû ya stratejîk ku divê Hevpeymanî dawiya sala 2010'an li Lîzbonê bipejirîne, deqeke hevseng e û deqek weha ye ku li gor pêşniyazên raporta koma pisporan a bi serokatiya Madeleine Albrighta kevnewezîra karên derveyî ya Dewletên Yekgirtî hatiye amadekirin. Konsepta nû dest ji wê hewesa demdemî dikêşe ku NATO'yê bike cûreke "cendirmeya cîhanê" yan jî hevpeymaniya demokrasiyên cîhanî. Lê belê, îmaja vê rêxistinê bi rengekî ciddî derizî ye. Fikra hebûna wê li hin herêmên dunyayê, weke li Afrîkaya Bakûrî, Rojhilata Navîn yan jî li nav devera bin bandora Rûsyayê, qet mumkun xuya nake. Weke nimûne, dubendiyên li Lubnan û Gurcistanê nîşan dan ku navbeynkariya welatên ewropayî û hebûna wan a leşkerî tenya rêya qabilî qebûlkirinê ye.

Ji aliyê xwe ve YE, digel peymana Lîzbonê û ji ber neliheviyên di navbera dewletên endam de, hîn jî di warê parastin û ewlehî û herweha siyaseta derveyîn de nebûye xwediyê vîzyoneke hevbeş. Peywendiyên digel Rûsyayê yan jî digel Dewletên Yekgirtî, li Talinn, Paris yan jî Londonê, tevî nêzîkbûneke berbiçav a helwêstên di van mehên dawîn de, bi heman rengî nayên nirxandin. Herweha, herçend aşkere be ku ji ber qeyranê butçeyên di warê parastinê de dê careke din bên daxistin, wisa diyar e ku hikumet dîsa jî nagihine biryara hevbeşkirina derfer û dezgehên xwe û çavkaniyên darayî yên bi vî rengî bidestxistî di karên girîngtir de bi kar bînin.

Beramber van pirsên ku digihîjin ewlekariya tevahiya parzemînî, hin tedbîr ferz xuya dikin –bi taybetî li ser rol û çalakiya REHE'yê, ya NATO û YE'yê, di warê ewlehiyê de pêdivî bi hizreke taze heye.

Digel vê, wisa diyar e ku vîzyoneke nerihetker a kurtedemî dê di destnîşankirina stratejiyên rojavayî

de serdest be. Herçend dunya ji ber lawazketina berbiçav a Dewletên Yekgirtî dibe pirr-navendî jî, ewqas teqez nîne ku dunya dê ewletir be, hetta ewletirbûna dunyayê îhtimaleke dûr e. Sala 2009'an, REHE'yê ji bo hizirîna li ser awa û şiklê nû yê ewleyiya ewropayî ya piştî dubendiya rûs-gurcî pêvajoya Corfou da destpêkirin. Wisa diyar e ku tu şensê pêkhatina pêşniyaza Medvedev ya avakirina peymaneke panewropayî ya nû li ser ewlekariya parzemînî nîne, lewre serokdewletê rûs bi vê yekê dixwaze, ji bilî armancên din, berê berfirehbûna YE yan jî NATO'yê bigire da ku welatên li herêma bin bandora wê jî nekevine nav van rêxistinan; lê belê, herçend nebûbe rojeva gengêşiyan jî, li ser vê pirsê dewletên rojavayî qet amade nînin ku sînoran li ber xwe deynin. Di bingeha hewldana fikra Medvedev de wîzyona Ewropayeke du beş heye: li aliyekî, beşê ku NATO ewlekariya wê teqez dike; li aliyê din, herêmên ku dibe ku di nav tariya şêlûbêlê de xerq bibin. Bêguman ev xaleke girîng e.

Belkî rêya çareseriya herî baş di vegera ji bo mentiqeke fonksiyonalîst re derbas dibe ku ev mentiq raya hemû aktoran temsîl dike: NY, NATO, YE û REHE. Îro Qirgizistan her ku diçe zêdetir dişibe *"failed State"*ekê (dewleta şikestxwarî), di demekê de ku Hevpeymanî û Yekîtiyê tu hêz û hebûn nîne li ser erdê welatê navhatî û herweha tu meşrûiyeteke wan a mudaxelekirinê jî nîne. Ji bo berbendkirina alozbûna rewşa li herêmê, divê REHE di vê meseleyê de zêdetir xwe bide ber hewla wergirtina berpirsiyariyan. Piştî yanzdeh salan ji bo cara ewil, serê meha çileya pêşîn, civîneke lûtke ya vê rêxistinê dê li Astanayê, li Qazaxistanê bê sazkirin. Lê belê, ev civîn tenê hingê dikare serkeftî bi dawî bibe heke Dewletên Yekgirtî û dewletên ewropayî dest ji xemsariya xwe ya beramber REHE'yê bikşînin.

Bi awayekî giştîtir, serokên dewletan û serokên hikumetên Ewropayê divê biryarê bidin ka dezgehên weke REHE, YE û NATO, bi halên xwe yên heyî, xwedanê wê şiyanê ne ku ewlekariya hemû welatan teqez bikin; û, herweha, divê diyar bikin ka gelo xêr û tevkariya vê parzemînê dê çi be di ewlekariya qada ewropayî û cîhanî de.

* Berpirsê Lêkolînan li Institut des relations internationales et stratégiques [Enstîtûya Peywendiyên Navneteweyî û Stratejîk] (Paris).

Wergera ji fransî: Ergîn Opengîn

EWROPA

Rehendê mirovane

CAROLINE FLEURIOT *

Pirsa mafên mirovan ku heta hingê tabû bû, di peywendiyên Rojhilat-Rojava de, sala 1975'an, di Konferansa li ser ewlehî û hevkariya Ewropayê (KEHE) de kete rojevê. Danezana dawîn ya Helsînkiyê (Fînland) ya 1'ê tebaxa 1975'an, ev pêşhata diyarker pesend kir. Profesorê hiqûqê Emanuel Roucounas, yê zankoya Atînayê, bawer dike ku *"ji cerga ku daxuyaniya dawîn ya civîna Viyanayê* [sala 1989'an] *"rehendê mirovane" destnîşan û binecîh kiriye, mafên mirovan li hemû şax û pêngavên KEHE'yê belav dibin "*. Bi pêvajoya Helsînkiyê re, mafên mirovan weke hêmanên bingehîn yên têgihiştineke nû ya ewlekariya parzemînî hatine naskirin.

Qaîdeyên Rêxistina Ewlekarî Hevkariya Ewropayê (REHE) ku sala 1994'an bûye dewama KEHE'yê di qada mafên mirovan de, herçend selahiyeta wê ya mecbûrkirinê nebe jî, *"pirr girîng in, bi taybetî ji ber ku di rêkeftinên navneteweyî de (…) û di yasayên neteweyî de weke çavkanî yan jî norm tên bikaranîn "*. Bi vî rengî, bi rola alavekî radibe ku pêşketinên pêkhatî pê bên pîvandin û piştgirî li çalakiyên parêzvanên mafan bê kirin. REHE bala xwe dide ser çarçoweya siyasî û hiqûqî ya îstifadekirina ji azadiyan, lê belê bi awayên cuda ji awayên dewleta hiqûqê û demokrasiyê. Nêzîkiyeke weha rê dide ku hewl di nav çepera gotin û gotarê de asê nebin û rehendê mirovane ber bi tevgerê ve bê zivirandin.

KEHE û paşê REHE'yê derfet û dezgeh damezrandin, da ku xebatên Navenda Dezgehên Demokratîk û Mafên Mirovan (NDDMM) bêne bercestekirin. Bi vî awayî, danezana dawîn ya civîna Viyanayê, sala 1989'an, mekanîzmeyeke dîplomatîk danî ku, ji bilî kardarên din, rê dida danûstandineke agahiyan di demekê de ku parzemîna Ewropayê ji ber şerrê sar dabeş bûbû. Armanc jê ew bû ku baweriya pêwîst ji bo diyaloga li ser mijara hesas a azadiyan bê dabînkirin û binecîhkirin. Bi dû re, sala 1991'ê, "mekanîzmaya Moskowayê" derçû. Mekanîzmaya navhatî bi taybetî pêşniyaz dike ku bi rizamendiya dewletên peywendîdar, ji bo meydanên nakokbar lijneyên pisporan bên şandin. Herweha balê dikişîne ser pêwîstiya birêkirina şandeyên din ji bo nivîsandina raportan. Lê belê, ji bo nivîsandina raportan pêdivî nîne ku dewleta peywendîdar destûrê bide. Yek ji çalakiyên wê yên destpêkê sala 1992'yan bi rê ve çû: wezîfe lê hatibû spartin ku *"vekolînan bike li ser wehşeta ku li Xirwatistan û Bosnayê li xelkê sivîl dihate kirin, herweha pê de bikeve ka îddiayên li ser destgîrkirinên keyfî yên Sirban li Xirwatistanê rast in yan na "*.

Pêşiyê, wezîfeya NDDMM'a ku sala 1992'yan hatiye damezrandin, birêkxistina wan kar û erkan bû ku li pispor û raportoran dihatin spartin. Selahiyetên wê paşê hatin berfirehtirkirin: nuha rêxistineke berbendkirin, çavdêrî û alîkariyê ye. Bi ya Mouloud Boumghar ku li Tirkmenistanê di lêkolîna derheqê mafên mirovan de wekîlê raportorê REHE'yê bû, *"bi fikra ku li wan welatên ku wergirtina îtirafan ji tometbaran weke rastiyeke hiqûqî tê qebûlkirin, her di merhaleya lêpirsînê de îşkence tê kirin, NDDMM'ê xema bernameya çalakiyên xwe da ser nûkirina şertên nezaretê û mehkemekirinê"*. Bi dirêjiya demê ve, şaxên taybet ji vê dezgehê derhatin ji bo pêdeçûnên li ser rewşa Roman û Sintiyan, li ser xweşbînî û rakirina cudakariyê, parastina parêzvanên mafên mirovan, mafên jinan.

Divê herweha navên Komîseriya Bilind ji bo kêmîneyên neteweyî (KBKN) û nûnertiya ji bo azadiya organên medyayê jî hildin ku bi rêzê sala 1992 û 1997'an hatine avakirin. Rola KBKN'yê ku halê heyî rêvebirê wê Knut Vollebeckê norwecî ye, berbendkirin û rawestandina dubendiyên qewmî ye. Rêbazên wî yên cihêreng hene: berhevkirina zanyariyan, seredana herêmeke li nav erdê dewletekê (lê belê rizamendiya dewletê şert e)… KBKN herweha ji bo binecîhkirina normên hiqûqî ya li ser azadiyên giştî çalak e. Sala 2004'an, di vexwendina Parlamentoya REHE'yê de, wî, bi raporta ku li ser polîtîkayên entegrasyona kêmîneyan amade kiribû, çepera çalakiyên xwe gihande *"demokrasiyên piştrast"*. Herçî nûnerê azadiya organên medyayê ye ku îro Dunja Mijatovicê Bosnayî ye, armanca wî, di hewlên wan ên di lehê azadiya çapemenî û medyayê de, alîkariya dewletan e. Di raportekê de ku sala 2010'an derçû, nûnerê vê dezgehê (ku wê demê Miklós Haraszti bû) nerihetiya xwe derbirîbû ku patronê France Télévisionê ji aliyê serokkomarê Fransayê ve dihat tayînkirin, lewre bi ya wî ev kiryar *"asteng bû li ber serbixweyiya wê* [dezgeha televîzyonên dewletî] *û nakok bû digel şertên REHE'yê"*.

Karê ku divê bê qedandin bêhed giran e û şert û bendên pirsa bênavber nû dibin. Emmanouil Athanasiou'yê ji Federasyona Navneteweyî ya ji bo Mafên Mirovan (FNMM), bi taybetî ji wê yekê nerihet û gilîdar e ku nikarin *"bi rengekî xurt azadiyên giştî biparêzin gava yasayên têkoşîna li dijî terorîzmê tên dariştin"*. Herweha REE divê hewl bide ji bo pûçkirina şikberî û nebaweriya hindik ji dewletên endam, mîna Rûsyayê. Bi ya Boumghar, *"Moskowa wisa bawer dike ku di NDDMM'ê de destê Dewletên Yekgirtî dirêj e û dê bi vî rengî piyonên xwe bide pêş"* li dewletên kevnesovyet".

REHE ji bo bihêzkirin û bandora çalakiyên xwe, hevkariyê digel rêxistinên din ên navneteweyî û komeleyên pisporên parastina azadiyan dike. Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê donorê sereke ye lê belê Yekîtî û Konseya Ewropayê jî dîsa şirîkên çalak in. Digel vê yekê, nelihevhatinên li ser selahiyetan carinan rêxistinê tîne hember Konseya Ewropayê (ku çil û heft welat pê ve girêdayî ne). Lewre Konseya Ewropayê sala 1951'ê, Rêxistina Ewropa ya Mafên Mirovan (REMM) saz kiriye ku li gorî rêxistina navhatî ji bo teqezkirina sepandina şertên rêxistinê dadgehek hatiye damezrandin.

* Rojnamevan

Wergera ji fransî: Ergîn Opengîn

SERHAD BAPÎR: **Keçik** (1989), Grafîka li ser lînoleum ku hatiye birengkirin.

EWROPA

Li ser "ewlehiya bi hevkariyê"

ALAIN DE NEVE *

Rêxistina Ewlekarî û Hevkariya Ewropayê (REHE), digel ku heta nuha nozdeh komên xebatê yên siyasî û leşkerî li seranserê Ewrasyayê geriyane, hîn jî dezgehek weha ye ku pir kêm tê naskirin. Ev nakokî vedigere ser çend sebeban.

Serê pêşîn, butçeya wê pir mutewazî ye, li gorî bi butçeya NATO‘yê (Rêxistina Peymana Atlantîka Bakûr) û Yekîtiya Ewropayê (YE). Sala 2008’an, di dest de bi tenê 164.168.200 euro hebûn ku ji çaran sêyê vê meblaxê ji bo mîsyonên meydanî hatibû terxankirin: asteke pirr bilind ji bo rêxistineke bi wî lewnî. Aliyê duyemîn ew e ku REHE ji pêvajoya Helsinkiyê derhat, anku heyama nermbûn û birêketina peywendiyên baş di navbera Rojhilat û Rojavayê de; lewma tê heye ku halê heyî weke bêarmanc û bêkêr bê pêş çavan. Dawî, nebûna selahiyeta wê ya dasepandina tedbîrên ku ji bo dewletên peywendîdar digire, dike ku medya çalakiyên wê zêde nede pêş.

Lê belê vê Rêxistina Ewlehiyê ya Panewropayî –ku selahiyetên wê li ser erdên ji Vancouverê heta Vladivostokê ne- karî behreya xwe nîşan bide ka ji bo aştkirina dubendiyan heta çi dereceyê dikare dîplomasiyeke bêdeng û bandorker bi rê ve bibe. Lewre belavbûna bloka Sovyetê di serê salên 1990’î de bû sedema derhatina hejmareke qeyranan ku hin ji wan pirsan hê jî bi rengekî serûber nehatine çareserkirin. Halê çaresernebûna wan pirsan pêwîstiya bi dexaleta REHE‘yê dide pêş. Ji bo mudaxelekirina li dubendiyên qewmî, cemaetî yan jî dînî/mezhebî, rêxistinê bi taybetî hewl û çalakiyên kontrolkirina çekan û çekhilgirtinê yên destnîşankirina sînoran û projeyên nûjenkirina hêzên ewlekariyê (polîs) dane ber xwe û herweha çalakiyên ku dikevin nav çarçoweya "rehendê mirovan" bi rê ve birine: pêşxistina mafên bingehîn û perwerdeyê, çavdêriya hilbijartinan, bihêzkirina dezgehên herêmî, parastina penaberan, û hwd., ji wan çalakiyên rehendê mirovan in.

Di vê bareyê de, ew hewl û kiryarên serkevtî yên Max van der Stoel, Komîserê Bilind ji bo Kêmîneyên Neteweyî (KBKN) ji REHE‘yê, hêjayî bîbîranînê ne ku di dubendiya di navbera kêmîneyên rûsîziman û desthilatên siyasî yên welatên baltik ên nû gihiştine serxwebûna xwe, encam dan. Herweha çalakiyên Navenda Dezgehên Demokratîk û Mafên Mirovan (DDDMM) jî li aliyê xwe ve diyarker bûn. Di nav zêdetir ji panzdeh salan de, DDDMM‘yê hejmareke zêde ya çalakiyên çavdêrîkirin, nûkirin û hişyarkirinê bi rê ve birin, ji wan, weke nimûne çavdêrîkirina hilbijartinên ku di nav şertên aloz de pêk dihatin, alîkariya bi qurbaniyên bazara mirovan, reforma yasayan, mafên koçberan yan jî çalakiyên fêrkarî û perwerdeya di warê mafên mirovan de *(gotara Caroline Fleuriot bixwîne)*.

Li aliyê din, çalakiyên rêxistinê yên di warê siyasî û leşkerî de bêtir encamên nakok nîşan didin. Lê belê REHE‘yê hemû karîgerî û bikêriya xwe ya di çarçoweya jeopolîtîk a heyî de îspat kiriye. Mixabin, ew biryarên siyasî ku çiriya paşîna 1999’an, di civîna bilind a Stenbolê de ji bo guhartina peymana li ser Hêzên Hevpeyman yên li Ewropayê (HHE) hatibûn girtin, ji ber cudatiyên di navbera şîroveyên dewletên endam de negihîştine armanca xwe *(gotara Fabio Liberti bixwîne, r. 6)*. REHE bi zêdebûna bêhed a wan şax û organ û platforman re nagihîne, lewma desthilatdarî û derfetên mudaxelekirinê, di gellek mijaran de, nîvco heta bi kêmasî dimînin. Weke din, dezgehên ku ji bo pêdaçûna Rehendên cihê yên Ewlekariya Panewropayî di bunyeya REHE‘yê de muweqet dihatin damezrandin, ji ber nebûna xeteke rênîşander tûşî pirsgirêkan bûne.

Vê yekê karîgeriya wan dezgehan daxist ku avakirina wan bûbû cihê rizamendiya aliyên cihê. Bi vî rengî, gava fikrê birêvebirina civînên hefteyî li ser ewlekariya leşkerî di sala 1992’yan de hat pesendkirin, dewletên endam tercîha xwe bi avakirina Forûmeke muweqet (Forûma ji bo hevkariya di warê ewleyiyê de, FHE) dan, ji dêleva ku bar û berpirsiya wê veguhêzine ber Navenda Berbendkirina Dubendiyan (NBD) ku du sal pêştir di 1990’î de hatibû avakirin. Li aliyê din, peywendiyên digel NATO‘yê carinan binecîhbûna şax û organên REHE‘yê bi paş dixe. Ji bo nimûne, di rewşa NBD’yê de, selahiyetên wê bi awayekî aşkere hatine bisînorkirin, da ku digel platformeke reqîb a NATO‘yê nekeve reqabetê.

Di warê têgehî û teorîk de, dewlemendî û reseniya nirxandin û pêdaçûnên di çarçoweya xebatên REHE‘yê de tên kirin aşkere ne, lê belê, tetbîqkirina wan gellek caran tê berbendkirin yan jî bipaşxistin ji ber îradeya parastina statukoyên herêmî ku carinan li hember guherînên zelaltir tên tercîhkirin. Bi vî rengî, munaqeşeyên li ser dariştina "modeleke ewlekariyê ya hevbeş û global" ji bo sedsala XXI‘ê, herçend hêvîdar jî be, li dû xwe şantiyeyeke nîvco hiştiye. Herçî Platforma ewlekariya bi hevkarî (PEH) ye ku di vê civîna lûtke de hate pejirandin û armanc dikir ku hevkariya di navbera REHE û rêxistinên ewlehiyê yên ewropayî û transatlantîk de pêş bixe, ew jî di dawiyê de weke têkçûyin û şikestekê hat nirxandin.

Guherînên dîmenê ewlekariya panewropayî di heman demê de hem sînor û kêmasiyên REHE‘yê û hem jî pêdiviya reha ya bi rêbaz û derfetên ku wê rêxistinê bi pêş xistine, nîşan da. REHE bi rêya destnîşankirina nêzîktêdayina xwe ve li dora prensîbên derbarê "ewlehiya hevkariyê", awayekî birêveçûnê yê pragmatîk û pêşeng da ber xwe. Di vê rêbazê de dewlet weke xwe hatine entegrekirin, ne ku li gor şertên îdeal. Digel vê yekê dîsa diqewime ku REHE li mentiqa peywendiyên di navbera desthelatan de bialiqe. Dubendiya Nagorno-Karabaxê ji bo vê diyardeyê nimûneyeke aşkere ye. Lewre Grûba Minsk ku di 1992’yan de bi armanca komkirina konferansekê li ser vê meseleyê hat avakirin –ku konferansa navhatî heta îro jî nehatiye birêkxistin– ji ber dijberiya bîr û baweriyên dewletên endam (bi taybetî Dewletên Yekgirtî, Rûsya û Fransa, hevserokên grûbê) nikare biryarên xwe bisepîne.

Xwezaya REHE‘yê ku di cewhera xwe de siyasî ye, ji bo maweyeke dirêj hêsankarî kir ku rêxistin bikare diyalogê di navbera dewletên endam de deyne. Lê belê ev mekanîzmayên danûstandinê carinan têr nakin ji ber ku hêz û bandora wan a dasepandina şertan nîne ku bikarin, bi vî rengî, rêzgirtina li biryar û rêkeftinan teqez bikin. REHE, zêdetir ji her çi dezgeheke din a ewlekariya herêmî, beriya her tiştî berhemê vîna hevkariya dewletên endam e. Ji ber vê yekê, bê şik, xwediyê wê liyaqetê ye ku bibe barometreyeke ewlekariya Panewropayî û Ewrasyayî. Bi dû re, heke dewletên endam nexwazin di vê lîstikê de cî bigirin, ew ê çi biqewime ? Lewma di yanzdeh salan de, REHE‘yê tu civînên lûtkeyê saz nekirine ku serokên dewlet û hikumetan jî tê de amade bin. Ji ber vê yekê ye ku hevdîtina Astanayê ku qewl e bi meha çileya pêşîn bi rê ve biçe, dê bibe cerribandina rastiya wê baweriya ku dewletên endam û vîna wan a xebata bi hev re didin hev.

* Endamê lêkolîner li *Institut royal supérieur de défense*, xwendekarê doktorayê di warê zanistiya siyasetê de (Université catholique de Louvain û Ecole royale militaire).

Wergera ji fransî: Ergîn Opengîn



ÛKRAYNA

Encamên Çernobîlê yên tenduristiyê

ALISON KATZ

Di pêncemîn salvegera dezinformasyona di derbarê veşartina encamên tenduristiyê û ên hawîrdorê de ku bi bûyera Çernobîlê derketine holê, birêveberên hêzên mezin tev li heman kiryarê dibin ku pîşesaziya nukleer, sivîl û herweha ya leşkerî jê feydeyê dibînin. Ev stratejî ji aliyê Ajansa Navneteweyî ya Atomîk (AIEA) ve tê birêveberin ku xwedê giravî ev ajans di derbarê qirêjiya radyoaktîv de weke berdevkê saziyên nukleer e. Mixabin, piştî peymana ku di 1959’an de di navbera van du rêxistinan de hatiye îmzekirin, rêxistina cîhanê ya tenduristiyê (OMS) jî hevkarê wê ye. Ev dokuman destûrê nade OMS’ê ku ew, di derbarê xeteriya lidijî mirovan de girseyan agahdar bike.

Di çileya paşîna 2010’an de, Akademiya Zanistê ya New Yorkê, encamên zanistî yên herî bibawer, di derbarê bûyera Çernobîlê de weşandin. Di vê daxuyaniyê de, encamên gellek lêgerînan hene ku li welatên ku ji heman bûyerê ziyan dîtine pêk hatine, weke Rûsyaya Spî, Rûsya û Ûkraynayê.

Lêkolîner bawer dikin ku bandora radyoaktîvên reaktoran gihîştiye 10 milyar kûrî, ev jî tê wateya ku ew du sed caran ji ya bombeyên atomê, ya ku li ser bajarên Hiroşîma û Nagazakiyê hatine teqandin zêdetir e. Tenê di navbera 1986’an û 2004’an de hejmara kuştiyên wê bûyerê gehiştiye 985 000’î ku ev hejmar dikare hê jî zêdetir bibe. Di nava 830 000 kesên ku ji herêma bûyerê hatine bidûrxistin de, ji 112 000’î heya 125 000 kesan jiyana xwe ji dest daye.

Li ser laşê piraniya van jin û mêran ku bi xurtî nehatine parastin, gellek qirêjiya ûranyûmê hatiye dîtin û laşê wan ziyan dîtiye. Di sala 2005’an de, OMS û AIEA’yê raporek ji raya giştî re aşkere kir. Di heman raporê de hatiye destnîşankirin ku, di heman salê de, di nava kesên ku ji cihên bûyerê hatine bidûrxistin de, 50 kesan jiyana xwe wenda kiriye, derdora 9000 kes jî bi xeteriya mirinê re rûbirû ne – ev hejmar bi tenê ya şêniyên ji Rûsyaya Spî, Federasyona Rûsyayê û Ûkraynayê ye…

Bi hezaran lêkolînên ku di derbarê xeteriyên heman bûyerê de agahiyan didin hatine weşandin. Di van xebatan de tê destnîşankirin ku hejmara welatên ku ji heman bûyerê ziyan dîtine zêdetirî hejmara tespîtkirî ye. Di van welatan de xeteriya zêdebûna nexweşiyên weke qansêr, dil, gastrointestînal, genitouriner, endokrîn, immûn kardiyovaskûler, sîstema lenfatîk, mortalîte, prenatal, perinatal û mirina zarokan, spontan abortus, nexweşiya jinên ducanî, nexweşiyên mejî, nûropsîkolojîk û korbûnê hene.

Heger encamên tendurustiyê û ên hawîrdorê destûr dabûya, fatoreya encama vê bûyerê dê teknokratên mermerê matmayî kiribûna. Bi tenê di 5 salên destpêkê de, fatoreya aborî ya xercên ku di sê welatên mijara gotinê de hatine kirin, digihîje 500 milyar dolaran. Ev hejmar li gorî xercên ku di Yekîtiya Ewropayê de ji bo tenduristiya mirovan tê kirin digihîje du hezar milyar euroyan. Ev jî bi qasî xercên çêkirina hemû dezgehên nukleera cîhanê ye.

Wergera ji fransî: Ahmet Dere

SERHAD BAPÎR: **Bê nav 17**, (2005)
Don 21 x 15.5 cm

EWROPA

Rewşa awarteya daîmî

SLAVOV ZIZEK *

SERHAD BAPÎR: **Bê nav 8** (2005)
Don, 21 x 15,5 cm

Li dijî siyaseta hişk a aborî, îsal li Ewropayê – li Yûnanistan û Fransayê, lê belê di asteke jêrtir de li Îrlanda, Îtalya û Îspanyayê jî – tevgerên protestoyî xwe dan der û du fîksiyon derxistin holê. Ya pêşî ji aliyê desthilatdariya siyasî û çapemeniyê ve tê bigewdekirin û xwe dispêre şuştina qeyranê ya ji siyasetê: tedbîrên hikumetan ên kêmkirina lêçûnên dewletê yên butçeyê weke ku ne tercîhên siyasî bin, lê belê bersiveke teknîkî bin ku didin xweferzkirinên malî. Dersa exlaqî ku mirov ji vê bigire ev e: heke em dixwazin ku aborî bi îstiqrar be, hingê divê em kemberê li xwe bişidînin. Çîroka din, ya grevîst û xwepêşandêran e, ew jixwerazî îddia dikin ku tedbîrên hişk ên aborî bi tenê alavek e di destê sermayeyê de, da ku dewleta civakî ji hev de bixe. Li aliyekî Fona Pereyan a Navneteweyî (IMF) weke hakemekî weha xuya dike ku dixwaze nîzam û disîplînê bide qebûlkirin, li aliyê din hê jî bi rola xwe ya alîkar a maliyeya globalbûyî radibe.

Herçend ev herdu perspektîf hin hêmanên rastiyê di nava xwe de bihewînin jî, herdu ji binî ve şaş in. Stratejiya parastinê ya birêveberên ewropî bêguman li ber çavan nagire ku lihevderneketina mezin a butçeyên dewletan para bêhtir encama bi dehan milyarên li xilaskirina banqeyan hatine xerckirin e û krêdiya ku ew ê bidin Atînayê beriya her tiştî dê bi kêrî dayîna deynên banqeyên fransî û alman were. Alîkariya ku Ewropa dide Yûnanistanê bi tenê bi kêrî xilaskirina sektora banqeyan a taybet tê. Li hemberî vê, argumenta neraziyan ji nû ve xiyanet bi hejariya çepgiriya hemdem re kir: di nava xwe de tu aliyê bernameyî venahewîne, bi tenê redkirineke prensîbî ya li dijî jidestdana destketiyên civakî ye. Utopyaya tevgera civakî êdî ji guhertina sîstemê pêk nayê, lê belê jê pêk tê ku mirov bawer bike ku ev utopya dê bi kêrî parastina dewleta civakî were. Ev rewşa parastinê jî dibe sedem ku lidijrabûneke weha derkeve holê ku zehmet e ku mirov pûç bike: heke em dixwazin di nava bizmarên sîstema kapîtalîst a globalbûyî de bimînin, hingê li ber me tu rêya din nîne ji bilî qebûlkirina kêmkirinên ji butçeyê ku li ser karker, xwendekar û teqawîtbûyiyan tê ferzkirin.

Tiştek misoger e: piştî dehsalên dewleta civakî ya xweşhaliyê ku di dema wê de qutkirinên mesrefên ji butçeyê sînordar bûn û timî soza ku dunya wê rojekê li rewşa xwe ya normal vegere pê re dihat dayîn, nuha em dikevine rewşeke awarte ya aborî ya daîmî. Serdemeke nû ku di nava xwe de van sozan vedihewîne: planên aboriyê yên hişk yên ku her ku diçe bêhtir dişidin; aboriyên ku di siyaseta tenduristiyê, teqawîtbûyiyan û perwerdeyê de her ku diçe behtir tund dibin û herweha neewlebûna karan ya ku zêde dibe. Divê çepgir bi zehmetiyan re rûbirûbûyî vê pirsgirêka gumanbar a ravekirinê derxin pêş: qeyrana aborî serêpêşî qeyraneke *siyasî* ye – tu aliyên wê yên "xwezayî" tunnene, sîstema heyî encama rêzebiryarên weha ye ku bi tevahî siyasî ne –, di heman demê de divê hayê wan jê hebe ku heta mirov di navê de ye, ev sîstem li gorî mentiqekî qaşo-xwezayî tev digere ku dema ku mirov qaîdeyên wê bi cîh nayne, karesateke aborî provoke dike. Heke em hêvî bikin ku ev qeyrana ku hê dewam dike, bi tenê encamên wê yên sînordar dê hebin û kapîtalîzma ergonomîk dê dewam bike ku asteke jiyanê ya baş ji pirraniya serjimara xwe re misoger bike, ev ê xeyalek be. Û awireke ecêb ê li tundrewiyê ku ji bo kêmkirina zirarên qeyranê, xwe bi tenê dispêre başbûna şert û mercan ya ji xwe ber... Bêguman yên ku jê mane ne bi tenê antîkapîtalîst in. Bi rastî jî gazinên ku ji xeddariya kapîtalîzmê dan ser me: lêkolînên rojnamevanî, hevpeyvînên di televizyonan de û pirtûkên best-seller (yên herî zêde nusxeyên wan tên firotin) yên li ser karsazên xwezayê talan dikin, banqevanên bertilxwur ên ku li ser rûnê bonusên gellekî mezin rûdinên û di heman demê de walîzên wan pereyên gelemperiyê dikişînin nava xwe, şîrketên ku ji fîrmayên konfeksiyonê re cil û bergan didin dirûtin ên ku zarokan rojê duwanzdeh saetan dixebitînin, roj bi roj li serûçavê me dixin. Dîsa jî, herçend ev rexne tûj xuya dikin, ew li cîhê biryardayînê kuh dibin: ew tu caran ji çarçoveya lîberal-demokratîk hesab napirsin ku tê de kapîtalîzm karûbarên xwe yên hilweşîner bi rê ve dibe. Armanca aşkere û sergirtî timî ji birêkûpêkkirina kapîtalîzmê pêk tê – di bin zexta çapemenî, parlemanter an jî lêpirsînên polîsan ên ji dil –, û cîhê gumanbirina ji mekanîzmayên dezgehî ên dewleta hiqûqê ya bûrjuwa qet di nava vê de nîne.

Analîza marksîst ji her demê bêhtir îroj tezebûna xwe diparêze. Ji bo Marx, pirsa azadiyê di serêpêşî de ne di nava qada siyasî de ye ku qet nebe, dema saziyên navneteweyî behsa dewletekê dikin, wan li ber çavan digirin: gelo hilbijartin azad in, dadger serbixwe ne, rêz ji mafên mirovan re tê girtin? Kilîta azadiyeke bi rastî bêhtir, ji kar heta bi malbatê, di nava tevna "apolîtîk" a têkiliyên civakî de ye ku ne reformên siyasî, lê belê veguherîneke têkiliyên civakî di nava dezgeha hilberînê de wê guhertinên pêwîst pêk bîne. Tu caran ji hilbijêran nayê pirsîn ku organîze bike ka divê kî xwediyê çi be, yan jî li ser pîvanên qaîdeyên di meriyetê de yên li cîhê wan ên kar fikrê xwe bêjin. Tu maneya wê tunne mirov hêviyê ji qada siyasî bike ku demokrasiyê li van qadên ku dûrî demokrasiyê hatine xistin jî belav bike, weke mînak banqeyên "demokratîk" yên di kontrola welatiyan de organîze bike. Di vê qadê de, guhertinên ji binî ve, ji qada mafên qanûnî û bi wê de ne.

Hemin, dibe ku pêvajoyên demokratîk bi destketiyên civakî ve bi encam bibin. Dîsa jî ew çerxeke saziya dewleta bûrjuwa ne ku rola wê misogerkirina hilberîna herî zêde ya sermayeyê ye. Ango du fetîş divê bi hev re werin hilweşandin: li aliyekî ya "dezgehên demokratîk" û li aliyê din jî fetîşa neyînîya li hemberê wan ku şiddet e.

Li navenda fikra marksîst ya şerrê çînan de fikra xurt ew e ku jiyana civakî ya "aştiyane" nîşana serkevtina (demkî ya) çîna serdest e. Heke mirov bi awira bindestan li mijarê binihere, hebûna dewletê weke amûreke di destê çîna serdest de, bi serê xwe kirineke şîddetê ye. Gotina îmanpêanînê ya lîberal – şîddet tu carî rewa nîne, lê carinan pêwîst e – têra xwe kêm dimîne. Di perspektîfeke radîkal û azadîxwaz de şertên prensîbên bivênevê divê serûbinî hev bibin: şîddeta bindestan timî rewa ye – lewre statuya wan bi xwe jî encama şîddetekê ye – lê belê tu carî pêwîst tunne: tercîha bikaranîna şîddetê li dijî dijmin bi awayekî hişk encama hesabekî stratejîk e.

Di rewşa awarte ya aboriyê ya bi me nas de, bi qasî ku di çavên mirov de biçe diyar e ku ya ku em pê re rûbirû ne, ne tevgerên malî yên kore ne lê belê destwerdanên stratejîk in ku desthilatdariyên dewletan û saziyên malî hesabê wan baş kiriye û dixwazin qeyranê li gorî pîvanên xwe û berjewendiyên xwe çareser bikin. Di rewşeke bi vî rengî de çawa mirov li bendê be ku êrîşeke ji hember pêk neyê?

Bi hizr û fikrên bi vî rengî re rûbirû, bi tenê dibe ku rehetiya entellektuelên radîkal xira bibe. Bi jiyaneke nerm û parastî, ma ne ew hewl didin ku senaryoyên felaketê binivîsin, da ku parastina asta xwe ya jiyanê rewa bikin? Ji bo gellekan ji wan, heke şoreşek wê pêk were, ew ê gellekî dûrî mala wan be – li Kuba, li Nîkaragua, li Venezûellayê –, da ku dilê xwe pê rehet bikin û di heman demê de bi baldarî bipêşdeçûna kariyerên xwe bişopînin. Tevî ku bi jihevdeketina dewleta civakî re li ekonomiyên pîşesaziyên bipêşketî, entellektuelên radîkal dikarî kêliya xwe ya rastiyê bibînin: wan doza guhertineke bi rastî dikir, nuha ew dikarin bibin xwediyê doza xwe.

Tu tişt rewa nake ku rewşa awarte ya aborî ya misêwa bike ku çepgir dev ji karê întellektuel ê sebrê berde, yê ku tavilê "di pratîkê de bi kêr" nayê. Dîsa jî bi awayekî her diçe zêdetir erka bi rastî ya fikrî ji holê radibe. Ji bo pirsgirêkên "civak" bi wan re rûbirû dibe – ango dewlet û sermaye – ne ku çareserî werin pêşniyarkirin, lê belê li ser awayê ku ev pirs tên kirin, bi xwe divê were hizirîn. Ango ya divê were kirin lêpirsîna awayê ku em pirsgirêkeke heyî dibînin e.

Di serdema dawî ya kapîtalîzmê ya piştî 1968'an de aborî bi xwe – mantiqê bazarê û hevrikiyê – xwe weke îdeolojiya serdest ferz kir. Weke mînak di qada perwerdeyê de, dibistana ku dewlet pê re bi dilrehmî têkildar dibe û ziyareta nirxên bi feyz e – azadî, wekhevî û biratî –, her ku diçe hindiktir nûneriya xizmeteke dewletê dike ku ji bazarê serbixwe ye. Ji ber hêza formula lîturjîk (têkildarî merasîmên dînî) "bi kêmkirina lêçûnan ya herî bikêrhatî", wê hişt ku bi awayên cihêreng ên hevkariyên dewletê bi sektora taybet re qada perwerdeyê were dagirkirin. Di qada siyasî de, sîstema hilbijartinan ku desthilatdariya siyasî bi rêxistin dike û rewa dike, weha xuya dike ku her ku diçe bêhtir li gorî şêwaza teşebbusa serbest reng digire: dengdan weke bikiriyeke bazirganiyê ku di pêvajoya wan de hilbijêr metayên ku weke ku wê nîzama civakî baştir biparêzin û gunehkaran ceza bikin û hwd. xuya dikin, "dikirin".

Li gorî heman prensîbê, erkên ku ji berê ve ji hêza dewletê re veqetandî, weke qada girtîgehan, ji nuha û pê ve dikarin werin taybetkirin. Artêş êdî xwe hew dispêre leşkeriya mecbûrî, lê belê xwe dispêre leşkeriya bi pere. Heta bi burokrasiya dewletê jî xisleta xwe ya gerdûnî ya hegelî (li gorî fîlozofiya Hegel) ji dest da, weke ku pergala Berlusconî têra xwe nîşan dide. Li Îtalyaya roja me, bingeha bûrjuwa bi xwe hêza qanûnî yekser bi rê ve dibe û bi tenê ji bo ku berjewendiyên xwe biparêze vê hêzê bi awayekî aşkere û bêtirs talan dike. Ew ketiye heta bi nava têkiliyên jin û mêran ku xwe naspêrin qanûnên bazarê: "speed dating", hevnaskirina bi rêya înternetê yan jî ajansên zewacê, xizmetên ku pêşkêşî jin û mêrên siberojê tên kirin, dikin ku ew xwe weke bazirganan bibînin, û ev yek jî li ser wan ferz dike ku pesnê kalîteyan bidin û wêneyên herî baş hilbijêrin.

Li ser sînorê li hev rasthatina şert û mercên bi vî rengî, fikra veguherîneke civakî ya ji binî ve bi xwe jî weke xewneke nemumkin xuya dike. Lê belê, ji xwe ya ku divê bike em bisekinin û li ser bihizirin jî ev "nemumkin" bi xwe ye. Îroj dabeşkirina ya mumkin û ya nemumkin bi rengekî sosret pêk tê, bi heman pirroliya di pênasîna her kategoriyê de. Li aliyekî di qada heng, şahînî û teknolojiyê de em bi dengekî bilind didin zanîn ku "tu tiştê nemumkin tunne": bi dezgeheke fireh a xizmetên cinsî, bi arşîvên ansîklopedîk ên stranan em dikarin tamijî bibin, film û rêzefîlmên televizyonan bi rêya daxistina ji tora înternetê li ber destê me ne, heta (heke em milyardar bin hingê) em dikarin li fezayê jî bigerin. Û soz ji me re tê dayîn ku di siberojeke nêzîk de em ê "mumkin" be ku jêhatîbûna me ya fizîkî û ya derûnî bi rêya pêlîstina genên mirovan bigihîje asta xwe ya herî baş. Heta xeyala nemiriyê ya teknognostîk (1) jî êdî weha xuya ye bi hêsanî pêk tê, bi rêya veguherîna "software" ya nasnameyên me ku mirov dikare daxîne ser hard dîskekê. Di qada civakî-aborî de, berovajiya qada heng û teknolojiyê, xisleta serdema me baweriya bi mirovatiyeke weha ye ku bi awayekî kamil gihîştî ye û jê hat dev ji utopyayên kevn ên hezar salan berde û ferzkirinên rastiyê (hemin rastiya kapîtalîst) tevî nemumkinan hemûyan ku pê çekdar e, qebûl bike. Peyva wê ya nîzamê, fermana wê ya pêşî "hûn nikarin" e: hûn nikarin bikevin nav kirinên mezin ên kollektîf ku bivênevê encama wan wê bibe terora totalîter; hûn nikarin bi dûvê dewleta civakî bigirin, heke hûn dev jê bernedin hûn ê kapasîteya xwe ya hevrikiyê ji dest bidin û bibin sedema qeyraneke aborî; heke hûn bîat bi Koreya bakur nekin, hûn nikarin xwe ji bazara global qut bikin. Ekolojî bi rengê xwe yê îdeolojîk jî li van qedexeyan qedexeyên xwe zêde dike, nirxên bingehîn ên navdar – nabe ku avûhewa ji du pîleyan bêhtir germ bibe – ku xwe dispêrin fikrên pisporan.

Îdeolojiya serdest îroj hewl dide ku baweriya me pê bîne ku guhertineke ji binî ve ne mumkin e, rûxandina kapîtalîzmê ne mumkin e, avakirina demokrasiyeke ku ne bi tenê parlemanterîzmeke bertîlxwur e û di heman demê de jî bike ku dubendiya di civakên me de xuya neke. Ji ber vê yekê, ji bo ku ji van bendên îdeolojîk bibihure, Lacan li şûna peyva "her tişt mumkin e" tesbîta objektîftir "ya ne mumkin diqewime" bi cîh kir.

Li Bolîvyayê Evo Morales, li Venezuellayê Hugo Chavez yan jî li Nepalê hikumeta maoîst bi hilbijartinên demokratîk ên "adil" bûn desthilatdar û ne bi serhildanê. Rewşa wan li gorî ya me bi awayekî "objektîf" hindiktir bêhêvî nebû: ew li dijî herka dîrokê dimeşin û ji bo vê jî nikarin xwe bispêrin tu "meyila objektîf" jî. Ya ku di rewşeke aşkere ya bêzariyê de dikarin bikin ew e ku ji xwe re li hev bînin. Lê belê, gelo ev yek azadiyeke îstîsnayî jî nade wan? Û gelo em çepgir hemû ne di nava heman zehmetiyê de ne?

Rewşa me ya nuha bi tevahî berovajiyê wê rewşê ye ku bi giranî di destpêka dehsala 20'an de hebû. Hingê çepgiran dizanî bê divê çi bikin, lê belê diviyabû bi sebr û semax li benda kêliya kirinê bin. Îroj, em nizanin ka divê em çi bikin, lê belê divê em tavilê bikevin nava liv û tevgerê, lewre betalî û tiraliya me dikare di demeke nêz de rêyê li ber encamên dilşewat veke. Ji her demê bêhtir li ser me ferz e ku "weke ku em azad in" bijîn.

* Fîlozof. Nivîskarê pirtûka *Living in the End Times (jiyana di axirzemanê de)*, Verso, London 2010.

1 Jêrenota wergêr: teknognostîk peyvek e ku ji bo gnostîzmeke (zanîna mirov bi rêya hîs û hizirînê digihêjiyê) sekuler a di nav teknolojiyêde hatiye kirin, tê bikaranîn

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

Amerîka

Rasta amerîkî û serkevtina wê

Walter Benn Michaels *

Dijminê Amerîkayê yê herî xeternak çi ye gelo? Havîna bihurî vê pirsê di navbera du rûyên navdar ên rastgirên amerîkî de nîqaşeke tund derxist holê. Bill O'Reilly yê kanala Fox Newsê ku yek ji bernameyên herî zêde tê temaşekirin bi rê ve dibe, bersiva ku mirov li bendê ye dide: el-Qaîde. Di dema birêveberiya Bush de, şoka şaristaniyan reng dida awayê niherîna muhafizekarên amerîkî ya li dunyayê jî. Dema ku van muhafizekaran mijareke mîna koçberiya qaçax digirt dest, bi tirsa ku alîgirên Bin Ladîn bi dizî bikevin nava garajvanên otelên Chicagoyê yan jî karkirên ku goşt ambalaj dikin ên Iowayê, mijar digirtin dest. Lê belê, di kanala Fox Newsê de hempîşe û dijberê O'Reilly, Glenn Beck (1) bi xwe awirekî li mijarê ya kêmdîtî diparêze: yên ku "hewl didin ku welatê me hilweşînin" ne cîhadîst in, lê belê "komunîst" in. Naxwe, ji bo Beck û çalakvanên rastgir ên tevgera Tea Party'ê ku ew jî nêzî wan e, terorîzm li gorî sosyalîzmê xetereyeke weha ye ku hindiktir dibe sedema fikaran.

Lê belê teza xetereya sor di destpêkê de şerrê sar tîne bîra mirovan, ne salên piştî 11'ê îlonê. Mirov matmayî dimîne ku rojnamevanekî ji nifşê baby-boomê (2) vê tezê derdixe pêş. Beck sala 1963'an hê ji dayika xwe nebûbû. Wê salê sekreterê Eisenhower yê çandiniyê Ezra Taft Benson soza Xrûçev a xwedîkirina Amerîkayê bi sosyalîzmê şîrove dikir û digot ku rojekê (li gorî Beck ê ku vê axaftinê gellek caran bi bîr dixe, îroj) welat wê di bin nîrê desthilatdariya Kremlînê de hişyar bibe. Bloka Sovyetan ji hev de ket, lê hevalbendên Tea Party'ê her li pêy wê ne ku sîxurên komunîst ên ku bi dizî ketine nava Partiya Demokrat aşkere bikin. Li ser lîsteya pirtûkên best-seller ên Amazonê cerribandina siyasî ya ku herî zêde bala xwendevanan dikişîne pirtûka bi navê Rêya bendetiyê ya aborîzanê awûsturyayî yê ultra-muhafizekar Friedrich Hayek heye. Rewş gihiştiye wê astê ku pêşkêşvanekî radyoyê yê navdar Rush Limbaugh li dijî sîxurên "komunîst" ên ku "ji bo Vladîmîr Pûtîn dixebitin" (3) banga hişyarbûnê kir.

Ji bo çi komunîzm? Û ji bo çi nuha? Ne weke îslamofobiyê ye ku bahaneya wê ew e ku bi hezaran Amerîkiyên ku ji aliyê cîhadîstan ve hatine kuştin; dij-komunîzma îroj xwe naspêre tu hêmanên rastîn. Ne ku bi tenê, bolşewîstek bi tenê jî di balafirên ku ketin World Trade Centerê de nebû, lê belê bi ser de jî hema bêjin li ser tevahiya erdên Amerîkayê komunîstek jî nîne û heta li URSS'a berê jî bi tenê çend kes mane. Di rastiyê de di navbera Vladîmîr Pûtîn û Barack Obama de xaleke hevbeş heye, ev jî hewesa wan a hevpar e ku serokwezîrê rûs (li Davosê) navê "ruhê teşebbusa serbest" lê kiribû. Û dîsa jî weke antî-semîtîzma bêyî Cihûyan, antî-komunîzma bêyî komunîstan jî îroj di nava rastgiran de bi roleke diyarker radibe û bi taybetî jî di nava wan de ku mirov dikare navê rastgirên antî-neolîberal li wan bike.

Rêya Beck şopandî bi xwe, çawa û çimaya vê anakronîzmê qismî rave dike. Biografiyên wî îddîa dikin ku dê û bavên wî ji ber stresa ku xirabçûna aborî ya salên 1970'yî bû sedem, dev ji hev berdane. Piştî ku kete radyoyê, ji hevrikiya ji bo guhdaran sûd wergirt. Ev hevrikî di navbera kanalên radyoyê de bû û sedema wê jî rakirina kontrola hikumetê ya li ser bazarê ya sala 1982'an bû. Serkevtin û binketinên wî bi beşên bi ser hev de mezinbûna pîşesaziya bînerî û guhdarî re li hev dikin û her ku diçe bêhtir zexta bazarê li vê pîşesaziyê dibe. Beriya ku bikeve nav hewldanên xwe yên destpêkê yên siyasî, Beck xwe beriya her tiştî bi zîrekiya xwe ya marketîngê ve da naskirin (4). Fikrên muhafizekar ên ku ew îroj bi israr behsa wan dike, ji bo rexnegirên wî bê naverok û mane ne – weke ku ev fikr ne baweriyeke zexm lê ruhekî karî yê banal derdixin pêş.

Belê heke sîh salên derbasbûyî em fêrî tiştekî kirine, ew jî ew e ku marketing bi serê xwe siyasetek e. Beck tuxmekî xwerû yê neolîberalîzmê ye ku bi hilweşîna komunîzmê gihîşt, îroj bi xirabçûna mezin a aborî re rûbirû ye, di warê aboriyê de bi ruhpêanîna giyana jidestdayî bi pêş dikeve. Ji bo wî û ji bo bi milyonan sempatîzanan ya ku divê em gunehê pirsgirêkên xwe yên heyî bixin stûyê wê ne serkevtina kapîtalîzmê ye, lê belê vegera komunîzmê ye. Û yên ku vegera komunîzmê bileztir dikin bêguman "koçber û sosyalîst" in – ne welatiyên Erebîstana Suûdî yên di balafiran de, lê belê ew Meksîkî ne ku bi meşê tên. Mirov dikare vê muhakemeyê di Tea party'an de li ser kar bibîne ku di wan de hêrs xwe dide der li dijî "Obamacare"ê (reforma tenduristiyê ku serokê Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê bi zorê da qebûlkirin) û "civakîbûna" wê ya tenduristiyê ya qaşo. Alîgirên Tea Party'ê bi ser de jî dixwazin ku Medicare ango bi destê dewletê misogerkirina parastina tenduristiya kal û pîran bimîne.

Senatorê komarparêz Bob Inglis çavdêriyeke xwe weha tîne zimên: "Ez neçar bûm ji wan re bi kubarî rave bikim ku ya ku tenduristiya wan misoger dikir, dewlet bû. Lê belê wan qet guh nedida gotinên weha." (5) Ev korbûn xwe bi hêsanî rave dike: li aliyekî hevalbendên Tea Party'ê tesbît dikin ku Madicare û "social security" (sîstema tenduristiyê ya giştî) hêdî hêdî têk diçin; li aliyê din nabînin ku taybetkirina wan a harbûyî û nebûna çavkaniyan ev sazî anîne ber îflasê. Ya ku ew dixwazin ew e ku him ji neolîberalîzmê (Medicare'ê jî dest nedin) û him jî ji sosyalîzmê (jêbirina Obamacare'ê) werin parastin.

Parêziya sînoran an cihê kar

Hemin di parastina tenduristiyê de ya ku birêveberiya Obama kire dewrê, yek grama bi tenê jî komunîzm nîne û di qanûna li ser koçberiyê de ji xwe hîç nîne. Ya rastî, berovajî milîtanên Tea Party'ê ku gellek caran bi zimanê wan diaxivin, aborîzanên dibistana Chicagoyê sînorên vekirî dikin parçeyekî bihevguherîna serbest. Li gorî van aborîzanan, ne koçberî, lê belê "kontrolkirina koçberiyê" nêzî "awayekî plankirina sosyalîst" e. Lîberal weke din bi taybetî balê dikişînin ser ku gava ku mirov bi çavekî bi tevahî aborî li mijarê binihere, koçberiya qaçax jî bi qasî komunîzmê dûrî şikbiriyê ye, lewre ew "bi rengekî bersivê dide hêzên bazarê ku li gorî koçberiya qanûnî tetmînkartir e" û "him bi kêra karkerên bêqaxez (qaçax) tê ku dixwazin li Dewletên Yekgirtî kar bikin û him jî bi kêra karsazan tê ku li karkerên weha digerin ku dikarin xwe li gorî rewşê eyar bikin û erzan bin" (6). Bi vê maneyê, dema ku Beck dengê xwe bi yekê ji sloganên li pêş ên Tea Party'ê – "ji koçberiyê re erê, ji koçberiya qaçax re na" – dike yek, ew ji dijberiya kommunîzmê bêhtir ya neolîberalîzmeke herî xwerû dibe. Dema em van hemûyan bixin ser hev ya ku Tea Party weke xetereya herî mezin a li pêşiya kapîtalîzmê vedayî dibîne, kapîtalîzm bi xwe ye...

Bêguman tu kes li destekkirina koçberiya neqanûnî nafikire. Daxwazeke bi vî rengî jixwe wê serêpêşî nakok be – ya ku di vê mijarê de hevgirtî ye, bêhtir daxwaza vekirina qanûnî ya sînoran e. Lê belê pozîsyoneke di prensîba xwe de absurd, dikare di warê siyasî de watedar be. Bi vî awayî birêveberiya George W. Bush û herweha ya Barack Obama siyaseteke koçberiyê meşandin ku armanca wê ew bû, karkerên erzan ji karsazan re peyda bikin û bi ser de jî van karkeran bi xwe ji ber ku qaçax in – ji xwe qaçaxbûna wan sedema erzanbûna wan e – gunehbar bikin.

Di destê yên herî dewlemend de kombûna ecêb a dewlemendiyê, li gorî awayê birêvebirina koçberiya kaçax e: axaftina weke notirvanekî ser sînor û tevgerîna weke buroyeke peydakirina kar. Li cîhê ku girtina sînoran mezinbûna newekheviyan sînordar kir, mobîlîteya nû ya sermayeyê û kar bandoreke berevajî kirin. Karker û xebatkarên her diçe bêhtir koçer, sermayeyên her diçe bêhtir gerok û rakirina kontrola li ser aboriyê ku tevgerên wan xisleta vê neolîberalîzmê ne. Bi gotinên David Harvey vê neolîberalîzmê "newekheviya civakî ya zêde dibe" di "movikên pişta projeya" xwe de bi cîh kir (7).

Ango tiştekî ecêb nîne ku reaksiyonên tirsê li Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê zêde dibin, qet nebe di nava kategoriyên karkeran de ku gihiştina wan a dewlemendiya neteweyî her diçe kêmtir dibe. Di destpêka salên desthilatdariya Reagan de çînên xizan û navîn ku ji sedî 80'yê serjimara welêt bûn, % 48'ê hatina neteweyî bi dest dixistin; ev çîn îroj bi tenê % 39'ê hatina neteweyî bi dest dixin.

Hêrsa ji neheqiyê ya ku Glenn Beck û Tea Party nîşan didin dîsa jî balkêş e. Ew para bêhtir di nava kategoriya % 20'ê Amerîkiyan de ne ku hêrî dewlemend in û ji bo wan neolîberalîzm bazareke baş bû (8). Jixwe koçberiya qaçax jî yek ji palpiştên dewlemendiya wan e. Erê em fêrî wê fikrê bûne ku xizan di nava xwe de muxalifiya hev dikin, lê belê beramberî vê em fêr nebûne bibînin ku dewlemend siyasetên ku ew dewlemend kirine, protesto dikin – bi ser de jî vê yekê li kuçe û kolanan dikin!

Fenomeneke bi vî rengî bi tenê bi awayê ku xuya dike, hevnegirtî ye. Hemin para dewlemendiya ji % 20'ê herî dewlemend re veqetandî di nava van sîh salên derbasbûyî de her zêde bû. Ev yek nûçeyeke baş e ji bo hêzeke siyasî ya ku li ser navê heqdayîna jêhatîbûyînan û redkirina sosyalîzma sertewandî, newekheviyan pîroz dike. Di vê navberê de ya xirab ew e ku zêdebûna para mirovên herî dewlemend herî zêde bi kêra çîna herî jor a di nava dewlemendan de hat. Sala 1982'an % 1'ê Amerîkiyan yên herî dewlemend xwediyê % 12.8'ê dewlemendiya neteweyî bûn: sala 2006'an bûn xwediyê ji sedî 21.3'ê dewlemendiya neteweyî, ango dewlemendiya xwe nêzî du caran li berê zêde kirin. Di heman demê de para dewlemendiyê ya ji % 20'ê herî dewlemend re veqetandî "bi tenê" ji % 39.1'ê gihişte % 40.1'ê. Dema Tea Party koçberiyê weke xetereyekê dibîne, wateya vê ew e ku hayê wê baş ji mijarê heye: sempatîzanên wê fediyokî tesbît dikin ku newekheviyên strukturel ku awayê jiyana wan pêk tînin, gihîştine asteke ji berjewendiyên wan û wêde ye. Kapîtalîzmê ew kirin ji yên serkevtî û nuha jî xetere heye ku wan bike yên binketî.

Vê rewşê kir ku dij-elîtîzmeke qaşo derkeve holê û ev dij-elîtîzm ji ya ku siyaseta amerîkî em fêrî wê kirine bêhtir mirovan metelmayî dihêle. Bi rengekî giştî, milyonerên Partiya Komarparêzan ji bo ku li gorî milyonerên Partiya Demokrat nêzîktir gel xuya bikin xwe bi rêkûpêk dikin, cizmeyên kowboyan dikin rêz, li ber jiberxwekirina zarokan radibin û bê navber behsa Îsa dikin (9). Lê belê îsal, çawa ku hilbijartinên pêş ên ji bo diyarkirina namzetan ên li New York, Delaware û Alaskayê jî nîşan da, Îsa bi tenê bes nîne. Bi vî rengî, ne bi xêra xurtbûna baweriya xwe ya bi xirîstiyaniyê, namzeta Tea Party'yê Christine O'Donnell hevrikê xwe yê komarparêz li eyaleta Delaware'ê têk bir; tevî ku xurtbûna baweriyê di mijarê de hinekî bû koz jî (ew birêvebira Hevgirtina Xilaskeran ji bo Desthilatdariya Rastiya Xwedê 'The Savior's Alliance for Lifting the Truth' bû, ev terîqeteke xwe dispêre incîlê ye û waezên dûrbûna ji hezên cinsî dide û bi hişkî masturbasyonê rexne dike). Ya ku kir ew bi ser bikeve axaftina wê ya bi kelecan a li dijî "çîna birêveber" bû. Hê nû di mîtîngekê de di nava tofaneke çepikan de wê bi qêrîn got "Elît ji me fahmm nakin, li gorî wan em dîn in. Lê belê, yê me, em gel in!" Paşê jî di nava koma dewlemendên komarparêz de wê êrîşî dewlemendên demokrat kir, wê xwe li ber kevnenamzetê hilbijartinên serokatiyê John Kerry girt û ew gunehbar kir ku xwestiye baca diviyabû ji bo yata xwe ya nikûnû ya bi 7 milyon dolaran, bidize: "tu carî karekî min ku mûçeyê wî gellekî baş bû, çênebû û maşîneke min a meqêm jî. Tu carî min ji xwe nepirsî ka yata xwe li ku veşêrim da ku ji destê baca dewletê xilas bibim. Û ez jê piştrast im ku pirraniya we jî weke min in."

Populîzma ku bi destê milyarderan ve tê fînansekirin

Rast e ku Christine O'Donnell henekê xwe bi siyasetvanên dewlemend dike û pê bala hilbijêran dikişîne, di rewşa kêmmuhtemel a ku were hilbijartin de, hemin wateya vê yekê qet ne ew e ku li şûna wan ew ê baştir be. Tea Party ji nuha ve ji aliyê milyadarên mîna David Koch ve tê fînansekirin. Desteka Koch herî dawî dayî "me, gel" ew e ku wî 118 xebatkar li Carolina'ya Bakur ji kar derxistin. Em çiqasî karibin daxuyaniyên Tea Party'ê yên li dijî dewlemendan weke kelevajî bi nav bikin û dijminatiya wê ya li hemberî koçberiyê par ve nekin jî, ev li pêşiyê ne asteng e ku hêrsa ku ew bi xwe pê bi pêş dikeve di warê siyasî de li gorî dubare û dîsgotinên saziyên komarparêz û demokratan balkêştir e.

Buroya Federal a Serjimarê hê nû da zanîn ku 44 milyon Amerîkî di bin sînorê xizaniyê de ne û di heman demê de % 1'ê serjimarê nîvê dewlemendiya ku welat hildiberîne, kontrol dike. Partiyeke ku wê ji bo berjewendiyên xwe bi dewlemendan re qayişê bikişîne û dema vê dike jî wê xizanan ji ber xizaniya wan ewqasî gunehbar neke; va ye ev yek ew ê di dîroka Dewletên Yekgirtî de rûpeleeî nû veke.

* Li zanîngeha Illinois'ê ya li Chicago'yê profesorê wêjeyê, nivîskarê pirtûka bi navê *La Diversité contre l'égalité* (Pirrengî li hemberî wekheviyê),weşanên Raisons d'agir, Parîs, 2009.

1 Hejmara temaşevanên metran O'Relly nêzî sê milyonan e, ya temaşevanên Beck nêzî du milyonan e

2 Nota wergêr: Li Ewropa û Amerîkayê, baby-boom ji bo nifşê ku piştî şerrê cîhanê yê duyem çêbûye tê bikaranîn. Piştî wî şerrî, li seranserê cîhanê gellek zarok çêbûbûn ku li gora nifşên piştî wan hejmara wan bi awayekî berbiçav zêde bû

3 "Limbaugh: "Russian communist" spies easily blend in with journalists, academics – "a communist is a communist"", MMTV, Washington, 8'ê tîrmeha 2010'an, http://mediamatters.org

4 Glenn Beck kovarekê derdixe, alavên ku ji bo îmaja wî hatine çêkirin difiroşe, pirtûkan pêşniyar dike. Zanîngehek jî ava kiriye ku fikrên wî fêr dike, tev li konferansên weha dibe ku temaşevan ji bo hatinê pereyan didin (buhayê bilêtekê, tîrmeha bihurî, heta 147 dolaran diçû). Li Fox Newsê meaşê wî 2.5 milyon dolar e ku bi tenê beşekî piçûk yê hatiniya wî ye (çavkanî: The New York Times Magazine, 29'ê îlona 2010'an)

5 Philip Ricker, "S.C. Senator is a voice of reform opposition", The Washington Post, 28'ê tîrmeha 2009'an

6 Richard N. Haass, serokê lijneya peywendiyên navneteweyî (Council on Foreign Relations), pêşgotina The Economic Logic of Illegal Immigration, de Gordon H. Hanson, Council on Foreign Relations Press, New York, 2007

7 David Harvey, A Brief History of Neoliberalism, Oxford University Press, New York, 2007

8 Bi tenê % 35'ê endamên Tea Party'ê didin xuyanî ku hatiniya wan di biniya pîvana navê ya 50 000'an e. % 20'an didin zanîn ku ew salê ji 100 000 dolaran zêdetir qezenc dikin

9 Bixwîne: Tom Frank, "Cette Amérique qui vote George W. Bush" (Vê Amerîkaya ku dengê xwe die Bush), et Serge Halimi, "Le petit peuple de George W. Bush" 'Xelkê George Bush û xelkê wî), Le Monde diplomatique, sibat û çiriya pêşîna 2004'a

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

Amerîka

Tevgera Tea Party'ê li Teksasê

ROBERT ZARETSKY *

Li Teksasê yekemîn pêla mezin a koçberiyê di navbera dawiya sedsala 19'an û destpêka sedsala 20'an de çêbû. Hingê Ewropî bi awayekî girseyî li bendera Galvestonê peya bûn. Ev eyaleta li başûr îroj hedefe sereke ya koçberên ji Meksîka û Amerîkaya Latîn e. Para bêhtir ev koçber bi awayekî neqanûnî dikevina nav erda eyaletê. Tevliheviya nîzama etnîk, çandî û zimanî yên ku ji ber koçberiyê pêk tên, bi awayekî mayînde rengê qada siyasî ya eyaletê diguherin.

Houston bajarê herî mezin ê Teksasê ye û di mezinahiyê de li Amerîkayê sêyemîn e. Li gorî lêkolîner Steven Klineberg, rêjeya şêniyê îspanî a ku sala 1980'ê % 15 bû, îroj ji % 40'î bihuriye. Çiqasî serjimara bi eslê xwe anglo-sakson pîr dibe, ya bi eslê xwe îspanî jî ewqasî ciwan dibe, ewqasî ku îroj nîvê mirovên temenê wan di navbera 18-29 salan de îspanî ne. Heke Teksas sibe ji bo ku Meksîkayê îzole bike dîwarekî lêbike jî – daxwazeke rastgiran e – ber bi 2040'î ve hejmara şêniyên bi eslê xwe îspanî wê ji ya anglo-sakson û reşikan bibihure.

Li Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê bi hejmara xwendekarên li dibistanan qeydkirî Teksas di rêza duyemîn de ye, lê di warê mûçeyên dersdaran de bi zor cîhê xwe di nav rêza 49'an de digire û di warê lêçûna serê xwendekarekî de jî di rêza 44'an de ye. Li gorî fikrê hevpar ê komarparêzên Teksasî û mîlîtanên tevgera Tea Party'ê, daxwaza pêknehatî ya başkirina sîstema perwerdeyê ya dewletê – ya ji vê jî xirabtir qanûnîkirina rewşa koçberên qaçax – şewbek e ku ew dixwazin li hemberî wê bibin bend.

Perwerde û koçberî: du mijar in ku parlemantera meclîsa eyaletê ya Teksasê Debbie Riddle bi xêra wan navdar bûye. Beriya çend salan wê li binyada fikra ku li gorî wê Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê divê ji bo her kesî çûna dibistanên dewletê misoger bike, pirsî: "ev fikr ji Moskovê, ji Rûsyayê tê. Ev fikr ji kanên dojehê tê. Ji bo ku me manîpule bike da ku em vê fikrê weke fikreke merd nîşan bidin. Tu tiştê vê fikrê yê merd nîne. Ev fikr wê bibe sedema têkçûyina vî welatî. (1)" Serê vê salê Riddle'ê pirsgirêka "zarokên terorîst ên bi derpiyê kin" derxiste pêş. Li gorî wê, jinên ku terorîst wan dişînin, ji sînoran dibihurin da ku zarokên xwe li ser erda Amerîkayê bînin dunyayê. Piştî ku gihîştin, ev "hêmanên di xew de" wê bi armanca ku li Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê kaosekê peyda bikin, çalak bibin.

Parlemanterê meclîsa eyaleta Teksasê Louis Gohmert jî ji ber xetereyeke bi vî rengî diponije. Li pêşiya kongreyê, Gohmert weha axivî: komên terorîst yên li başûrê sînor xwe amade dikin ku "jinên ducanî bişînin Dewletên Yekgirtî da ku li wir belaş zarokên xwe bînin dunyayê" ku ev jî wê zarokan bike welatiyên Amerîkayê. "Paşê zarok wê li welatê xwe vegerin da ku bi terorîzmê werin têrkirin. Piştî bîst salan, sîh salan ew ê rojekê vegerin vir da ku beşdarî rûxandina awayê jiyanê yê amerîkî bibin. (2)"

Di dema hilbijartinên pêş ên ji bo diyarkirina namzetên partiyan ên walitiyê de namzeta tevgera Tea Party'ê Debbie Medina jî bi heman awayî li dunyayê niherî. Beriya hilbijartinan, tecrûbeya wê ya siyasî bi serokatiya şaxê komarparêzan a herêma hilbijartinê ya Whartonê (serjimara wê 40 000 e) re sînordar e. Ji berdêla ku vê kêmbûna tecrûbeyê ziyan li wê bikiraya, xwe weke yek ji serfiraziyên wê yên sereke piştrast kir. Amennaya Medina di serî de ultra lîberal e: heyrana parlemanterê Teksasê û namzetê wêrek Ron Paul e – lewre tevî ku hîç şensê wî nebû jî di partiya muhafizekar de ji bo hilbijartinên serokatiyê yên sala 2008'an bû namzet. Lê belê ew baweriya xwe ya xirîstiyaniya incîlê jî nîşan dide. Ji xwe vê kombînasyona ecêb kir ku ew di siyasetê de bi awayekî xurt bilind bibe.

Ne bi tenê çend tiştên hevnegirtî. Medina weke mînak îdîa kir ku mafê dewletê nîne ne firotina sîlehan kontrol bike û ne jî bacê ji milkê şexsî bistîne. Lê belê, li gorî wê, divê hêza dewletê karibe zewacê û anîna nevîsiyan li homoseksuelan qedexe bike. Vê yekê popularîteya wê ya di nava endamên tevgera Tea Party'ê de qet kêm nekir. Çawa ku rojnamevanê Teksas Observerê, Bob Moser, tesbît kir, pêdiviya Medina pê nîne ku xîtabî girseyê bike "lewre girse û ew yek tişt in. Ya ji vê jî baştir, tecrûbeyeke hilbijartîbûnê li pêşiya wê ne asteng e û ew tu carî neçar nemabû ku ji bo qanûnekê dengê xwe bide yan jî di mijara pirsgirêkeke tevlîhev de alî bigire. (3)"

Dîsa jî bi bernameya pêşkêşvanê navdar yê Fox News'ê Glenn Beck, kampanyaya hilbijartinê ya Medina derbeke ciddî xwar (gotara Walter Benn Michaels bixwîne). Çapemeniyê derxistibû holê ku Medina destek daye fikra "rastiya li ser 11'ê îlonê" tevneke nefermî ku endamên wê pê bawer in ku hikumeta amerîkî bi xwe kiryarê êrîşên li dijî Pentagon û World Trade Centerê ye. Dema ku Beck li ser vê mijarê pirs ji Medina kir, wê weha bersiv da: "Min nedikarî delîlan hemûyan analîz bikim, Glenn ji ber vê jî ez nikarim... ez ne ... min bi awayekî aşkere versiyona fermî red nekir. Lê belê ez difikirim ku hin kes pirsên gellekî têkildarî vê mijarê dikin û derfeta Amerîkiyan çênebû ku der barê vê mijarê de bigihîjin hêmanan gişan ku derfeta çêkirina fikrekê bi wan re peyda bibûya. Lewma ez hukmê xwe ji xwe re dihêlim. (4)" Wê xwe şaş nekir, daxuyaniyên bi vî rengî yek ji hîmên îdeolojîk yên tevgera Tea Party'ê lê aşkere dike: baweriya ku dewleta federal çavkaniya tevahiya xirabiyên Amerîkayê pêk tîne.

Mirovên din ên li pêş ên tevgerê jî di jihevderxistina baweriyên xwe û rastiyan de heman zehmetiyan dikişînin. Dema rojnamevanekî CNN'ê ji Gohmert pirsî ka çi delîl hene ku ew îddiayên xwe yên der barê koçberan de bispêriyê, reng ji Gohmert çû û dengê xwe bilind kir: "Hûn êdî bûn berdevkê wan, ev hêsan e! Lê qîmetê we ji vê bêhtir bû. Wextekî we baştir bi karê xwe dizanî. (5)" Zêde di ser weşandina vê bernameyê re nebihurî kevnerayedarê bilind ê FBI'yê yê ji operasyonên navneteweyî berpirsiyar Tom Fuentes diyar kir ku "tu nîşan û tu delîl nîne ku bike mirov bifikire ku hin kes li hin deveran lê fikirîne ku zarokên terorîstan li ser erdên Dewletên Yekgirtî bînin dunyayê." Lê belê, di cîhaneke manewî de ku tê de dijminên yek ji yê din xeyalîtir li derve û li hundir dor lê girtine, hizirên bi vî rengî zêde giraniya xwe nînin.

Ya ku li Teksasê diqewime dê Richard Hofsadter yê ku sala 1964'an pirtûkeke ku îroj gellekî ji ber tê girtin a bi navê "şêwaza paranoyak di siyaseta amerîkî de" nivîsî matmayî nehişta. Medina û Gohmert ne jirêketî ne, mirovên "normal" in, lê belê "awayên xweîfadekirinên paranoyak" yên ku bi "mubalexeyên weke êgir, gumanên giştîkirî û teoriyên komployê" barkirî ne, bi kar tînin. Û dema ku li derveyî lîstika siyasetê tên hiştin, hingê vê yekê weke piştrastkirina tirs û gumanên xwe dibînin. "Ew bi tenê bi bandora desthilatdariyê dihisin û bi ser de jî bi awayekî wê yê şikl-xirabûyî. Ji ber vê jî ew nikarin fêm bikin ka çawa ew dixebite."

Sîrka çapemeniyê ya li dora Medîna, Riddle, Gohert û partîzanên wan kir ku ya hê doh weke ne mumkin xuya dikir, pêk were: kir ku walî Rick Perry – piştî ku li şûna George W. Bush bû walî, ji bo dewreke sêyemîn a walîtiyê namzet e – weke mirovekî sergevez were qebûlkirin. Di sibatê de dema ku Medina ji xwe mijara 11'ê îlonê dipirsî, Perry li paytexta Teksasê Austinê spora xwe dikir û keftarekî çolê yê di wir re derbas dibû kuşt: walî kêm caran bêyî demançeya xwe ya nîşana wê bi lazerê ji bo bibeze ji mal derdikeve; kî dizane çi tê serê mirovî (6)…

Perry rexne li qanûneke li dijî koçberiyê ya rasîst ku eyaleta Arîzonayê hewl da derxe, girtin. Wî herweha xwe dûrî bêpîvaniya axaftina waliyê vê eyaletê Jan Brewer'î jî girt. Brever – bêyî ku carekê jî bi delîlan piştrast bike – weke ku çeteyên meksîkî mirovan tînin çolê da ku wan ser jê bikin, dide nîşan. Pêdiviya Perry pê nîne ku ewqasî bide nav. Bêyî ku jî cîhê xwe yê carê bileqe – aliyê rastê yê texteyê kişika siyasî – kelevajiyên her diçe zêde dibin yên rastgirên radîkal dikin ku ew weke mirovekî nerm were qebûlkirin. Ew pê dizane ku li Teksasê mirov xwe ji dengên spanîk qut bike, ev bêtedbîrî ye ku dikare zirarê lê bike. Ma George W. Bush bi xwe jî dema ku walî bû ev deng kom nekiribûn?

Weke siyasetvanekî ku li ser wî gotegot hene, dibêjin ku daxwaza wî ya serokatiyê heye. Perry xwe ji tu derfetan nahêle ji bo ku dev biavêje Washingtonê. Li ser pirsgirêka koçberiyê, beriya ku hikumeta federal bi rewşa qaçaxên ji xwe li ser erdên welêt in dakeve, ew dixwaze ku sînor "ewle" bike; pêwîstiyek e ku destûrê dide, mirov tevahiya hizirînên ciddî yên li ser pirsgirêkê, bêyî diyarkirina demekê, paş ve bixe. Der barê reforma sîstema tenduristiyê de ku demokrat destekê didinê, Perry îdîa dike ku "Teksasî hez nakin ku burokrat ji 2500 kîlometroyî dûrî wan werin û dest bi pêlîstina sîstema wan a tenduristiyê bikin. (7)" Di vê mijarê de Perry hesabê pêşhukmên Teksasiyan dike û bi taybetî jî yê partîzanên tevgera Tea Party'ê. Ji berdêla ku dewletê weke bîrêvebirina netewe bibîne, ew wê dike otokratekî biyanî. Û ew qanûneke ku li ser şîrketên sîgorteyê ferz dike derfetên wan û rewşa wan a tenduristiyê çi dibe bila be, welatiyan hemûyan sîgorte bike jî weke "pêlîstineke" gumanbar nîşan dide.

Li ser reforma sîstema perwerdeyê (8), Perry hema wilo red kir ku tevlî bernameyeke neteweyî bibe ku subvansiyonên girîng pêşniyarî eyaletan dikirin. Eyaletên ku projeyên wan ên perwerdeyê ji aliyê wezareta perwerdeyê ve hatine erêkirin dikarîn van subvansiyonan bistînin. Heke bixwesta Teksasê dikarî 700 milyon dolarî bistîne, lê belê Perry da xuyakirin ku bi tenê karê Teksasiyan e ku biryarê bidin ka zarokên wan divê çawa bixwînin.

Sala 2006'an stranbêj û komedyenekî navdar Kinky Friedman di hilbijartinên pêş ên ji bo diyarkirina namzetê walitiyê de bû berendam. Sloganên kampanyayê yên li bîra mirovan man ên weke "Ma ji bo çi ne ez? an jî "Ev kar, ê ewqasî jî zehmet nebe!" kirin ku di nava partiya xwe de % 16'ê dengan bistîne. Vê mehê ew ê jî dengê xwe bide namzetekî ku bi qasî wî navika wî bi derve ve girêdayî, lewma li gorî wî tu rêya din nîne: "çend siyasetvan hene ku hûn ji dil rêzê ji wan re digirin û heyranê wan in? Min bi xwe hejmart, ez hê li sifirê me. (9)"



SERHAD BAPÎR: **Li hemberî hev** (2005), Teknîka tevlihev, 21 x 15,5 cm

* Li zanîngeha Houstan, Teksasê, li Honors College, profesorê dîrokê, nivîskarê pirtûka bi navê *Albert Camus: Elements of a Life* (Albert Camus: Hêmanên jiyanê), Cornell University Press, 2010.

1 *El Paso Times*, 3'ê adara 2003'an

2 *The Texas Tribune*, Austin, 28'ê hezîrana 2010'an

3 *The Texas Observer*, Austin, 8'ê sibata 2010'an

4 *The Houston Chronicle*, 11'ê sibata 2010'an

5 *The Huffington Post*, 13'ê tebaxa 2010'an. Hevpeyvîna Gohmet û herweha hevpeyvîneke bi qasî wê surrealîst ya ligel Riddle li ser înternetê bi milyonan caran hatine temaşekirin

6 *The Seattle Times*, 27'ê nîsana 2010'an

7 *The Texas Observer*, 19'ê nîsana 2010'an

8 Bixwîne: Diane Ravitch, "*Volte-face d'une ministre américaine*" (Rûberû li gel wezîrekî amerîkî), *Le Monde diplomatique*, çiriya pêşîn 2010

9 *Santa Cruz Sentinel*, 29'ê tîrmeha 2010'an

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê



Nîsan 1974

ŞERRÊ DI NAVBERA BEXDA Û KURDÊN GENERAL BARZANÎ DE

Ji têkoşîna bo xweseriyê ber bi meyla serxwebûnê ve

CHRIS KUTSCHERA *

Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) ya general Barzanî, statuya xweseriyê ya ku hikumeta Iraqê di roja 11'ê adara 1974'ê de dabû Kurdistanê, red kir. Ev rabûna tansiyonê, çar sal roj bi roj bi du peymana 1970'ê re pêk tê ku bi wê peymanê ve dawî li neh salên şerrî anîbû.

Kurd û Bexda, di serî de li ser tarîfe û şertên xweseriyê, bi awayekî mayinde li hev nakin. Di derbareya van xalên taybet de, tehlîla muqayesekirî ya projeyên her du aliyan dê li jêr bikare bê xwendin. Digel ku mesafeya di navbera van projeyan de ji xwe pirr mezin e, haya Kurdan ji rewşeke weha heye ku ji hêla rayedarên Bexdayê ve jî baş tê zanîn: ku ji bo demeke dirêj red dibin, xwastekên xweseriyê di dawiyê de ber bi meyla serxwebûna tevahî ve diçin.

Ev bizav dikare bibe sedema kêşeyên hîn ciddîtir, ji ber ku xewna "Kurdistana mezin" ya ku dê Kurdên Iraq, Îran û welatên din jî di nav xwe de vehewîne, hê jî dimîne. Di vî warî de, divê lîstika hêzên ku di pirsgirêkê de, bi awayekî rasterast an nerasterast xwediyên berjewendiyan in, bi baldariyê bê şopandin.

Digel vê yekê jî, tansiyona navbera Kurdên general Barzanî û hikumeta Bexdayê zêde dibe. Piştî tekçûna muzakereyên xwe yên bi PDK'ê re, hikumetê di roja 26'ê adarê de biryarnameyên bicîhkirina statuya xweseriyê, ya ku di 11'ê adarê de hatibû dayîn, weşandin. Ev belgeyên hanê birêveberiyeke hevpar a di bin çavdêriya desthilata navendî de, efûyeke giştî û hilbijartinan destnîşan dikin. Dotira rojê, general Barzanî "navberkariyeke biyanî" xwast û got ku bi tenê ev navberkarî dê bikare rêyê li ber "şerrekî topyekûn a navbera hêzên wî û artêşa iraqî" bigire.

Li çarrêya Rewandizê, pîvan û kepirek sînora navbera herêma di bin bandora hikumeta Bexdayê de û erdên general Barzanî didin xuyakirin. Bi dû kontrola dawî ya asayîşên baasî re, trimbêl dîsa jî dide ser rêyê û hevreyên me aram dibin: yek ji wan dibêje "Hûn bi xêr hatin Kurdistana azad", û li belgeyekê digerre ku em ê pê bikarin derbasî baraja din bibin, ya ku ji hêla pêşmergeyên Barzanî ve tê çavdêrkirin.

Li milê rast, li ser zinarekî veniştî, bajarê Rewandizê heye; ew di nava dîmeneke asê û dijwar de disekine, li quntaxa çiyayên ku artêşa iraqî tu carî nekarî bi dest bixistana. Li derveyî bajêr, hêzên iraqî di avahiyeke askerî ya berfireh de radizên: ji agirbesta 11'ê adara 1970'ê ve, wan tu hewl nedaye ku derbasî wî aliyê sînorê nexuyayî bibin ku çend sed metreyan dûrî wan e. Sed kîlometre li paşiya me Hewlêr heye, û 250 kîlometre bi paş de jî, Kerkuka ku meşalên kevneşîrketa Iraq Petroleum Company (Şîrketa Neftê ya Iraqê) bi şev û rojê ronahiyê didinê. Berhemên wê yên salane bi qasî 50 mîlyon tonên neftê ne, û dê di demeke nêzîk de bibe 80 mîlyon ton; lewre jî Kerkuk sedema sereke ya kêşeya navbera Bexda û general Barzanî ye: ji bo Kurdan, Kerkuk paytexta Kurdistana Iraqê ye. Yek ji hevreyên me, têkoşerêkî ciwan yê ji tevgera ciwanên kurd, weha dibêje: "Îspata wê ya herî berbiçav jî ew e ku li Kerkukê goristaneke ereb tune! Lê bigerrin, hûn ê goreke ereb jî nebînin!"

Lê belê, di dema nuha de, bi tenê çiya di destên Kurdan de ne; em bi "rêya Hamilton" ku ji navê muhendîsê îngilîz tê ku ew pencî sal berî nuha ev rê çêkiriye, ber bi wan çiyayan diçin. Rêya Hamilton jî rêçikeke piçûk ya nav çiyayan e, teng e, bi dewr û çerx e; bi dirêjiya bi qasî 80 kîlometreyî, ev rê derbasî bajarê Hecî Umranê dibe ku li ber sînorê Îranê ye, û ji wira heta Îranê û bajarên wek Xanê ku Amerîkiyan piştî şerrê cîhanê yê duyem tê de hîmeke leşkerî çêkir, û Mehabadê diçe.

Îroj ev rêya sereke ye, li welatekî ku di tu nexşeyên Rojhilata Navîn de nayê dîtin û ji hêla tu hêzê ve nayê naskirin, lê welatekî ku serokê wî, general Barzanî, "ji gellek serokdewletên ku li Dewletên Yekgirtî cîh digirin, xwediyê desthilatdariyeke mezintir e", li gorî gotina karbidestekî kurd: bi rastî jî, Barzanî çend sed kîlometreyên tixûbê li Rojhilata Navîn bi rê ve dibe ku ev jî yek ji herêmên herî girîng û stratejîk ên dunyayê ye: tevahiya sînorê Iraq û Tirkiyê, beşekî ji sînorê Iraq û Sûriyeyê, û nêzîkî nîvê sînorê Iraq û Îranê.

Di vê "Kurdistana azad" de, tiştê herî berbiçav jî sosretiya têkiliyên navbera du cîhanan bû, cîhanên ku dijberî hev in û li ber şerrî ne, lê belê bi awayekî ecêb bi hev re dijîn. Tevî ku artêşa iraqî, ji bo deh salan, bi hêrs û bi xezeb li dijî hêzên Barzanî şerr kir û carinan jî berpirsê pêkutiyên dijmirovahiyê bû, ev ceng tu carî nebû cengeke nijadî: di dema pevçûnên herî dijwar de jî, Kurdên Bexdayê ku ji nîv mîlyonî bêhtir in, tu carî nebûn hedefa tade û bêdadiyan, û digel ku li ser endamên malbata Barzanî fermana kuştinê hatibû dayin, birêveberên kurd ên din hê jî bi rehetî dikarî ji balafirgeha Bexdayê biçûna Londra an jî Moskovayê! Şerr tu carî ji nav sînorên Kurdistanê derneket û nehat Bexdayê an bajarên mezin ên din ên Iraqê. Nûnerên sivîl û leşkerî yên hikumeta iraqî nikarin bikevin axa bin destê general Barzanî, lê belê Barzanî, ji bo pêşmergeyên xwe, bi mehê 250.000 dînarî (nêzîkî 750.000 dolarî) ji hikumeta iraqî distîne!

Kurd xwediyên radyo û weşanên bi zimanên biyanî nînin (1), da ku "hikumet aciz nebe", lê belê rojnamevanekî amerîkî dikare ji sînorê Îran û Iraqê, ya ku di bin çavdêriya Kurdan de ye, bi qaçaxî derbasî Iraqê bibe û bi general Barzanî re hevdîtinan çêbike.

Pênc wezîrên kurd li hikumeta Iraqê rûdinin û di heman demê de, birêveberên iraqî du lîwayan digel hêzên topavêj ên giran bi ser gundên kurd de dişînin... Aştî bi dawî bûye, lê hê jî şerr nîne. Li ser pirsa ka di vê rewşê de, civînên desteya wezîran di hewayeke çawa de derbas dibin, birêz Mihemed Mehmûd Evdilrahman, wezîrê kurd yê karên Bakur, weha dibersivîne: "Hinekî sosret e. Mirov dikare bibêje ku em şiklekî nû didin têkiliyên nav mirovan..." Lê kes bawer nake ku dê weha pirr bidome.

Guherînên watedar ên ku ji heşt mehan ve ye ku li "Kurdistana azad" tên dîtin, baweriyeke weha bi xwe re tînin ku Kurd ji felaketên mezin ditirsin û ji bo hemû îhtimalan amade ne.

Bi pey nîv seeteke rêyê re, di doleke weha de ku dişibe newaleke piçûk a çiyayên Fransayê- di ber heman çemên qeşagirtî, hêşînahiya xwezayê, keriyên bizin û mîhan û garanan re -, em digihîjin Gelaleyê, bajarê mezin yê ku tam di bin kontrola Kurdan de ye ew bi tenê ye, û bi saya qaçaxiyeke bê navber a bi Îranê re, xwediyê maldariyeke nû ye. Êdî me bi rastî Ewropa li dû xwe hiştiye... Xelkê bajêr - şelwer û sako û şaşik li serê wan, keleşnîkov an tifing li milê wan - rastiyê bi bîra mirov dixin.

Çend deqîqe bi şûn de, em li Nawperdanê ne ku bi tenê 30 kîlometre dûrî Rewandizê, bes tam di "welatê kurd yê azad" de ye: Nawperdan fermangeha hêzên general Barzanî ye û peymana 11'ê adara 1970'ê li wira, di dibistaneke piçûk de hatiye îmzekirin; li wira jî, polîtburoya Partiya Demokrat a Kurdistana Iraqê bi serûberî dicive. Dezgeh ji xwe bê nexş û sade ne: xaniyên piçûk ên ji axê çêkirî, bi baniyên hilû yên darên koknarê re, di bin axê de poşayî, çend kelûpelên malê û hew... Havînan, hîn "siviktir" e: rayedarên kurd di nav daristana berrûyan de, ya ku çiyayî dinixume, li ber dezgehên ku zû bi zû hatine danîn dixebitin: ev dezgehên madenî û telefonên seyyar, tevahiya binavahiya rêxistinekê ne ku ji bêhtirî deh salan ve ye artêşa iraqî, ya ku li ser eniya Sûriyeyê jêhatibûna xwe ya şerrî nîşanî Îsraîliyan da, têk dibe.

Desthilatdarên berxwedana kurd, li Nawperdanê û derdora wê tên dîtin: general Barzanî yê 70 salî, lawên wî Îdrîs û Mesûd ên ku ji 30 û 25 salî ciwantir in û her ku diçe roleke girîngtir dileyizin, Hebîb Kerîm, sekreterê giştî yê PDK'ê, Dr. Mehmûd Osman, endamê polîtburoyê, François yê asûrî, "waliyê" Gelaleyê, Şakîb Aqrawî, endamê komîteya navendî û berpirsekî din yê "asayîşa" kurd...

Li Nawperdanê, polîtburoya partiyê bi serûberî dicive û kesayetiyên cuda yên wek Alî Abdulla, waliyê Silêmaniyê, Dara Tawfiq, serredaktorê rojnameya kurd *el Taaxî* a ku bi zimanê erebî li Bexdayê diweşe, Mihemed Mehmûd, wezîrê karên bakûrî, Salih Yûsivî û Nûrî Şiwesy ku wezîrên kurd ên hikumeta iraqî ne, kom dibin. Ev kes jî mirovên ku heta demeke nêzîk an dirêj tev li general Barzanî bûn, lê belê hemû sexşiyetên berxwedana kurd a "dîrokî" ne...

Hatina teknîsyen û firaran

Lê belê ji heşt mehan ve ye rûyên nû li Nawperdan û Çomana "bajarên nû" yê Kurdistanê xuya ne: ev vegera xwendekarên kurd ên iraqî ye, yên ku li Ewropayê, bi taybetî li rojhilatê Ewropayê xwendiye û ji general Barzanî re endamên "teknokrat" tînin, endamên ku heta nuha ji rêxistineke hema bêje tam leşkerî û aşîretî kêm mabû.

Ji nuha ve serşêwirmendekî polîtburoya PDK'ê heye ku ew jî Evdilxaliq e, muhendîsek e ku li zanîngeha Pragê xwendiye. Muhendîsekî din, Şivan Çaxewan ku li Almanyaya Rojhilat û Rojavayê Berlînê xwendiye, çar muhendîsên "dezgeha pêşketina civakî" bi rê ve dibe ku ev dezgeh jî ji hêla berxwedana kurd ve hatiye avakirin û mîna îdareyeke hevrast dixebite. Dezgeh bi xizmetên plana bajêr û rêyên herêmê, destpêka îdareyeke av û daristanan, komeleyên gundî û îdareya berpirsa dayîna ajonameyê ve mijûl e. Xurşîd Hisên, xaknasekî pisporê neftê ye ku piştî heft salên xwendinê yên li Bukreşê, nû hatiye Kurdistanê, nuha lîsteya pêşîn a daneyên xaknasiyê ya Kurdistanê çêdike.

Muhendîsekî din, Cemîl Şeref ku ji heft salan bêhtir li Pragê maye, dibistana kadroyên siyasî yên partiyê bi rê ve dibe, ya ku bi pey îmzekirina peymana 11'ê adara 1970'ê re bêtal mabû, "ji ber ku baweriya me ew bû ku bi xweseriyê re, dê pêwîst nebûya ku em di bin van sertên nîv vêşartî de xebata xwe bimeşînin...". Pijîşk jî, û heta kevnekarmendê leşkerî yê balyozxaneya Iraqê ya Beyrûdê jî, tên û tev li refên berxwedana kurd dibin.

Digel ku hejmara van kadroyan hê jî hindik e - ew nuha nêzîkî duwanzdeh kesan in, - ev diyarde ji bo pêşeroja Kurdistanê pirr girîng e, ji ber ku heta nuha, ji bilî Dr. Mehmûd Osman, hemû kadroyên zanîngehê yên tevgera kurd çiya li dû xwe dihiştin û wek endamên "Akademiya kurd", li Bexdayê bi cîh dibûn ku bi vî awayî paytexta Iraqê jî di rastiyê de dibû paytexta Kurdistanê û vê paradoksê hebûna herêma Kurdistanê dixist nava xetereyeke mezin.

Li aliyê leşkerî, bi tenê çend kesayetî nînin, lê ji hezar Kurdan bêhtir, yên ku êdî tehemulî rewşa xwe ya di artêşa iraqî de nedikir, ji artêşa iraqî digel çekên xwe firar kiriye û xwe gihandiye çiyayên "Kurdistana azad" ku ew li wir jî di nav du firqeyan de ku di bin serokatiya kevnezabitên kurd ên firarên artêşa iraqî de ne, hatine dabeşkirin.

Vegera wan digel bicîhkirina pergaleke parastina dij-balafirên şerrî - li dora fermangeha giştî ya havînê ya Barzanî, nêzîkî Nawperdanê, li dora kampa firqeyên firaran û li dora Hecî Umranê - hevdem e, lê dibe ku alavên vê parastinê, topavêjên "Parastina Dij-Balafiran" yên 20 mm'î yên çekî an rûsî, bêhtir di warê çavtirsandinê de bibandor bin.

Arşîva bîra Kurdan

Salên 70'î du bûyerên mezin hebûn ku dê qedera Kurdên Iraqê ji binî ve biguheriyaya. 11'ê adara 1970'ê, di navbera Mistefa Barzanî û Hikumeta Bexdayê de peymaneke otonomiyê hate îmzekirin. Lê belê, tam çar sal bi şûn de diyar bû ku hikumeta navendî dê wan sozên xwe negire. Herdu hêlan jî amadekariya şerrî dikir. Chris Kutschera yê ku rojnamegerî fransî yê navdar e, wê demê çû serdana general Mistefa Barzanî da ku helwêst û daxwazên wan bi dunyayê ve bide naskirin. Lewre wê demê bi tenê bi rêya rojnamegeran ve dengê tevgera kurd ya başûr li dunyayê dihat bihîstin. Em di vê nivîsê de dibînin ku mijarên ku hê jî aktuel in 40 sal berê jî hebûn û helwêsta Kurdan her zelal bû: yan otonomî, yan serxwebûn. Lewre Kurdan êdî dixwast ku bindestî xilas bibe û hêza wan jî hebû.

Chris Kutschera ji salên 70'yî ve li ser pirsgirêka Kurdan dinivîsîne û tev li konferansên li ser vê mijarê dibe. Di kovar û rojnameyên mîna le *Monde diplomatique*, *Confluences Méditerranée*, *Politique internationale*, *Les Cahiers de l'Orient*… de gellek nivîsên wî derketine. Hin pirtûkên wî yên li ser pirsgirêka Kurdan jî ev in:

Kurdistan (Favre, 2000)

Le Défi Kurde, ou le rêve fou de l'indépendance (Pirgirêka Kurdan **û** xewna serxwebûnê ya ecêb), Bayard, 1997

Le Mouvement National Kurde (Tevgera kurd ya neteweperwer), Flammarion, 1979

LM*d*kurdî

Ev hemû nîşan û yên din ên jîrtir jî, fikireke weha dixin bîra mirov ku amadekariyên şerrî yên ku li Kurdistana azad tên kirin, bi tenê bi armanca xweseriyê nînin.

Bandora şerrê Îsraîl û Ereban

Di roja 6'ê çiriya pêşîna 1973'ê de, dema ku generalên misirî û sûriyeyî hêzên xwe li dijî bunkerên îsraîlî yên xeta Bar Lev û Golanê avêtin, bêyî ku haya wan jê çêbibe, wan rê li ber qewimîna şerrekî din ê li Rojhilata Navîn girt. Bi rastî jî, heger ev şerr tunebûya, rayedarên baasî yên Bexdayê dê sisê ji lîwayên xwe yên herî jêhatî ne bi ser rêya Sûriyeyê de, lê belê ber bi çiyayên Kurdistanê ve şandibûna.



SERHAD BAPÎR: **Deng** (2007), Grafîka bi şirêjê ya li ser Linoleum. 32 x 32 cm

Qet nebe, ev baweriya desthilatdarên kurd e, û tahlûkeya rewşa leşkerî ya 6'ê çiriya pêşîn ji xwe nayê înkarkirin:

• Di herêma Şiwanê de, li bakurê Kerkukê, niştecîhên duwanzdeh gundên kurd fermana valakirina gundên xwe wergirtibû, da ku "bihêlin ku artêşa iraqî operasyonan li dar bixe". Bi dû telgrafeke xurt re ku ji polîtburoya PDK'ê ji serokkomarê Iraqê Bakr re hate şandin, ferman taloq bû lê tansiyon zindî ma;

• Roja 3'ê çiriya pêşîn, li Derbendîxanê li rojhilatê Kurdistanê, artêşê bi şevê şûnên hêzên kurd dagirtin : Kurdan jî dij-êrîş kir û şûnên xwe dîsa bi dest xistin, bes ji hêla topavêjên iraqî ve li wan hat xistin.

• Di dawiyê de, roja 28'ê îlonê, piştî pevçûnên di navbera pêşmergeyên general Barzanî û têkoşêrên komunîst de, artêşa iraqî du lîwa şandine herêmên El Koş û Şêxanê û deh rojan bê navber êriş bir ser hêzên kurd; li gorî çavkaniyên kurd jî, bîlançoya van pevçûnan ev bû: deh gundên xirabkirî, şeş sed malbatên koçkirî û hijdeh Kurdên kuştî.

Di dema rûdana şerrê çiriya pêşîn de, polîtburoya PDK'ê li Nawperdanê di nav civîneke nirxandina rewşê de bû; yekser general Barzanî tercîha desbirakiya welatên ereb li dijî Îsraîlê dike û ji hemû yekîneyên pêşmergeyên xwe re emir dike ku operasyonên xwe rawestînin û ji rêya yekîneyên artêşa iraqî dûr bimînin. Ji bo şaxên PDK'ê yên bajaran talîmat tê dayîn ku di her warî de hevkariya hikumetê bikin. Axir, general Barzanî ji serokê Bakr re nameyekê dişîne ku 8'ê çiriya pêşîn bi destê Ezîz Şerîfê wezîrê dewletê û xelatgirê xelata Lenîn a aştiyê ve tê gihandin. Barzanî di naveroka nameyê de aciliya vekirina muzakereyan bi bîr dixe û dibêje ku ji bo pêşwazîkirina heyetekê an jî şandina heyeteke ya ji bo Bexdayê hazir e. Ev name dê bê bersiv bimîne.

Di heman demê de, peywirdarên taybet ên general Barzanî bi balyozxaneyên Misir, Suriye û Yekîtiya Sovyet re têkiliyan deynin. Lê belê, digel vê helwesta aştiyane, artêşa iraqî ji bo du rojên din êrîşên bê navber tîne ser Kurdan. Bi tenê bi biryara hikumeta Bexdayê re ya ku hêzên xwe dişîne cenga li dijî Îsraîlê, û bi vî rengî % 80 hêzên xwe yên mijûlên şerrê li dijî Kurdan ji herêmê vedikişîne, aramî vedigerre Kurdistanê. Bi hatina zivistanê re, Kurdan bi ihtimaleke mezin di warê leşkerî de çar mehên navbirê qezenc kirin...

Lê belê, di warê siyasî de, tansiyon nizm nabe, berevajî vê ye jî: 12'ê çiriya pêşîn, rojnameya rojane ya Baasa iraqî *el Thawra* (Şoreş) gotareke weha diweşîne ku biryara hikumetê ya şandina hêzên xwe ji bo Suriyeyê û şertên vê biryarê şîrove dike: nivîskarê vê analîzê, Tariq Ezîzê serredaktorê *al Thawra* û alîgirê Saddam Hisên, di destpêka nivîsarê de dîsa daynina têkiliyên dîplomasiyê yên bi Îranê re, di roja 7'ê çiriya pêşîn de, bi bîr dixe û vê yekê weke rakirina xetereya li ser eniya rojhilata Iraqê şîrove dike, paşê jî, li ser "pirsgirêka din a Iraqê (...), kêşeya asayîşê ya pirr ciddî ku ji rewşa bakurî tê (...) û xetereyên wê yên ji bo yekîtiya Iraqê" radiweste. Li gorî Dr. Mehmûd Osman, "wateya wê jî ev e ku rayedarên Bexdayê me ji Îraniyan xeternaktir dinirxînin. Piştî fermanên ku me ji pêşmergeyên xwe re şandin, ev bi rastî tahrîk e!"

Roja 17'ê çiriya pêşîn, digel hişyariyên dubare yên rayedarên kurd, Saddam Huseyn di kevneparlamentoya Bexdayê de sê sed "kesayetiyên kurd ên serbixwe" - li gorî Barzaniyan memûrên hikumetê bûn, - anîn cem hev da ku bi wan re li ser xweseriya Kurdistanê bipeyive. Saddam Huseyn ji Kurdên amade re got ku projeya xweseriyê ya PDK'ê "cudaxwaz e û ji bo yekîtiya Iraqê metirsiyek e." Ji bo birêveberên kurd, ev "tahrîkeke nû ye û ji yên berê ciddîtir e". Dr. Mahmûd Osman dibêje ku "ya rast, Baasiyan peymana 11'ê adara 1970'ê bi me re îmze kir û divê ew vê peymanê bi me re bi cîh bikin..."

Dr. Mehmûd Osman weha dewam dike: "Di hikumetê de, hin kes hene ku dixwazin "hevkariya" me ya bi Îsraîlê re îspat bikin û ji bo vê me bê navber tahrîk dikin: heger nuha pevçûnên ciddî biqewimin, ew ê bi lez û bez bibêjin ku va ye îspat dibe, lewre em ê ji paş ve li neteweya ereb bixin. Bes ev feq pirr aşkere ne..."

Xirabbûna têkiliyên navbera Kurd û hikumeta Bexdayê bi dawî nabe: di bihara 1971'ê de, general Barzanî qala "qeyrana pêbaweriyê" û "viyana baş" dikir. Di bihara 1973'ê de, piştî du hewldanên kuştina general Barzanî, rayedarên kurd ketin nava mitalan, lê belê ew hê jî dibêjin ku gengaz e ku peymana 11'ê adara 1970'ê bi rêya "hevdîtineke payebilind" a di navbera Barzanî û Saddam Huseyn de were parastin, û ji bo amadekariya wê, diviya Mesûd Barzanî biçûya Bexdayê. Di payîza 1973'ê de, êdî dem ne dema îfadeyên vala ye û qayilkirina her du aliyan a tunebûna muzakereyê weke tiştekî heyî, rewşê hîn ciddîtir dike. Rayedarên baasî nuha bi awayekî vekirî general Barzanî bi armancên cudaxwaz tawanbar dikin, û gazinda rayedarên kurd a ji Baasîstan jî ew e ku Baasîst dixwazin kêşeya xweseriya kurd bêyî Kurdan çareser bikin.

Gava bê veger di tîrmeha bihurî de hat avêtin, dema ku partiya komunist a Iraqê biryar da ku "Eniyeke neteweyî" bi partiya Baasê re çêbike û Partiya Demokrat a Kurdistana Iraqê têketina eniyê red kir, bersiveke neyînî ku Dr. Mehmûd Osman bi awayekî tund rave dike: "Ji sê sal û nîvan bi vir ve ye ku em di hikumetê de ne, û tiştek jî nehatiye çareserkirin... Lewre jî em naxwazin têkevin saziyeke nû. Ma tu desthilatdariya komunîstan heye?..."

Di kurtepeyamekê de, Kurdan mercên tevlêbûna xwe a Eniya neteweyî diyar kirin. Bêyî ku peyva "şert" bi kar bînin, ew çend "xalên nîqaşê" weha rêz dikin:

• Peymaneke li ser xweseriyê;

• Peymaneke li ser rêbazên sînorkirina herêma xweser;

• Veqetandina şûneke rast a di birêvebiriya welatî de ji bo partiyên din (Partiya Komunîst û PDK), da ku sîstema dewletê bi tenê di destên Baasê de nebe;

• Dawiyê, bicîhkirina demokrasiya resen a li Iraqê, bi rêya lidarxistina hilbijartinên giştî û azad, herî dereng saleke paşê tevlêbûna PDK'ê ya Eniyê.

Lê belê ji tîrmeha 1973'ê ve, Kurdan tu agahî ji desteya taybet a Baasiyan, ya ku ji bo muzakereyan hat avakirin, nestandin ku serokê vê desteyê jî Saddam Huseyn e û endamên wê yên din jî ev kes in: Murtada Abdulbakî, wezîrê karên derve, Tariq Ezîz, serredaktorê *el Thawra*, û Izzet el Durî, wezîrê cotyariyê (kevneserokê mahkemeya Nazîm Kazar (2).

Lê belê, ji wê demê û bi vir ve, Baasê "projeyeke statuya herêma xweser a Kurdistanê" derxist ku hema veqetîna bi general Barzanî re îlan dike. Tevî ku xweseriya Kurdistanê nuha bi tenê di kaxizan de ye, kaxiz pirr in: heta nuha sê projeyên statuya herêma xweser a Kurdistanê derketine ku yek ji hêla Baasiyan ve, yeka din ji hêla Kurdan ve û yeka din jî ji hêla Partiya Komunîst a Iraqê ve hatiye amadekirin.

Projeya komunîstan têkiliyên navbera desthilata navendî û desthilata herêmî bi awayekî zelal tarîf nake û bi tenê diyar dike ka karê desthilata navendî çi ye (parastin, karên derve, hwd.). Lê belê, tiştên ku li derveyî projeyê hatin hiştin jê balkêştir in: ji her sê projeyan, bi tenê ev proje heye ku behsa "yekîtî û dabeşnekirina" komara Iraqê (di projeya Kurdan de) neaxive, an jî nabêje ku "gelê kurd parçeyekî gelê iraqî ye û jê nayê veqetandin" (di projeya baasiyan de); qenciya esas a vê niherînê jî ew e ku ihtimala serxwebûna Kurdistanê red nake.

Cudabendiyên li ser destûra bingehîn

Berevajî vê yekê, projeya statuya herêma xweser a ku ji hêla Kurdan ve hatiye sazkirin belgeyeke pirr dirêj e û weke reşnivîseke destûreke bingehîn e: bi derxistina şertên weke "para herêma xweser di hatin û butçeya giştî ya dewletê de dê li gorî hejmara niştecîhên vê herêmê rêjedar bibe". Ev proje sîstema zagonî û hikumetî ya rasteqîn ji bo Kurdistanê destnîşan û ev xal tê de ne:

• Meclîseke zagonî û herêmî ya xwediyê desthilatdariyên berfireh: ew ê butçe, plan û zagonên herêmê nîqaş û qayil bike, û ew ê baweriya xwe bide desteya birêveber an jî jê vekişîne;

• Desteya birêveber, ji çardeh wezîran çêkirî ye û endamên wê dê ji hêla serokê desteya birêveber ve werin hilbijartin ku serokê desteya birêveber jî dê ji hêla Meclîsa zagonî ve were hilbijartin û dê ji hêla biryarnameyeke serokkomarê Iraqê ve di vê peywirê de were piştrastkirin. Serokê desteya birêveber bi zagonî cîgirê serokwezîrê hikumeta Iraqê ye;

• Dadgeheke destûrî ya bilind ku dê çavdêriya destûriya zagonan bike, ji bo zagonên ku ji hêla saziyên navendî û herêmî ve hatin amadekirin.

Tevî ku ev proje bi dirêjî li ser têkiliyên navbera desthilata navendî û desthilata herêmî ya kurd radiweste, kêmaniya wê ya bingehîn jî ew e ku pirsa têkiliyên navbera desthilata navendî û herêma ereb nake, an jî ku jihevdernexistina desthilata navendî û desthilata heremî ya ereb weke rewşeke heyî qebûl bike. Projeya kurd birêkxistineke zagonî û hikumetî ji bo herêma kurd destnîşan dike ku ew bi tenê di çarçoveya dewleteke federal de dikare pêk were.

Projeya Baasê bi qasî projeya kurd bi hûrgilî ye, lê belê pirr bi paş de

dimîne. Bêyî ku em li ser xalên teknîkî rawestin, em dikarin bale bikişînin ser van mijaran:

● Ji bo Baasiyan, serokkomarê Iraqê serokê desteya birêveber a kurd ji nav endamên vê desteyê hildibijêre ku ev jî nûnêriya wî bi giranî kêm dike;

● Bi tenê deh heb birêveberiyên hêrêmî hene, û peyva "wezîr" nayê bikaranîn: nivîsînerên metna baasî peyva erebî "amîn" bi kar tînin ku ev jî tê wateya "sekreter", û di têbiniyekê de diyar dikin ku "navê *Amin el Am* jî dê bikare ji bo wî were gotin" ku wateya wê sekreterê giştî ye; bi vî awayî, xweseriya herêmê li hemberî desthilata navendî tê bisînorkirin û weke din, "desthilata navendî berpirsê tenê yê tedbîrkirinê ye";

● Lê belê, berî her tiştî, projeya Baasê di pêşgotina xwe de aşkere dike ku paytexta herêma xweser dê Silêmanî (an, li gorî têbiniyekê, Hewlêr an Dihok) be ku ev jî Kerkukê red dike û ji bo Kurdan weke îlana şerrî tê hesibandin.

"Dê paytexta me dewlemend be..."

General Barzanî heftê salî ye lê belê nîşanên umrê mezin li cem wî tune ne, belkî ji bilî qelewiyeke sivik û nebûna çalakiya efsanewî ya Kurdan; lê belê awirên wî xurt, jîr û jêhatî maye. Di hevdîtineke ji sê seet û nîvan dirêjtir de, ew ê nîşan bide ku wî dersa têkçûna komara Mehabadê ya bîst û pênc sal berê ji bîr nekiriye: wî di çileya pêşîna 1946'ê de gotibû "Artêşa îranî zora kurdan nebir, lê belê DYA û Brîtanyaya Mezin zora Yekîtiya Sovyetan biriye".

Îroj, di demeke girîng de ji bo Kurdan, general Barzanî yê ku duwanzdeh salan li Yekîtiya Sowyetan maye baş dizane ka qedera Kurdistanê çiqas bi hêzên mezin ve girêdayî ye - û çiqas ev hêzên mezin bala xwe nadinê. Qehra wî pirr e. Hevdîtinê ji xwe pirr baş dest pê nekiribû: "Dê paytexta Kurdistana xweser li ku derê be?" General Barzanî di destpêkê de naxwaze bibersivîne: Dibêje" Dê gelê kurd biryar bide".

● Weke din?

Barzanî bi bîr dixe:

● Bajarên kurd di destên me de nînin, ji ber wê ye ku em ji bo paytextê li ser filan û bêvan bajarî biryar didin, ev tê vê wateyê ku em piştgiriya têkoşîna çekdarî dikin. Ji bo nuha, em piştgiriya vê nakin, ji ber vê yekê ez nikarim tiştekî ji we re bibêjim!"

Seetek bi şûn de, me li ser mijareke din guftûgo dikir û general Barzanî ji nişka ve ji me re got:
"Guh bidine min, we ji min pirsî ka dê paytexta Kurdistana xweser li ku be? Ez ê sala bê, dema ku hûn vegeriyan, ji we re bibêjim... Lê belê nuha ez dikarim ji we re bibêjim ku ew ê pirr, pirr dewlemend be..."

Ew ji xwe qala Kerkukê dike, Kerkuka ku Baasî naxwazin bidin Kurdan. Bertekeke weha ku şexsiyeta Barzanî baş zelal dike, pirsa Kurdistanê puxte dike : di dirêjiya vê hevdîtinê de, dê mijara rastî ne xweserî, lê serxwebûna Kurdistanê be, lê belê general Barzanî dê înkar bike ku wî qala serxwebûna Kurdistanê kiriye. Ew ê çawa înkar neke, ji ber ku bilêvkirina paytexta wî welatî dikare bibe sedema şerrekî mezin.

Ji çend mehan ve ye ku serxwebûna Kurdistanê li holê ye. Iraqiyan pêşî bi awayekî resmî behsa wê kir, dema ku wan general Barzanî bi armanca cudaxwaziyê mehkûm kir. Ji bihara 1973'ê ve, dîplomatên Bexdayê miraq dikin ka gelo Kurd boçûnên xwe dijwartir nakin û bi alîkariya neçalak a Îranê û bi mebesta serxwebûnê, biryara ji nû ve destpêkirina têkoşînê nadin. Ji xwe peyveke nîşanî ji bo navlêkirina vê dewleta nû hat çêkirin: Kurdadeş.

Lê belê, berî nuha, Kurdan tu carî li cem biyaniyan qala serxwebûnê nedikir. Ev serdem nuha xilas bûye. Gotara kurdî jîr e: di hevdîtineke dirêj de, Hebîb Kerîm, sekretêrê giştî yê PDKI'yê (Partiya Demokrat a Kurdistana Iraqê) ku yek ji hevkarên herî nêzîk ên general Barzanî ye, bal kişand ser ku "serxwebûn encama asa ya dîroka hemû gelan e."

Hebîb Kerîm bi dirêjî li ser mesela FLN'a Cezaîrê rawestiya (3): "Tevgerên welatparêz bi pêş ve dikevin. Binihêrin: di destpêkê de, Cezaîriyan serxwebûn nedixwest, lê bi tenê dixwestin û mafên siyasî yên rasteqîn dixwastin. Di dema têkoşînê de, FLN'ê li daxwazên xwe zêde kir û di dawiyê de serxwebûn xwast.
Em Kurd, me di destpêkê de çi dixwast? Mafê axavtin û perwerdeya bi zimanê xwe û rêzgirtina ji kesayetiya me re. Ev daxwazên me red kirin, lewre me xweserî xwast û me ji bo wê şerr jî kir. Nuha, li hemberî bêhedaniya Baasê, li hemberî bûyerên weke komploya Nazîm Kazzar, em mecbûr in ku pêkaniyên parastina mafên xwe di çarçoveya vê xweseriyê de misoger bikin, û xwastekên me jî ji ber vê yekê ne. Heger vê daxwazê jî red bikin û şerrekî nû çêbibe, dibe ku em serxwebûnê jî bikin armanca xwe."

Sekretêrê giştî yê PDKI dibêje ku "ev jî rêya asa ye, ne weha, ji bo hemû gelan, beriya ku bi zûka bidome, divê haya me jê hebe ku redkirinên dubare yên rejîmên ereb, yên ku bi dorê li Bexdayê hatin desthilatdariyê, em birine noqteya xurtkirina daxwazên xwe."

Weha xuya ye ku Hebîb Kerîm û rayedarên kurd ên din vê îddiyayê bi dilpakî diparêzin: heger wî xwestibûya, general Barzanî dê karîbûya serxwebûna Kurdistanê di sala 1963'ê de îlan bikiraya, yanî di demeke weha de ku Sovyet û Rojavayî jî li dijî hikumeta Bexdayê bûn.

Meseleya serxwebûna Kurdistanê - Kurdistaneke mezin ku dê parçeyên Îran, Iraq, Tirkiye û Suriyeyê di xwe de vehewîne - bê guman ji bo Kurdan jî zehmet e. Ev noqte jî bi rehetî destûrê dide mirov ku şikê bixe ser pêbaweriya Kurdan: gelo xweseriya Kurdistana Iraqê bi xwe armanc e, weke ji hêla rayedarên kurd ên Iraqê ve tê gotin, an jî bi tenê hedefeke taktîkî ye, trampleneke ji bo ji nû ve destpêkirina tevahiya meseleya kurd?

Îbrahîm Ehmed ku êdî xwediyê tu şûna rasterast a di karên kurd de nîne, lê belê wan baş nas dike, ji ber ku sekreterê giştî yê partiyê bû, berî ku bireve Îranê û bi Baasê re li dijî Barzanî têbikoşe, weha diaxive: "Em û cudaxwaz? Şaş e. Divê mirov rastbîn be. Ka bifikirin, heger Kurdistana Iraqê bibe heyîniyeke serbixwe û heger me nefta Kerkukê jî hebe, em ê çi bikin? Hûn ji xwe pirsgirêkên Iraqiyan a digel Sûriyeyê ya ji bo rêya boriyê dibînin! Îcar bifikirin, dê rewşa Kurdistaneke iraqî ya serbixwe, dorpêçî welatên ereb ên dijber, çawa be? Dilopeke nefta Kerkukê jî dê ber bi bakûr an başûrî ve neherike."

Îbrahîm Ehmed weha didome: "Lê belê, me her demî got ku xweserî gavek e. Kî dizane ka dê pisgirêka kurd li Kurdistana Îranê û Kurdistana Tirkiyê, deh an bîst sal bi şûn de çawa pêş bikeve? Wê çaxê, em dikarin pêkanîna Kurdistaneke mezin û serbixwe ku dê bi cîranên xwe re xwediyê têkiliyên baş bibe, bihesibînin."

Ev nihêrînên rewşenbîrekî ne ku êdî nikare li ser bûyeran bi bandor bibe, lê belê meseleya general Barzanî ne weha ye. Ev çil salî ye ku ew ji bo mafên gelê kurd şerr dike, û ew dixwaze di demeke nêzîk de tiştekî berbiçav bi dest bixe. Ji bo wî, gihandina nefta Kurdistaneke iraqî ya serbixwe kêşe nîne: mirov dikare bi rehetî xwe ji "dubendiya sexte ya dorpêçî" xilas bike, bi çêkirina rêyeke boriyê ya ku dê ji Kerkuk heta Kendavê bi rêya Îranê ve biçûya.

Îran ji xwe navenda pirsgirêka kurd e. Ev jî meseleyeke weha ye ku li cem Kurdan pirr nayê nîqaşkirin: general Barzanî li ser têkiliyên xwe yên digel Îranê tiştekî nabêje. Em berteka wî baş fahm dikin: Îran nuha pencereya tenê ya Kurdistana Iraqê ji bo dunyaya derve ye, bi tenê ev welat heye ku alîkariyeke rasteqîn bidiyê. Yek ji Kurdên ku herî baş general Barzanî nas dikin, têkiliyên şahê Îranê û Barzanî weha şayes dike: "Tu kes nikare ji Barzanî re bibêje: 'weha bikin, wisa bikin'. Lê belê, gava ku general Barzanî dibîne ku ew dikare ji bo berjewendiyên gelê kurd rewşeke heyî bi kar bîne, ew ê bi Şeytên re jî hevkariyê bike!"

Lîstika ku di navbera şahê Îranê, Iraq û Barzanî de tê leyistin pirr nepak û aloz e, ji ber ku lîstikvanên wê bi tenê Îran û Iraq nînin lê belê, bi rêya Kurdan, ew Tirkiye, Suriye, Yekîtiya Sovyetan... û hêzên mezin ên dîtir in.

Barzanî û şah ji zû de ye hevdu dinasin, ji zivistana 1946-1947'ê de, dema ku, piştî têkçûyina Komara Mehabadê, general Barzanî ji bo mehekê li "koma efserên artêşa îranî" ya Tehranê ma, da ku bi Brîtanî û Îraniyan re qedera aşîreta xwe muzakere bike, aşîreta ku Îraniyan xwast, ji bo ku xwe heta û hetayê jê xilas bikin, bişînin çiyayên Alwandê, herêmeke ku dûrî her tiştî û bi taybetî jî dûrî Iraqê ye.

Tê gotin ku ji wê demê ve, Barzanî li ser baweriyên şahî xwediyê tu xeyalan nîne, çi li ser mafên kêmneteweyan, çi li ser mafên neteweyan, lê belê înkar nabe ku di şerrê sar de yê ku Îran û Iraqê dijberî hev dike, Barzanî ji bo Îranê alaveke pirr hêja bû: topavêjên artêşa iraqî ji bo Abadanê, mezintirîn sefîngeha Iraqê, metirsiyeke rasterast in, lê belê Kurd di her kêlîkê de dikarin Kerkukê bixin xetereyê, û destpêkirina pevçûnan ya li bakur dê, careke din, hikumeta Bexdayê bixe nav zehmetiyan.

Ji ber vê yekê, ji salên 1966-1967'ê û bi vir ve, Îranê bê navber li alîkariya xwe ya ji bo general Barzanî zêde kiriye. Tê gotin ku paşê dijbertiya xwe ya li hemberî îmzekirina peymana 11'ê adara 1970'ê, Îranê, bi pey dawîbûna şadiya pişt peymanê re, ev alîkarî bi giştî mezin kir. Îranê jî qebûl kir ku di dibistanên xwe yên leşkerî de hejmareke mezin a pêşmergeyan ji bo stajên du salî vehewîne ku pêşmerge jî li wira fêrî bikaranîna çekên ji yên têkoşêran girantir bûne.

Pirsa ku her dihat pirsîn, û nuha hê jî tê pirsîn bi girîngiyeke nedîtî, ev e: şah dê heta çi astê alîkariya general Barzanî bike? Ji bo pirraniya kesan, heta nuha diyar bûye ku qedera Kurdan bala şahî nedikişand, wî bi tenê dixwast ku navendeke bêaramiyê li Iraqê çêbike û bi vî rengî Bexdayê lawaz bike, da ku siyaseta xwe ya berfirehkirinê di Kendavê de bidomîne. Bi kurtasî, şahî nedixwast ku derbasî noqteyeke aşkere bibe, û sedema wê jî ew e ku li aliyê din yê sînor, li Îranê, pênc mîlyon Kurd hene ku dê helbet di îlankirina xweseriyeke rasteqîn a li Kurdistana Iraqê de, îşareta serhildaneke giştî bibînin.

Pênc mîlyon Kurdên Îranê ku hikumeta Bexdayê ji wan re bi awayekî dibe alîkar, bi rêya gihandina çek û pereyan, ji bo derxistina pevçûnan a li Îranê û lawazkirina rejîmeke ku Bexda dixwaze têk bibe. Lê belê hikumeta Bexdayê jî ku ji xwe bi tenê kêşeyên wê bi Kurdên "xwe" re hene, bi tenê heta noqteyekê diyar e ku alîkariya Kurdên Îranê dike: ew bi taybetî naxwaze ku ew xweseriya Kurdistana Îranê îlan bikin, ji ber ku ew dê yekser îlana serxwebûna Kurdistana Îran û Iraqê bi xwe re bîne.

Mijareke din tê vê tevliheviya ku qet nebe sîmetrîk bû, hîn dijwartir dike: ev jî Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê ye. Mîrasgirê partiya ku Komara Mehabadê damezrandibû û, ji destpêka salên 60'î ve, di bin tesîra Barzanî de mayî, wê van salên dawî çalakiyên xwe ji ber sedemeke berbiçav li sînor kiribû : şahî bi şertê aramiya li Kurdistana Îranê alîkariya Barzanî dikir. Lê belê rayedarên nû ku di sala 1971'ê de hatin hilbijartin, serxwebûna xwe ya ji Barzanî da zanîn û nuha, di kongreyekê de ku ji 22'ê heta 26'a îlona bihurî civiya, biryara têkoşîna çekdarî ya li Kurdistana Îranê da. Ew nayê vê wateyê ku dê têkoşîna çekdarî tavilê dest pê bike, lê belê îhtimal e ku rewş zû bi zû ji destê Barzanî, Iraqî û Îraniyan derkeve!

Belki ji lewre jî, dema ku ji wan tê pirsîn ka şah dikare çiqas alîkariya Barzanî bike, hin kes, van demên dawî, dibêjin "pirr". Ew ji xwe difikirin ku belkî şah dixwaze alîkariya avabûna Kurdistaneke mezin bike, ya ku dê, qet nebe di destpêkê de, Kurdistana Îran û Iraqê di nava xwe de vehewîne û ku ew ê patron û parêzvanê wê be. Haydarê herifîna rewşa li Kurdistana Îranê û helwesta Barzanî ya li hemberî Bexdayê, ew ê baştir bibîne ku alîkarê avabûna "Kurdadeşekê" be ku ew hêvî dike ew ê digel wê heman têkiliyên weke navbera Hindustan û Bangladeşê deyne.

Barzanî işaretan dişîne ji Ewropayê re

Gelo ev bi tenê texmîn in? Diyar nîne: belkî siyaseta nû ya şahî sedema "serhişkî" û "xwastekên" Barzanî yên demên dawî ye jî. Ji ber ku em dikarin jê bawer bin ku ew ê nehêle ku şah bi ser wî bikeve û pêşengiya tevgera ku wî bi salan bi rê ve biriye jê bistîne.

Bes ji bo vê yekê, Barzanî li piştgirên din digere. Piştgiriya Yekîtiya Sovyet nuha jê re nayê. Piştî ku wê ji 1962'ê heta 1967'ê alîkariya maddî bi Barzanî kir - çek bi rêya Suriyeyê dihatin - Yekîtiya Sovyetê, bi pey şerrê şeş rojan a 1967'ê re, li Rojhilata Navîn tercîha aliyê ereb kir. Kurd mirûzê xwe dikin, lê rastbîn dimînin: sînorên Yekîtiya Sovyet ewqasî nêzîk in ku ew nikarin dijsovyetiyê bikin, weke din ew di wê baweriyê de ne ku têkiliyên di navbera Moskowa û Bexdayê de bi tenê hevpariyeke demkî ya berjewendiyan didin xuyanî, girêdaneke bêyî bingehên îdeolojîk ku pêşketinên li Rojhilata Navîn dikarin bixe nav xetereyê û dîsa nêzîkbûneke Rûsî û Kurdan bi xwe re pêk bînin.

Heta wê demê, pevçûnên di navbera Kurd û komunîstan de zêde dibin. Barzanî jî bi tundî diaxive: "Her kes berjewendiyên xwe diparêze. Aşkere ye ku berjewendiyên Rûsan di herêmê de hene: anuha, ew hema Iraqê bi rê ve dibin. Dema ku tên vir (du dîplomatên rûsî di nîvê meha çiriya pêşîn de ji bo dîtina general Barzanî çûne Hecî Umranê), weha ji min re dibêjin: divê hûn alîkariya Baasî û komunîstan bikin. Wê çaxê, heger komunîst û Rûs li dijî me bin, em ê jî li cîhekî din, ji xwe re li hevalên nû bigerrin."

Di vî warî de, general Barzanî rêbazên îdeolojîk naşopîne: Hejar, yek ji du helbestvanên kurd ên hemdem ên mezin, helwesta Barzanî weha şîrove dike: "Gelê kurd weke derwêşan e. Dizîvire, li dora xwe dizîvire, û li yekî digere ku dê wî bibe bihuştê."

Bi zimanekî din, nayê înkarkirin ku general Barzanî anuha siyaseteke vekirina "li her aliyê" li ser welatên rojavayî dimeşîne. Hevdîtina wî ya digel nûçegihanê rojnameya amerîkî *Washington Post* ya bihara 1973'ê pirr deng veda û ev siyaseta nû da destpêkirin. Dema ku general Barzanî li rastî pirsên li ser vê hevdîtinê tê, ew bêhntengiya xwe venaşêre: "Gotinên min, an jî xwedêgiravî gotinên min, gellekî hatin nîqaşkirin. Bûye sedema bablîsokekê, lê belê êrîşên ku Iraqî bi ser me de tînin ewqasî deng venadin."

General Barzanî işaretê dide Ewropayê. Peyama wî kifş e: "Em reben in, pirr reben in, rast e... anuha! Bes axa Kurdan dewlemend e, bi neftê dewlemend e. Ev axa me ye, û em ê êrîşî kesî nekin dema ku em milkê xwe bi dest bixin, ji ber ku milkê me ye!" Ew weha dewam dike: "Nefta me dê biçe ji alîkarên me yên nuha re."

* Rojnamevan, pisporê pirsgirêka kurdî.

1 Bnr. Jean-Pierre Viennot: "Le Kurdistan, nation déchirée" ("Kurdistan, milletekî parçekirî"), di *Le Monde diplomatique*'ê de, tebaxa 1973'ê û herweha di *Le Monde diplomatique kurdî* de, çiriya pêşîna 2010'an

2 Têbiniya wergêr: Nazîm Kazar, kevneserokê şîî yê Dezgeha Asayîşa Hindûrîn ya Iraqê bû, û di sala 1973'ê de bi biryara dadgehê bi mirinê hat mehkûmkirin

3 Têbiniya wergêr: F.L.N. tê wateya *Front de Libération Nationale* (Eniya Rizgariya Neteweyî) û di şerrê Cezaîrê de (1954-1962) li dijî artêşa fransî şerr kir

Wergera ji fransî: Simko Destan

Têkçûyina dîplomasiya Qahîreyê

Misir bi ku de çû?

SOPHIE POMMIER *

Ji ber ku weke hilbijartinên bihurî, ew ê bi neduristiyên pirrhejmar û vehilbijartina pirraniya berfireh a Partiya neteweyî ya demokratîk (PND) ya serokkomarê Husnî Mubarek bi encam bibin, hilbijartinên giştî yên misirî ku dê payîza 2010'ê pêk bên, dê rewatiya desthilatê xurt nekin. Ji bo vê yekê, Mubarek dixwaze şûna Qahîreyê ya li ser dika navneteweyî vegerîne asta wê ya bilind.

Îlona 2010'ê ye. Di siberoja lutkeya Şarm el-Şêx'ê de ku bûbû qonaxa duyemîn a ji nû ve destpêkirina muzakereyên rasterast ên îsraîlî-filistînî, rojnameya rojane ya misirî *Al-Ahram* ku alîgira desthilatê ye, wêneyekî weha diweşîne: serokkomarê misirî Husnî Mubarek li pêş dimeşe, û Barack Obama, rayedarê filistînî Mahmûd Abbas, serokwezîrê îsraîlî Benyamîn Netanyahu û keyê Urdunê Abdullah jî li pey wî dimeşin. Çend seet bi şûn ve, hin bikarhênerên înternetê diyar dikin ku ev wêne hatine rutûşkirin. Di wêneyê eslî de, serokê misirî, weke hevpîşeyê xwe yê urdunî, li kêlekê disekine, li paş rayedarên îsraîlî û filistînî ku ew bi xwe jî didin pey serokkomarê amerîkî.

Dibe ku xelk bi vê bûyerê bikenin; lê belê, ew rastiyekê jî derdixîne holê. Qahîre dixwaze di dika herêmî de xwe weke lîstikvanekî bingehîn bide xuyanî, da ku rewatiya rejîmê xurt bibe. Ji ber ku, her çiqas mîratê serokkomarê Gamal Abdel Nasser (1952-1970) di pirr waran de hatibe rûreşkirin jî - bi taybetî di derbarê aboriyê de, lewre Misirê, ji salên 1970'î ve, dev ji sosyalîzma ereb berdaye û rêyeke lîberal ji xwe re daniye - baweriya Qahîreyê ya bi girîngiya dîplomatîk a Misirê hê jî berdewam e.

Dîplomasiya misirî pirr çalak, pîşedar û navdar e û çend navên payebilind ku di rêxistinên navneteweyî de cîh digrin, hê jî hêjayiya wê nîşan didin. Misirê sekreterekî giştî da Rêxistina Neteweyên Yekbûyî (RNY), Boutros Boutros-Ghali (1992-1996) ku bi pey re Rêxistina Navneteweyî ya Welatên Fransîaxêv jî bi rê ve bir (1998-2002). Ji 2001'ê ve ye ku Amr Moussa, yê pirr tê hezkirin, serokê Yekîtiya Ereb e, û wezîrê veberanînê yê nuha, Mahmûd Mohyeddîn, weke birevebirê giştî yê Banqeya Cîhanî hat wezîfedarkirin. Digel vê jî, asta Qahîreyê ya li ser dika navneteweyî û herêmî, van salên dawîn ne weke berê ye.

Taybetmendiya Misirê ew e ku him welatê pêşî ye ku peymaneke aştiyê bi Îsraîlê re îmze kiriye (1979), û him navenda neteweperestiya ereb e - û ji ber vê jî, şikên piştguhkirina berjewendiyên filistînî li ser wê tune ne. Lewre jî Misir weke hêsankera pêvajoya aştiyê tê hesibandin û wê çend dewreyên muzakereyê li ser axa xwe li dar xistin, her weke îmzekirina beşekî peymanên ku weke "peymanên Osloyê" tên nasîn. Lê belê, rawestîna muzakereyan û pêşketina rewşa li ser qadê, firehiya rola wê kêm kir. Ev şerr, ji dema rawestandina teqîna bombeyan a li Îsraîlê ve, ket asteke nizm û DYA, digel hevkarên xwe, bala xwe da ser Rojhilatê - Iraq, Îran, Afganistan, heta Pakistan jî - ku şebeke û qabiliyetên beşdarîbûna Qahîreyê li wan deran tengtir in.

Li Filîstînê, şerrê navxweyî jî navberkariya Misirê xira dike, ji ber ku Misir, li hemberî Hamasê û şaxa filistînî ya tevgerra Birayên misilman, bi aşkereyî aliyê Desthilata Filistînî digire, lewre Birayên misilman li Misirê jî, li dijî desthilata serokê Mubarek, hêza muxalîf a sereke ne(1). Birêveberiya dijwar a sînorê Xezzayê, rayedaran jî nerehet dike: ew di navbera destbiratiya Filîstîniyan, xwastekên Îsraîliyan û ewlehiya axa misirî de zehmetiyan dikêşin. Raya giştî pêwîstiyên bi vî rengî baş tênagihîje û naxwaze hevkariya dorpêçiya Xezzayê bike.

Ne bi tenê DYA, lê belê Misirî bi xwe jî, li ser behremendiya Qahîreyê bi guman in. Rast e ku "dengê sindoqan" pirr nayê bihîstin: karên nedurist hilbijartinan kirêt dikin û gel beşdarî wan nabe, ew bi tenê ji bo nirxandina hevsengiya hêzan bi kêr tên. Lê belê, di welatekî heyştê mîlyon kesî de, bêyî piştevaniyeke asgarî ya gelî, desthilatdarî jî nikare hebûna xwe berdewam bike. Di rewşa tunebûna azadiyên giştî û qadên siyasî de, serbilindiya neteweyî dikare piştgiriya ji bo desthilatdariyê misoger bike; lê belê cudahiyên nihêrînê yên di navbera elît û xelkê de vê hevbendiyê dixin metirsiyê.

Li ser hikum, bazirganan şûna leşkeran girt û leşkeran jî bi xwe, pirr caran, di xebatên bazirganiyê yên qezencdar de cîhê xwe girt. Ne bi tenê ev birêveberên şîrketê ji têkiliyên digel muxatabên xwe yên israîlî narevin, lê hema bibêje ku ew Îsraîlê weke mînakeke hemdemiyê jî dibînin. Herçî raya giştî ye, ew li parêzvanekî nû yê doza ereb digere û wê di serdema şerrê Lubnanê yê 2006'ê de, piştevaniya Hizbullahê kir(2). Dibe ku ew du şexsiyetên ne-ereb ji – gellekî balkêş e - serokkomarê îranî Mahmûd Ahmadînejad û serokwezîrê tirk Receb Tayip Erdogan, weke baştirîn alahilgirên doza filistînî û berxwedena li dijî Rojavayê ku li jêr emrê Îsraîlê tê hesibandin, binase. Ev paşxan ronahiyê dide ser aloziya îfadeyên dij-şîî yên rayedarên misirî. Di 8'ê nîsana 2006'ê de, serokkomar Mubarek, li ser televizyona bi fînansmana siûdî *el-Arabiya*, digot ku civatên şiî yên di welatên ereb de cîh digirin, dilsozên Tehranê ne ku Tehran wan ji bo berjewendiyên xwe bi kar tîne.

Meseleya yekîtiya ereb ku berê ji hêla Qahîreyê ve dihat parastin, nuha parçe parçe bûye. Bi Sûriyeya hevkara Îranê ya 30 salan re, têkilî xemsar in; digel Riyadê, jê germtir nînin. Qahîre jî ji meylên key Abdullah yên têwerdana muzakereyên pirsgirêka filistînî aciz dibe: di adara 2002'ê de, wî li Beyrûdê projeyeke aştiya giştî pêşkêş kiribû, û pênc sal di pey re, wî Hamas û Feth jî li hev anîbûn (peymanên Mekkeyê). Qahîre jî ji dewleta piçûk Qatarê bêzar e, ji ber ku Qatarê tesîra xwe bi rêya avakirina *el-Cezîreyê* ya di sala 1996'ê de zêde kiriye, û li deverên cîhê, weke Yemen, Sûdan an Lubnanê, navberkariyê dike. Di heyama Nasir de, Misir, bi rêya radyoya *Sewt el-Ereb* (Dengê Ereban) berdevka dunyaya ereb bû, bes nuha, alaveke weha ya agahdaiya pan-ereb di destên wê de tune ye: ji ber ku ew dixwaze bibe navenda siyaseta herêmî, berhemdariya Misirê ya medyayî, li derve nayê firotin.

SERHAD BAPÎR: **Gund** (1993), Grafîka li ser dar, hatiye birengkirin. 19 x 25 cm

Zanîngeha mezin a *el-Ezherê* ku ji bo demeke dirêj navendeke rewşenbîrî û olî bû, ji nêzîkahiya îmamê xwe yê mezin ê digel desthilatdariyê zêde êşiyaye. Şêx Mihemed Tantawî ku bi rasterastî ji hêla serokkomarî ve hatibû tayinkirin û di roja 10'ê adara 2010'ê de wefat kir, gellek caran axavtinên fermî dubare kiribû : weke mînak, wî ji bo hilbijartinan banga raydanê kiribû, an jî çêkirina astengeke madenî ya binerdî ya li sînorê Xezzayê parastibû. Di aliyên xwe yên pirrherêmî de, wezîfeyê rola manewî a vî peywirdarê payebilind kêm kiriye, û melayên din bi rêya teknolojiyên agahiyê reqabeta wî dikir. Ji bo ku li gorî vê meylê tev bigerin û dijberiya bizava tundrew a salafî bikin ku ji xwe li Misirê xwediyê çend kanalên televîzyonê yên cuda ye, di sala 2009'ê de, el-Ezherê jî kanala xwe ya televîzyonê vekir. Ji bilî zimanên eslî yên civatên misilman ên Rojhilata Navîn û Asyayê - ereb, ûrdû û paştû - Ezher TV bi inglîzî û fransî jî bernameyên xwe diweşîne. Weazên televîzyonê dîmeneke îslamê ya tehemul û vekirî pêşkêşî temaşevanan dikin, û îmamê nû, Ehmed el-Teyyibê ku di warê olnasiyê de pirr jêhatî ye, li zanîngeha Sorbonê perwerdeya xwe standiye, fransîaxêv û parêzvanê gotûbêja olên cuda ye jî, nîşana vê stratejiyê ye û îspateke berbiçav e ku Misir dixwaze bibe navenda îslameke aqilmend. Ev mentiqa hêzdariyê, perwerdeya îmamên biyanî jî di nava xwe de vedihewîne, û ev perwerde yan li zanîngehê bi xwe pêk tê, yan jî ji hêla îmamên ezherî ve, di heyştê welatên cuda de tê dayîn. Welatên rojavayî yên weke Fransayê ji bo wê dilxwaz in û piştgiriyê didin danûstendinên digel saziya misirî ya payebilind, ji ber ku civateke misilman a pirrhejmar li ser axa wan dijî û ew li awayî dixwazin pêşketina îslama tundrew rawestînin. Lê belê, ji bo ku xatirê xwe bilind bike, divê el-Ezher ray û boçûna xwe ku hê jî pirr misirparêz e, veguherîne û qabiliyetên xebatkarên xwe - yên zimanî di serî de – bi pêş ve bixe, û bikeve nava hemdemiya medyayî ku ew aletên wê hîn pirr baş bi kar nayne.

Misir di baxçeya xwe ya afrîkî de bi paş ve dikeve

Weke rêgez û ji bo zêdekirina xuyaniya xwe, Qahîre beşdarî hemû projeyên navneteweyî dibe. Lewre jî, Mubarek ji destpêkê ve, di Yekîtiya ji bo Deryaya spî de ku di tîrmeha 2007'ê de ji hêla serokkomarê fransî Nicolas Sarkozy ve hat avakirin, bi awayekî pirr çalak xebitî ku encamên vê yekê jî anuha diyar nînin... Tevî ku şîrketên wê, ji bilî beşên telefonî û înşaatê, li welatên din pirr bi cîh nebûne, di van salên dawîn de, Misirê pareke mezin a sermayeyên biyanî (stokeke ku di sala 2008'ê de, li 59,9 milyar dolaran tê texmînkirin), û bi taybetî ji Kendavê, bi alî xwe de bir; tê payîn ku ev encamên teşwîqker dê ji qeyrana darayî pirr nekêşin. Stratejiyeke hevkariya bi welatên cuda re bi cîh bûne, û welatên weke Çîn, Hindistan û Rusyayê ku dixwazin dewsên xwe li Rojhilata Navînê xurt bikin, ji vê stratejiyê re bûne alîkar. Têkiliyên digel deverên ku heta nuha kêm zêde bi tenê hatibûn hiştin jî, weke Ewropaya Rojhilat, Asya û Amerîka latînî, pirr zêde bûne.

Lê belê, Qahîre di baxçeya xwe ya afrîkî de bi paş ve dikeve. Piştî piştgiriya xwe ya ji bo yekîtiya Sûdanê, nuha, ji ber referandûma çarenûsê ya çileya paşîna 2011'ê, divê Misir ji bo hatina lîstikvaneke nû, Sûdana Başûr, xwe amade bike. Weke din, pirsgirêka dabeşkirina dewlemendiyên ava Nîlê, di warê têkiliyên digel welatên cîran de mîna jahrekê ye. Di gulana 2010'ê de, Etyopya, Rûwanda, Tanzanya û Ugandayê peymaneke cuda îmze kir ku dabeşkirina avê ya 1959'ê, ya ku ji Misir û Sudanê re pirr baş bû bû, diguherîne û bi vî awayî welatên din derbeke xurt li Misirê da.

Qahîre di dika herêmî de mîna hevkarekî sereke yê Washingtonê dimîne, û ji bilî Îsraîlê, Misir, bi 1,3 milyar dolarên alîkariya leşkerî û salê 250 mîlyon dolarên alîkariya sivîl, herî zêde ji alîkariya amerîkî feydeyê werdigire. Umer Suleymanê serokê îstîxbaratê, ji bo dosyayên girîng ên Iraq û Filîstînê muxatabekî biserûber e, û bi pey kêşeyên heyama George W. Bush re ku him ji ber siyaseta tund a Washingtonê ya li Rojhilata Navîn û him jî ji ber zextên ji bo demokratîkbûnê, qonaxeke dijwar bû, nuha dema rehetbûnê ye. Ji axaftina wî ya 4'ê hezîrana 2009'ê ya li Qahîreyê diyar e ku serok Obama li hemberî welatên misilman xwediyê helwesteke lihevker e, û digel daxwaza îdareya nû ya ku dê rejîma misirî bi xwastekên hikumdariya çê an demokratîkbûnê qels neke, rehetbûna têkiliyan bi xwe re aniye. Li cem serkeftina Hamasê ya di hilbijartinên filistînî yên çileya paşîna 2006'ê de, derketina holê ya Birayên Misilman ya li Misirê ku di hilbijartinên meclîsî yên 2005'ê de xurttir bûn, rayedarên amerîkî ketin nava fikaran... Li hemberî nediyariyên serdema pişt-Mubarek, Dewletên Yekgirtî bi tedbîr dimînin û, bi awayekî vêşartî be jî, xelefê pêşbîn yê serokkomariyê, Gamal Mubarek, napejirînin. Di destpêka îlonê de, ji bo dîsa destpêkirina muzakereyên aştiyê, heyetek bi bavê wî re çûbû Washingtonê, lê tevî ku ew jî di vê heyetê de amade bû, ew hê jî nikare xuyaneke navneteweyî hilbigire. Di destpêka salên 2000'î de, piştî çend serdanên derve, ew ji hêla kesên li dijî peyrewiyeke xanedanî ve bi tundî hatibû rexnekirin.

Lê belê, ev çalakiya dîplomasiyê, ji bo misogerkirina rewatiya rejîmê esas dimîne. Wexta ku ji hêla serokkomar Mubarekê 80 salî ve, ji bo ziyaret û danûstendinên dîplomatîk tê veqetandin, vê jî diyar dike ku xelefê wî dikare vê peywirê bigire ser milen xwe û belkî şûna Misirê ya li ser dika herêmî jî jê re vegerrîne, ew ê ji bo serkeftina guherîna ku hesabê wê tê kirin bibe xwedî roleke girîng.

* Birêvebera dezgeha şêwirmendiyê Meroe û nivîskara *Egypte, l'envers du décor (Misir, pişt perdeyê)*, La Découverte, Parîs, 2008.

1 Husam Tammam, "Révisions douloureuses pour les Frères musulmans d'Egypte" (Ji nû ve nirxandinên bi êş ên ji bo Birayên misilman yên Misirê), *Le Monde diplomatique*, îlona 2005'ê

2 Bnr. Bernard Rougier, "Islamismes sunnites et Hezbollah" (Islamîzma sunnî û Hizbullah), *Le Monde diplomatique*, çileya paşîna 2007'ê

Wergera ji fransî: Simko Destan

HINDISTAN – ÎSRAÎL

Hevkariyeke nedîtî û nixumandî

ISABELLE SAINT-MÉZARD *

Lutkeya Hindistan-Afrîka nîsana sala 2008'ê li New Delhiyê pêk hat. Lutkeyeke din jî di navbera Amerîkaya latin û cîhana erebî, adara 2009'an li Dohayê (Qatar) çêbû. Lutkeya sêyem di navbera Amerîkaya latin û Afrîkayê de li girava Margarîtayê (Venezuela), îlona 2009'an hat lidarxistin. Gelo kesî behsa van civînan bihîst? Çîn êdî di kirrîna petrola suûdî de, di pêşiya Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê de, bikirê yekem e. Hevkariyeke aborî û polîtîk di nava Hindistan, Afrîkaya Başûr û Brezîlyayê de heye. Gelo kê behsa wê bihîstiye?

Bê guman, DYA û Yekîtiya Ewropayê di cîhanê de aktorên sereke ne, lê êdî hin welat hene ku bi daxwazine weha li pêşiya wan in ku heta nuha nedîtî bûn û xurttir bûne. Rêyên nû vedibin, hevkariyên nû ava dibin, peywendiyên nû çêdibin ku êdî tu hikumê îdeolojiya sosyalîst an jî welatên cîhana sêyem li ser wan nîne, lê belê divê bi çavekî weha werin nirxandin ku ji xwendinên berê yên dema şerrê sar rizgar bûbin. Analîza têkîliyên nedîtî yên di navbera Hindistan û Îsraîlê de ku di vê nivîsê de hene, balê dikişînin ser vê hevkariya ku heta nuha zêde nedihat naskirin.

Hindistan û Îsraîl di navbera salekê de, yanî di 1947 û 1948'ê de, li ser bermayiyên Împeretoriya brîtanî û bi encama pêvajoyeke cudakirinê ya aloz, ava bûn. Her du jî di şerrên dijwar de ku sedema pevçûnên çekdarî yên dubare ne, asê man. Lê belê, ev aliyên hevpar ji bo pêywendiyên dostanî yên taybet yên di navbera van her du welatan de nebûn alîkar, heta berevajî vê yekê ye jî.

Ji salên 1920'î ve, serokên tevgera neteweparêz a hindistanî li dijî Împeretoriya brîtanî bi Erebên Filîstînê re hevkariyek danî û li hemberî viyana siyonîst ya damezrandina dewleteke cihû derketin. Hindistanê, di 29'ê çiriya paşîna 1947'ê de li Meclîsa giştî ya Neteweyên Yekbûyî li dijî plana avakirina Filîstînê raya xwe da, û bi tenê di sala 1950'î de Îsraîl nas kiriye. Heta salên 1980'ê, wê bi welatên ereb re hevbendî kir, di nava Neteweyên Yekbûyî de, bi navê Tevgera welatên derve, û wan mafê Filîstîniyan a dewleteke serbixwe parast.

Sêgoşeya stratejîk bi Dewletên Yekgirtî re

Di bijartina vê dêlivê de ramanên vêşartî jî hebûn. Hindistan, ji ber xetta pêkaniya cîhana misilman, daxwazên pakistanî yên li ser Kaşmîrê re miraq dikirin, û sedemên din jî rol leyistin, bi taybetî di warê ewlehiya enerjiyê de: ji bo peydakirina neftê, New Delhî bi giranî muxtacî welatên Rojhilata Navîn bû. Weke din, Hindistanê dixwast, bi alîkariya pereyê hemwelatiyên xwe yên di welatên Kendavê de, nehevsengiya xirab a hevkêşeya mesrefên xwe di dawiya salên 1980'î û destpêka salên 1990'î de kêm bike (1).

Lê belê, bi derbasbûna salan re, Hindistan û Îsraîl nêzîkî hev bûn. Ji salên 1960'î ve, her du welatan têkiliyên vêşartî di warê leşkerî û istixbaratî de danîn. Îsraîlê jî, li hemberî Çînê (di sala 1962'ê de), û li dijî Pakistanê (di salên 1965 û 1971'ê de) alîkariya artêşa hindistanî kir. Heta wezîrê parastinê Moşe Dayan jî, di sala 1978'ê de bi dizî ziyareta birêveberiya hindistanî kir, bi armanca nîqaşkirina hevkariyeke siberojê. Di dawiyê de, New Delhiyê di sala 1992'ê de têkiliyên dîplomasiyê yên resmî bi Tel Avîvê re danîn. Di paşxana navneteweyî de jî, dawiya şerrê sar û perspektîfên aştiyê, yên ku ji konferansa Madrîdê ya li ser Rojhilata Navîn ya çiriya pêşîna 1991'ê derketin, girtina vê biryarê hêsan kir. Lê belê şikestina hêviyan a ji ber lawaziya encamên siyaseta Hindistanê jî ev biryar bi xwe re anî: Hindistanê ji xwe tu carî nekarî bandora Pakistanê ya li ser welatên ereb tune bike, lê belê hîn jê xirabtir, Rêxistina Konferansa Misilman (RKM) gellek caran pêşniyaznameyên weha pejirandin ku helwêsta Hindistanê ya li ser Kaşmîrê şermezar dikir. Tevî ku Partiya Kongreyê (çepa naverast) pêşî têkiliyên dîplomasiyê bi Îsraîlê re danîbû, hevkariya her du welatan di dema desthilata partiya tundrew a Hindûyan, *Bharatiya Janata Party* (BJP) de (1998-2004) bi watedarî dest pê kir. BJP'ya ku bi şikdarî û heta bi dijberî li dunyaya misilman dinihêrî, dudilî nekir û piştevaniya xwe ya ji bo Tel Avîvê aşkere kir. Ev jî rast e ku di warê siyaseta hindurîn de, ne weke Partiya Kongreyê, BJP'yê tu carî fikrên kêmmilleta misilman a hindistanî li ber çavan negirt. Paşxana pişt-11'ê îlonê ev girêdana nû xurt kir jî, ji ber ku hikumeta hevpeymanê ya BJP'yê boçûna eniyeke demokrasiyên lîberal a li hemberî metirsiya terorîzma misilman hilbijart û pêş de xist. Di kiryareke nîşanî de, hikumeta BJP'yê di meha îlona 2003'ê de serokwezîrê israîlî Ariel Şaron eziband, bi mebesta bibîranîna bûyerên 11'ê îlonê yên li DYA'yê.

Xewna sêgoşeyeke stratejîk a di navbera Îsraîl, Hindistan û Dewletên Yekgirtî de jî, encameke vê têgihîştina siyasî ye (2); ev fikir, cara yekem ji hêla Brajeş Mîşra'yê şêwirmendê neteweyî yê parastinê yê Hindistanê ve, di 8'ê gulana 2003'ê de, li şîva galaya salane ya Desteya Cihûyên Amerîkayê hat pêşkêşkirin:

"Li vira, mijara me ya sereke ew e ku em bi hev re erjengiya terorîzmê bi bîr bînin û hevkariya civakên azad, yên ku li dijî vê tofanê têdikoşin, pîroz bikin. Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê, Hindistan û Îsraîl ji êrîşên terorîst re hemû bûne hedef. Lewre jî, divê ew digel hev li dijî xuyana kabûsî ya terorîzma demên hemdem rawestin (3)*."*

Bi pey re, nûnerên her sê hikumetan hatin cem hev û bi taybetî pirsên parastin û dij-terorîzmê nîqaş kirin, û di heman demê de, li paşxanê, komên bandorker ên hindistanîparêz û israîlîparêz nêzîkahiyeke bingehîn pêk dianî.

Di 2004'ê de, Partiya Kongreyê weke serkêşê hikumeteke hevpeymaniyê vegeriya ser kar û aliyê ideolojiyê kêm kir; lê belê esasiya têkiliya israîlî-hindistanî neguherî, ji ber ku ev têkilî li ser bingehên sereke yên parastin û ewlehiyê hatiye avakirin.

Rast e ku têkîliyên di navbera her du welatan de şiklên cuda wergirtin û di beşên cotkarî, turîzm, zanistî û teknolojiyê de hevkarî çêbûn. Tevî ku bi giranî bi pîşesaziya duriyê ve girêdayî bimînin (di sala 2008'ê de, nêzî % 50 tevahiya îtxal û îxracên di navbera her du welatan de), pevguherînên bazirganî ji asta 1992'ê ya 200 mîlyon dolarî, di 2008'ê de gihîştin 4 mîlyar dolarî (4). Lê belê parastin hê jî xala sereke ya hevkariyê ye.

Saxbûna pîşesaziya çekan a israîlî bi îxracên xwe ve girêdayî ye. Heta dawiya salên 1990'î, wê pirraniya çekên xwe difiroşt Çînê. Lê belê dema ku DYA'yê veguhastina teknolojiyên metirsîdar a ji bo Pekînê red kir, Tel Avîv neçar ma ku li bazarên din, Hindistan jî di nav de, bigere. Ev rêya nû berhemdar bû, ji ber ku di heman demê de, mezinbûna aborî taliyê rê da New Delhî'yê ku ji bo pêwîstiyên xwe yên giran ên di warê parastinê de pereyan qezenc bi dest bixe. Hindistan jî li firoşkarên nû digeriya, ji ber ku sîlehçêkerên rûsî valahiya ku kevnehevkara sovyet hiştibû, bi temamî tijî nedikir (lewre ku piştî 1991'ê, di pîşesaziya çekan a sovyet de, gellek zincîrên berhemdanê hatin xirakirin an jî bi awayekî mayinde rêkûpêkiya xwe wenda kir). Weke din, DYA jî nêzîkî Hindistanê dibû, û vêya jî veguhastinên teknolojiyê hêsan dikirin.

Radarên Phalcon ên israîlî, pergalên radar ên ku ji hêla *Israel Defence Industries* ve ji bo artêşa hewayî ya hindistanî hatin çêkirin (5), mînaka vî tiştî ne. Piştî ku di sala 2000'î de, Washingtonê firotina ji bo Çînê qedexe kiribû, destûr da ku Îsraîl bifiroşe Hindistanê. New Delhî'yê ji vê tecrubeyê encameke diyar derxist: bi riya nêzîkbûna Tel Avîvê re, wê dikarî teknolojiyên herî pêşketî bistîne ku DYA'yê nedixwast bifiroşe.

Di deh salan de, Tel Avîvê di nava firoşkarên çekan yên ji bo Hindistanê de cîhekî mezin girt, û Hindistan jî jê re bûye bazara îxracê ya yekem. Tê texmînkirin ku buhayê peymanên ku di van deh salên dawîn de hatine îmzekirin li derdora deh mîlyar dolaran e (6). Guncawî û qabiliyeta bertekdayînê nirxên sereke yên Îsraîlê bûn. Guncawî, ji ber ku Îsraîlê ji destpêkê ve li gorî taybetmendiyên artêşên hindistanî tev geriya ku pirraniya çekên wê rûsî-sovyetî ne - û peymanên berhemdar ên ji bo hemdemîkirina malzemeyên rûsî hatin îmzekirin: tanq, keştiyên balafiran, helîkopter û balafirên şerrî hemû bi aletên elektronîk ên Îsraîlî teçhîz bûn. Qabiliyeta bertekdayînê jî, bi tedarîkkirina acîl a posatan a ji bo artêşa hindistanî, di dema şerrê digel Pakistanê de li Kaşmîrê, di sala 1999'ê de ku bi navê "qeyrana Kargîlê" (7) tê naskirin.

Hevkariya pîşesazî li ser du beşên girîng pirr sekinî: radarên çavdêriyê û dron li aliyekî, pergalên mîsîlan li aliyê din. Ji bo radar û dronan, peymaneke 1,1 milyar dolarî di sala 2004'ê de, ji bo firotina 3 Phalconan hat îmze kirin.

Herçî mîsîlên Barak in, hevkarî di sala 2001'ê de, bi peymaneke 270 mîlyon dolaran ya ji bo firotina pergaleke parastina dij-keştiyan dest pê kir. Di çileya paşîna 2006'ê de, ew derbasî qonaxeke nû bû û her du welatan biryar da ku bi hev re nifşekî nû ya mîsîlan çêbikin. Dema ku dest bi veguhestinên teknolojiyê kiriye, Îsraîl weke reqîbê Rûsan bi cîh bû ku ew jî digel Hindistaniyan li ser pêşdexistina mîsîlên sefere dixebitin. Taliyê, di sala 2007'ê de, her du dewletan projeya peymaneke bi nirxa 2,5 milyar dolaran îmze kir, ji bo pêşdexistina pergaleke têkoşîna dij-hewayî ku dê li ser bingeha Barakê bê çêkirin, lê belê dê vê gavê ji bo artêşên hewayî û bejayî bê veqetandin.

Wênekêşiya peykî warekî din yê hevkariyê yê girîng e. Di çileya paşîna 2008'ê de, Hindistanê ji bo Îsraîlê peykeke îstixbaratê ya nifşê dawîn avêt fezayê, da ku bikare agahiyên li ser bingehên stratejîk ên îranî bi dest bixe. Di nîsana 2009'ê de, wê ji bo xwe peykeke din avêt ku bi eceleyê kirrîbû, paşê bûyerên Mumbayê ku di çiriya paşîna 2008'ê de bûbûn sedema kuştina 170 kesan û kêmaniyên giran ên di warê çavdêriya axê de derxistibûn holê. Di paşxana "pişt-Mumbayê" de jî, Hindistanê bi 600 mîlyon dolaran radarên israîlî kirrîn, da ku mekanîzmaya şiyarkirinê li dirêjiya qiraxên wê yên rojavayê welêt xurt bike. Îsraîl bê guman xwedan cîhekî bijarte ye ji bo ku alîkariya Hindistanê bike, di hewldanên xwe yên başkirina sazgêriya ewlehîkirina axa xwe de û, bi giştî, ji bo ku digel wê, di warê dij-terorîzmê de, hevkariya heyî ya nêzîk hîn kûrtir bike. Îsraîliyan destek da çêkirina bariyereke di dirêjiya xeta kontrolê ya digel Pakistanê de; wan pergalên çavdêriyê yên cîhê, ji bo rawestandina ketina mîlîtanên îslamperest firot, û berî her tiştî, ne weke pirraniya îstikvanên biyanî man û heta çûn qada şerrê li Kaşmîrê jî.

Anuha, New Delhî, digel tevahiya civata navneteweyî, piştgiriyê dide avakirina dewleteke filîstînî ya serbixwe ya ku dê bikare bidebire. Lê belê, digel qeyranên dubare yên di navbera Îsraîl û ciranên wê de, dîplomasiya wê hînî parastina berjewendiyên xwe jî bûye. Boçûna hindistanî ew e ku têkiliya dualî ji zehmetiyên rewşa Rojhilata Navîn veqetîne, bi gotineke din, ew di serî de hevkariya digel Îsraîlê diparêze lê haydar dimîne ku welatên ereb ji xwe re neke dijmin. Lewre daxuyaniyên resmî yên Hindistanê bi nuans in û bi dorê, weke waneyeke hevkêşeyê, tundrewiya êrîşên terorîstî li dijî Îsraîlê û şîddeta "êrîşên bertek" şermezar dikin. Dîplomasiya hindistanî ji xwe fêrî akrobasiyên dîplomatîk jî bûye, lewre jî di heman dema nêzîkbûna xwe ya digel Îsraîlê de, Hindistanê di destpêka salên 2000'î de têkilî digel Îranê jî danîbûn. Weke mînak, berî ku di îlona 2003'ê de pêşwaziya Arîel Şaron bike, di çileya paşîna heman salê de, Delhiyê pêşwaziya serokkomar Muhammed Xatemî kiribû. Paradoks jî ev e ku nêzîkahiya digel Îsraîlê ji bo siyaseta Hindistanê ya di Rojhilata Navîn de bû destek: ji ber ku piştgiriya wê weke berê misoger nebû, dewletên herêmê ji berjewendiyên wê bêhtir haydar bûn.

Tengezariya New Delhiyê di dema şerrê Lubnanê de

Zêdetir ji ber sedemên hindûrîn e ku têkiliya bi Îsraîlê re dijwar dimîne, lewre divê dilê kêmmilleta misilman (% 14 nifûsê) nayê hiştin. Divê hesabê tevgerên siyasî yên çepgir jî were kirin ku mîrasên adeta dij-emperyalîst in û li hemberî hemû siyasetên pro-israîlî derdikevin. Lewre jî, rayedarên hindistanî zêde dilxwaziya hevkariya Îsraîlê nakin. Ji xwe, ev xet herî zêde di demên qeyranê de New Delhiyê dixe tengezariyê, weke ku şerrê Lubnanê yê 2006'ê nîşan kir ; rayedarên hindistanî di destpêkê de bi dilxwaziyê kiryara israîlî şermezar kiribû, berî ku ji ber zexta partiyên komunîst û dengdêrên misilman, dengê xwe bilindtir bike. Di dawiyê de, meclîseke acizbûyî bi yekdengî, pêşniyaznameyeke şermezariya êrîşê pesend kir.

Em ji dudiliyên Hindistanê yên li ser Rojhilata Navîn fêrî pirr tiştan dibin. Di warê dîplomasiyê de, ji ber dubendiyeke pêşbînî a di navbera piştgirên helwesta adetî, alîgiriya Ereban, û parêzvanên hevkariya digel Îsraîlê de agahiyên xurt derdikevin holê. Lê belê, di kûrahiya xwe de, ew nakokiyeke navxweyî jî didin xuyandin ku ji ber pêwîstiya rehetkirina kêmmilleteke 160 mîlyon kesî - Hindistan di dunyayê de dewletê sêyemîn e ku misilman lê dijîn - û, di heman demê de, heyraniyeke vêşartî ya ji bo rêbazên lezgîn ên Îsraîlê pêk tê. Ji xwe hin kes li Delhiyê amade ne ku heman rêbazan li dijî bizavên terorîstî yên li Pakistanê bicerribînin.

* Pispora pirsgirêkên stratejîk ên li Asyaya Başûr, ew li Enstîtuya Lêkolînên Siyasî ya Parîsê û li INALCO'yê (Enstîtuya Neteweyî ya Ziman û Çandên Rojhilatê) mamoste ye û hevnivîskara pirtûka *Dictionnaire de l'Inde contemporaine* (Ferhenga Hindistana hemdem), di bin birêveberiya Frederic Landy de, Armand Collin, çiriya pêşîna 2010'ê.

1 Hezîrana 1991'ê, ji ber ku nema karîbû teqsîdên deynê xwe bidaya û sedem jî ew bû ku karkerên wê yên welatên Kendavê şandina pereyên xwe rawestandibû, Hindistan mecbûr ma ku bernameyeke berfireh bi Banqeya Cîhanî IMF'yê deyne ku sazûmaniya xwe ya aborî sererast bike.

2 Louise Tillin, "US-Israel-India: Strategic axis?", BBC News, Londres, 9'îlona 2003'ê

3 Ev axavtin li ser malpera AJC'yê jî heye: www.ajc.org

4 çavkanî: beşê "Bilateral Trade Relations" yê malpera balyozxaneya hindistanî ya Tel Avîvê: www.indembassy.co.il

5 Radara yekem bihara 2009'an hate şandin, da ku li ser balafirên Lliochine yên ku Rûsyayê nû kirine were sazkirin. New Delhî xwe amade dike ku di demeke nêz de sê Awacsên nû bi buhayekî baş sîparîş bike

6 Siddharth Srivastava, "Israel rushes to India's defense", *Asia Time Online*, 2'ê nîsana 2009'ê

7 Bixwîne: Ignacio Ramonet, "La menace Pakistan", *Le Monde diplomatique*, çiriya paşîna 1999'ê

Wergera ji fransî: Simko Destan

KRONOLOJIYA HINDISTANÊ

Di destpêka sedsala 20'an de
Netewperestên hindistanî bi Erebên Filîstînê re, li dijî emperyalîzma brîtanî hevkariyê dikin.

Salên 1930'î
Siyonîst nikarin piştigiriya netewperestên hindistanî werbigirin.

15'ê tebaxa 1947'ê
Serxwebûna Hindistanê.

29'ê çiriya paşîna 1947'ê
Hindistan, digel welatên ereb, dijberiya xwe ya li hemberî plana dabeşkirina Filîstînê, ya ku ji hêla Meclîsa giştî ya Neteweyên Yekbûyî (NY) ve hatibû pêşkêşkirin, kifş dike. Heyeta hindistanî avakirina Filîstîneke federal, digel xweseriyeke hindurîn ya ji bo Cihûyan, pêşniyaz kiribû.

14'ê gulana 1948'ê
Daxuyaniya damezrandina dewleta Îsraîlê.

Gulana 1949'ê
Hindistan li dijî ketina Îsraîlê ya NY'yê raya xwe dide.

18'ê îlona 1950'ê
New Delhî bi fermî dewleta Îsraîlê dinase, bêyî ku têkiliyên dîplomasiyê pê re deyne.

Hezîrana 1953'ê
Konsolosxaneya israîlî ya pêşî li Hindistanê vedibe, lê belê li Bombayê ye û ne li New Delhiya paytext.

Hezîrana 1967'ê - çiriya pêşîna 1973'ê
Di her du şerrên israîlî-ereb de, Hindistan alîgira Ereban e.

Çileya paşîna 1975'ê
Hindistan piştgiriyê dide pêşniyaza 3379'ê ya NY'ê ku siyonîzmê weke şikleke nijadperestiyê şermezar dike; ew destûrê dide heyeta Rêxistina rizgariya Filîstînê (RRF) ku dezgehekê li New Delhiye veke û dibe welatê pêşîn yê ne-ereb ku statuyeke dîplomatîk bidiyê.

1988
Naskirina dewleta filîstînî, bi pey îlana serxwebûnê ya Desteya neteweyî ya filîstînî (DNF) re.

16'ê çileya pêşîna 1991'ê
Hindistan ji bo betalkirina pêşniyaza 3379'ê ya NY'ê raya xwe dide.

29'ê çileya paşîna 1992'ê
Serokwezîrê hindistanî Narasimha Rao (Partiya Kongreyê) têkiliyên dîplomasiyê yên di navbera Hindistan û Îsraîlê de dike fermî.

1994
Îsraîl alîkariya xwe ya ji bo serdestiya eniya Kaşmîrê pêşkêşî Hindistanê dike.

1998-2004
Bharatiya Janata Party (BJP, Partiya gelê hindistanî) ya li ser kar, dostaniya xwe ya digel Îsraîlê diyar dike.

1999
Şerrê Kargîlê ya hindî-pakistanî têkiliyên Hindistanê yên digel Îsraîlê xurt dike, ji ber ku Îsraîl çekan pirr dide Hindistanê.

Hezîran û tîrmeha 2000'ê
Lal Krişna Advanî, wezîrê karên navxweyî yê hindistanî û îdeologê tundrew yê bizava neteweperest a hindû, Îsraîlê ziyaret dike. Di meha tebaxê de, Jaswant Singh, wezîrê karên derve, dide ser şopa wî.

8'ê gulana 2003'ê
Di şîva galaya salane ya Desteya Cihûyên Amerîkayê de, Brajesh Mîşra (alîkarê sereke yê serokwezîrê Atal Bihari Vajpayee, endamê BJP'yê) piştgiriyê dide xurtkirina têkiliyên Hindistan û Îsraîlê - û DYA'yê.

Ji 8 heta 11'ê îlona 2003'ê
Bi hatina Ariel Sharon re, cara yekem e ku serokwezîrekî israîlî ziyareteke fermî li Hindistanê dike.

Hevaltiya Îran û Hindistanê ya taybetî

Îran û Hindistan cîranên hev in, û bi saya rêyên ketina Afganistan û Asya Navîn, yên ku di ser Îranê re derbas dibin, Hindistan ji ber Pakistanê asê namîne ; lewre jî, hevkariya Îranê ji Hindistanê re girîng e. Weke din, her du welat jî dijberên desthilata Talîbanan (1996-2001) bûn. Piştî rûxandina wê, New Delhiyê Qabûl teşwîq kir ku bi Îranê re têkiliyan deyne, da ku pêwîstiya Afganistanê ya bi Pakistanê re kêm bike. Hindistan û Îranê di başûrê Afganistanê de bi hev re rêyeke weha çêkir ku heta sînorê îranî (di navbera Zerenc û Delaramê de) diçe, û di heman demê de, bi mebesta ji nû ve avakirina rêhesineke di navbera vê keştîgehê û tora rêyên Afganistanê de, wan li aliyê Îranê keştîgeha Şabaharê, ya ku li ber deryaya Ummanê cîh digire jî, nû kir. Di dawiyê de, ji bo têrkirina pêwîstiyên xwe yên enerjiyê ku her ku diçe mezin dibin, Hindistan baweriya xwe bi hevkariyeke xurt a digel Îranê tîne (1).

Li ser bingeha van berjewendiyên hevpar, hevkariyeke stratejîk û azwer di navbera salên 2000 û 2005'ê de bi cîh bû ku ne bi tenê enerjî û meseleya afganî, lê belê danûstendinên leşkerî û firotina çekan jî di xwe de vedihewandin.

Lê belê, ev hevkarî ji ber neraziya nukleerî û şikên li ser çalakiyên qaçax ên bernameya îranî asê maye, bi taybetî jî di demeke weha de ku New Delhiyê digel DYA'yê li gora rewşê muzakere dikir û jî dewleteke weha ye ku di rastiyê de xwediyê çeka nukleer e, lê belê peymana dij-nukleerî îmze nekiriye (2). Peymana Waşîngtonê (3) statuya wê ya weke dewleteke berpirs di warê dij-nukleeriyê de piştrast kir, û weke din, Hindistan hê jî li pey kursiyeke herdemî di Desteya ewlehiyê ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî (NY) de ye, lewre jî, ew beşdarî însiyatîvên piralî yên li dijî Komara îslamî bû. Di desteya hikumdarên Dezgeha navneteweyî ya Enerjiya Atomîk (DNEA) de, Hindistanê sê caran li hemberî Îranê raya xwe bi kar anî, û ji 2006'ê ve, wê soz daye ku ew ê sizayên Lijneya ewlekariyê ya NY'ê bi cîh bîne. Sosret nîne ku hevkariya wê ya digel Îranê ji ber vê yekê hinekî tenik bûbe.

Digel vê jî, Hindistan dilxwaziyên xwe yên li ser biryarên mecbûrker venaşêre û çareseriyeke dîplomatîk pêşniyaz dike. Ew bi taybetî ji sizayên lêzêdekirî yên ku ji hêla DYA û YE'yê ve hatin pesindkirin nerazî ye, lewre ku ew xebata şîrketên hindistanî asteng dikin (4). Cîgirê dewletê yê karên derve, Nîrupama Rao, xemgîniya xwe anî ziman û *"bandora rasterast û neyînî ya li ser şîrketên hindistanî û, jê xirabtir, li ser ewlehiya enerjetîk* [a Hindistanê] *û hewldanên* [wê] *yên bersivdana pêwîstiyên pêşketina gelê xwe"* (5) weke karekî nerast nirxand. Lê belê, li derveyî parastina berjewendiyên xwe yên aborî, Hindistan girîngiyê dide du xalan: ew naxwaze ku Çîn têkiliyên berfireh bi Îranê re deyne, û ew herweha naxwaze ku qeyrana îranî hedaniya vê herêma dunyayê xirab bike ku ev hedanî ji xwe, ji ber şerrê Afganistanê û alozbûna rewşa Pakistanê ya navxweyî dijwar bûye.

Ji ber wê ye ku New Delhî ji ber hewldanên amerîkî, yên ku wê teşwîqî siyaseteke tund a li hember Îranê dikin, pirr nerehet e. Waşîngtonê bi bîra wê ve xist ku weke hevkara stratejîk, divê ew dostên xwe baş hilbijêre û ji bo birina zora Komara îslamî çalaktir bixebite. Lê belê, bi saya vê meseleyê jî, Hindistan dixwaze nîşan bide ku ew bê şert û mercan hevkariya DYA'yê nake, û dema ku bawerî pê re çêbibe ku Dewletên Yekgirtî, bi hincêta têkoşîna li dijî terorîzmê, digel Pakistanê zêde li hev dikin, ew dikare bi vî awayî jî boçûna xwe bide famkirin. Ji ber vê yekê, hikumeta Hindistanê pirr baldar e ku têkiliyên payebilind ên digel Îranê biparêze, û serdana serokkomarê îranî Mahmud Ahmadînejad, a di gulana 2008'ê de, û ya wezîrê karên derve Manuşehr Mottakî, a di mijdara 2009'ê de, vê helwestê jî aşkere dikin.

ISABELLE SAINT-MÉZARD

1 Hindistan nuha % 12'yê petrola xwe ya xam ji Îranê dikirre

2 Bixwîne: Christophe Jaffrelot, "Pari américain pour l'Inde", *Le Monde diplomatique*, îlona 2006'ê

3 Peymana ku bi daxuyaniyeke hevbeş ya 18'ê tîrmeha 2005'ê hate aşkerekirin, 10'ê çiriya pêşîna 2008'ê hate îmzekirin

4 Ji bihara 2010'an ve ye ku pênc şîrketên hindistanî di armanca birevebirên amerîkî de ne, lewre ew bi awayekî çalak di nava bazara Îranê ya patrol û gazê de ne. Çavkanî: Cf. Joel Brinkley, "India leads list in ignoring Iran sanctions", *International Herald Tribune*, Paris, 21-22'ê tebaxa 2010'ê

5 çavkanî: Jeremy Kahn, "India's nuclear diplomacy", *Newsweek*, New York, 9'ê tebaxa 2010'ê

Wergera ji fransî: Simko Destan

SERHAD BAPÎR: **Heyv** (2005), Grafîka bi şirêjê ya li ser Lînoleum. 32 x 32 cm

Guman (Dewama rûpela 1.)

dikare bibe sedema karesatên çandî yên mezin ku rêlibergirtina wan gellekî dijwar e û tahrîb û encamên wan jî gellekî giran in.

Kamilî

Ji bo peydabûna wêjeyeke baş, kamilî pêwîst e. Em vê kamiliyê di warê nivîskariyê, di warê zimên û di warê formê de bi kar tînin. Lewre heger ev kamilî nebe, mirov nikare hêviya berhemên xurt bike. Gava ku guman jî weke bingeha têgihiştina me ya hunerî û wêjeyî were fahmkirin, û heger em rewşa Kurdan ya ku me li jorê behs kir jî bi bîr bixin, hingê kamiliya ku em behsa wê dikin jî ancax dikare di warê takekesî de û bi bandoreke xweser ve peyda bibe. Belawelabûyina civaka Kurdan jî, dê tim rêyê li ber bigire ku ew kamilî xwe li nava civakê belav bike û bigihije asta civakî. Hingê, heger weha be, civak dê kesan ava neke, lê belê, kes dê pêşî xwe û bi dû re jî civakan ava bikin, herçend bi niherîneke diyalektîk dijberê vê yekê jî rast be jî.

Civakên rojavayî ku berî sedsala 19'an gihiştin qadeke kamiliyê ya destpêkê, îroj ew kamilî kêm zêde bi awayekî homojen di nava xwe de li civakê belav kiriye. Milletên ku bi dû re be jî gihîştine qiraxên vê kamiliyê, bandora xwe li milletên din jî kiriye, lê belê, berî wê, wan xwe ava kiriye. Ji ber wê ye ku em dikarin behsa binavkirinên mîna "romana rûsî, sînemaya fransî, felsefeya almanî, mîtolojiya yûnanî û mîmariya japonî û hwd" bikin.

Yê Kurdan, netewebûyin hê di qada destpêkê de ye, lewre heta ku mirov nebe serdestê axa xwe, mirov nikare behsa netewebûyinekê bike. Guman di vira de li ser netewebûyinê bi xwe jî heye. Ji ber wê ye ku her milletê ku di vê pêvajoyê re derbas bûye, hewil daye ku dîroka xwe bigihîne heylo dema ku hê fikra millet û neteweyan peyda nebûbûn. Heger di dîrokê de weha be, di warê çandî û wêjeyî de guman zêdetir dibe. Lewre, ji ber kompleksa nebûna netewetiyê, hewildana îspateke bêkêr dê bandora xwe li karên hunerî û wêjeyî jî bike.

Ji ber wê ye ku nivîskarekî kurd ku hê derfetên zimanê xwe nû kişf kiribin, dikare bibêje ku wî bi xwe ev ziman ava kiriye û ji ber wê ye ku siyasetmedarekî kurd ku hê nû di civaka xwe de dibe serdest, dikare bibêje ku wî bi xwe ev millet ava kiriye û ji ber wê ye ku di civakeke weha de her kes dikare yê berî xwe û yê dora xwe tunne bihesibîne. Guman di civakeke weha de berî her tiştî li ser "avakirin"ê, yanî li ser destpêkê ye.

Her millet dixwaze ji xwe re dîrokekê û mîtolojiyekê ava bike ku pirraniya van avakirinan li ser îddiayan in û behsa zayina milletan dikin. Ji ber wê ye ku Kurd carinan zayina xwe digihînin mîtolojiya Newrozê. Lê, heger em bala xwe baş bidinê, di eslê xwe de di vê çîrokê de behsa zayinê bi tenê nabe, lê belê behsa netewebûyinekê dibe. Sedem jî ew e ku "qedereke hevpar" ji wan re bi destê serdestan tê avakirin û ev qeder wan tîne cem hev, dike hêz û bi dû re jî bi awayekî xwezayî dike serdest. Qewm û millet û netewe, ji xwe re tim mîtolojiyan ava dikin, lewra heger ew nebin, dê ji dîroka xwe hez nekin. Ev hezkirin û serbilindiya bi dîroka xwe ve, ji bo parastina siberoja neteweyên herî mezin jî girîng e. Di vê dîrokê de, tim kesayetiyine weha hene ku ramana serdest dixwaze ku mirov ji wan hez bike û xwe bike weke wan. Taybetmendiyên wan kesan yên baş bi pêş ve derdixin û taybetmendiyên wan yên din (yên însanî û xwezayî) didin jibîrkirin. Bi vî awayî robotan ava dikin û li dibistanan jî dîroka van robotan tê xwendin. Ji bo xurtkirina îmaja van kesên robotî jî di gellek waran de çalakiyên yekem li wan bar dikin û behsa xizmeta wan a li doz û çand û rewşenbîrî û dewlemendiya wî milletî tê kirin. Gellek caran dikarin wan kesan weke rewşenbîr, weke fîlozof û vîzyoner nîşan bidin ku mirov tucarî nikaribe xwe bide ber wan û wan weke kesên pîroz bihesibîne. Yanî, milletên bindest ji bo parastina xwe tim pêxemberan ji xwe re ava dikin.

Ji bo parastina van iddiayan jî *perdeya pîroziyê* li ser destpêkê tê vegirtin. Ji bo parastina vê perdeyê jî, gellek berhemên sîmulasyoneke hunerî û wêjeyî dikarin di xizmeta pîrozan de werin avakirin û li nava civakê werin belavkirin. Berhemên ku li pêş vê perdeya pîroziyê ava bûne, bi tenê demkî ne, bi demê re ew ê wenda bibin, lewre nikarin bersiva pirsên "çi, çima, çawa û ji bo kê" bidin. Bersiva wan dê li gora demê û li gora pêvajoyê be û, ev jî diyar dike ku, dê siyasî be. Siyaset bi xwe, li ser fikir û ramanên demkî tê avakirin. Wêje nikare li pêş perdeyê û di bin banê siyasetê de kêmaniyên xwe veşêre.

Destpêka kamiliyê di rakirina vê perdeyê de ye. Lewre di wêjeyê û felsefeyê de cih ji pîroziyan re tunneye.

Beradayî

Jean-Paul Sartre di berhema xwe ya bi navê *Qu'est-ce que la littérature* (Wêje çi ye?) de, sê pirsan dike: "Nivîsandin çi ye? Em ji bo çi dinivîsin? Em ji bo kê dinivîsînin?". Ev pirs dê me bibin armanca nivîsandinê û herweha ew ê wateya karê nivîskariyê jî ji bo me zelaltir bikin. Di rewşa milletê kurd û zimanê wî de, ev pirs ji bo erka wêjeyê girîngtir dibin, lewre wêje divê bi kêrî tiştekî were. Di civaka ku pirsgirêkên wê yên siyasî û civakî û zimanî hebe de, bê guman, dê pirsgirêkên takekesî bi rengekî cuda peyda bibin, û hingê wêje dê di van waran de bi kêr were. Berhema ku ne di warê zimên de û ne jî di warê civakî de bi kêr neyê, ji bo me "beradayî" ye, lewre di rewşa ku Kurd tê de ne de, wêjeya kêfê ancax dikare wêjeyeke laqayt û sivik be.

Weke ku her kes dizane, Ehmedê Xanî ji di destpêka *Mem û Zînê* de, di beşê "sebebê nivîsîna pirtûkê bi zarê kurdî" de, ev pirs bi awayekî gellekî aşkere ji xwe kiribû û bersiveke têra xwe nefspiçûk jî di pey wê re dabû û pejirandibû ku armanca wî ew bû ku li hember Tirk û Ereb û Eceman rûmeta Kurdan biparastaya û ji ber wê, di wê dema ku bi pirranî bi zimanê osmanî û farisî berhem dihatin nivîsandin de, wî ew mesnewiya bêhempa bi kurdî nivîsandibû.

Gelo nivîskarên me yên îroj çi qasî hay ji rastiyên xwe hene? Gelo çiqasî li xwe mikur tên? Di vê rewşa Kurdan de, lixwemikurhatin dîtina rastiyê ye. Ehmedê Xanî di *Mem û Zînê* de, gava ku behsa rewşa Kurdan dike, dibêje ku ew "*filcimle ne cahil û nezan in, emma di yetim û bê mecal in*" û rewşa wan bi bêxwedîtiya wan ve girê dide. Weke ku em ê bi dû re bibînin, dused sal bi şûn de, êdî Kurdine din gihiştin û van Kurdên ku bi çand û perwerdeyeke din rabûbûn bi çavekî din li civaka xwe diniherî. Di serê sedsala 20'an de êdî bi awayekî aşkere di kovara *Rojî Kurd* (1913) de dihat gotin ku "*Kurd nexwende û nezan in*". Di kovara *Hawarê* (1932) de gazin ji "*nezaniyê*" dihat kirin û apolojiya "*xwendin, hînbûn û hînkirinekê*" dihat kirin.

Ma di civakeke weha de ku hê bi hînbûn û hînkirinê ve mijûl e, mirov çawa dikare behsa kamiliyeke rewşenbîrî, wêjeyî û siyasî bike û rabe û hêviya wêjeyeke xurt bike?

Wêje û siyaset

Weke ku di dema *Hawarê* de weha bû, di destpêka wêjeya Kurdên sovyetê de û di wêjeya Kurdên bakurî ya salên 1980'î de jî her eynî reng û eynî deng hebû. Kurd bindest bûn, zimanê wan di derdoreke teng de hatibû asêkirin û ber bi wendabûnê ve diçû. Lê, di rewşeke weha de ziman cudahiya wan ya bingehîn bû û rengê wan yê xweser bû. Ji ber wê ye ku Celadet Bedirxan netewebûyin bi zimanî ve girê dida. Lê belê Celadet Bedirxan ji tevgera Xoybûnê hatibû, Erebê Şemo endamê Partiya Komunîst bû û Kurdên bakurî yên ku li Ewropayê dest bi wêjeyê kirin jî hemû ji tevgerên marksîst dihatin.

Madem zimanê kurdî di perwerdeyê de nayê bikaranîn, madem her Kurdê xwende teqez bi zimanine din jî dizane, û madem nivîskarên kurd xwe bi xwe hînî xwendin û nivîsandinê bûne, hingê tercîha nivîsandina bi zimanê kurdî, di rewşa milletê kurd de ancax dikare bi siyasetê ve were nirxandin. Lewre, gava ku daxwaza nivîskariyê di dilê mirov de hebe û mirov tercîha xwe ya zimanî li ser zimanê kurdî deyne, hingê ew tercîh siyasî ye. Ji ber wê ye ku di bingehên wêjeya kurdî de, weke ku li cem Ehmedê Xanî û sebeba nivîsandina wî ya bi kurmanciyê jî diyar dibû, heger xemeke mirov ya siyasî nebe, mirov nikare di sedsala 20 û 21'ê de bi kurdî binivîsîne, nemaze jî bi kurmancî.

Gava ku em dibêjin wêjeya kurdî siyasî bû, divê mirov destnîşan bike ku ev siyaset li gora dewran diguherî. Di dema Ehmedê Xanî de, nivîsandina bi kurmanciyê nîşana hebûna wan bû û li dijî Tirk û Ereb û Eceman bû, lewre wan henekê xwe bi Kurdan û zimanê wan dikir. Di dema *Hawarê* de, qedexeya tund ya li ser zimanê kurdî nû dest pê kiribû û nemaze Dewleta tirk bi awayekî aşkere bernameya asîmîlekirinê dabû ber xwe ku vê bernameyê ji asîmileya zimanî dest pê dikir û xwe dighand koçberkirina Kurdan û bicîhkirina wan ya di nava Tirkan de. Hingê, armanc jê "tirkkirina" wan bû û bi awayekî diyalektîk, ziman ji xwe ber di destê Celadet Bedirxan de dibû alaya kurdî.

Di dema Erebê Şemo de, kurdî ji bo propagandaya bolşevîzmê bi tenê alavek bû. Ji ber wê ye ku, di *Şivanê Kurmanca* de Erebê ku li gundê xwe şivantî dikir, piştî ku di artêşa rûs de dibe wergêr û li bajêr jî fêrî bolşevîzmê dibe, vedigere gundê Kurdan û li dijî axa û begên kurd propagandayê dike. Divê mirov bi bîr bîne ku heger weha nekiraya pirtûkên wî dê nehatana çapkirin, lewre di dema sovyetê de wêje di bin çavdêriya Partiya Komunîst de dihat çapkirin û mecbûr bû ku bi kêrî pêşketina civakê bihataya, yanî mecbûr bû ku propagandaya îdeolojîk ya lenînîzmê di wêjeyê de bihataya kirin. Yanî "bikêrhatin" di her demê de li gora fikra serdest tê nirxandin. Ji ber wê ye ku di destpêkê de ew roman (Şivanê Kurmanca) bi rûsî nivîsand, lewre ziman wê demê ne girîng bû, lê bi dû re bi kurdî jî nivîsand, lewre xwe dabû qebûlkirin û êdî karîbû bi zimanê xwe binivîsandaya.

Di dema Kurdên bakurî yên piştî 1980'ê de, ne mecbûrî hebû û ne jî zordestî. Lewre wan li Ewropayê dest pê kir. Gava ku ew piştî cûntaya leşkerî ya 1980'ê gihiştin welatên ewropî, hemû hê jî di nava komên xwe yên siyasî de bûn. Herçend li binxetê li şopên pêncî sal berê rast hatin jî, li Swêd û Almanyayê lê hay bûn ku zimanê wan ne qedexe ye û dikarin pê binivîsin. Alîkariyên diravî ku welatên ewropî bi nivîskaran dikir divê di vira de weke alaveke xurt were nirxandin. Lewre li Swêdê pirraniya weşanxane û kovar û pirtûkan bi alîkariya dezgehên hikumetî ve derketine. Cara yekem bû ku wêjeya kurdî di *serbestiyê* de dihat kirin, lê belê dîsa jî, ji ber ku yên ku ew wêje dikir bi xwe siyasî bûn, rengê siyasetê her li ser wêjeyê bû. Ziman û wêje êdî dibûn çalakiyên îdeolojîk.

Di romana Mahmûd Baksî ya bi navê *Gundikê Dono* de behsa gundekî Xerzan dibe, lê belê diyaloga ku Zibeyrê Ehmêyê ku yek ji lehengên romanê ye di dawiya romanê de dike, bi me dide zanîn ku ji bo nivîskêr çîrok bi tena serê xwe ne bes e û mecbûr e ku aşkeretir bike, hingê hemû fikrên ku bi bicihkirina çîroka şerrê li dijî feodalan hatine sazkirin, bi diyalogeke rût û rasterast bi dawî dibe û rengê romanê yê siyasî aşkere dike.

Madem weha ye, gelo çi pêdivî bi romanê hebû?

Bîr

Li gellek deveran, yek ji pirsên ku wêjehez û nemaze romanhezên me ji xwe dikin jî ev e:
"Ji bo çi em jî nikarin romanên weke yên xelkê binivîsînin?"

Ji bo ku mirov bikare bersiva vê pirsê bide, divê mirov berê behs bike bê romanê li cem xelkê çawa dest pê kiriye.

Julia Kristeva di berhema xwe ya bi navê "Le texte du roman" de dibêje ku romana Antoine de Sale ya bi navê "*Le Petit Jehan de Santré*" (1456), yekem romana fransî ye ku bi "pexşanê" hatiye nivîsandin. Berî vê romanê, romanên helbestkî hebûn ku mijarên xwe ji destan û efsaneyên devkî werdigirtin û ew vediguheztin ser nivîsê.

Em werin ser mijara xwe ya romana kurdî(1). Dîroka romana kurdî (kurmancî) ya ku em bi "*Şivanê Kurmanca*"ya (1935) Erebê Şemo didin destpêkirin heta nuha 198 roman dîtine. Weke tê zanîn, heta sala 1980'ê jî, hejmara romanên kurdî12 bû. Romanên kurdî yên yekem ku bêtir di bin bandora "sosyalîzma rûsî" de diman û mijarên wan jî an li ser şoreşgeriyê an jî li ser dîroka kurdan û destanên wan bû û mixabin ji hêlên romanên rûsî yên estetîkî û stîlîstîkî jî têra xwe bêpar bûn. Li welatekî mîna Rûsyayê ku romannivîsên mîna Gogol, Dostoyewskî û Tolstoy nas kirine, romannivîsên kurd yên pêşîn (Erebê Şemo, Eliyê Ebdilrehman, Heciyê Cindî) gellekî dûrî qalibên romana gerdûnî man û romanên xwe bêtir, li gora pêvajoyê, ji bo perwerdekirina civakê ya polîtîk bi kar dianîn û dûrî xemên estetîkî bûn.

Vê yekê heta nuha jî her bi vî awayî xwe di gellek romanên kurdî de diyar kir û romana kurdî jî xwe di warê teknîkên vegotinê de, di nava tevgereke teqlîdkirina romanên ewropî û yên tirkî ya qels de vegevizand û rengekî xwerû ava nekir. Vê yekê kir ku vegotina kurdî ji ruhê xwe yê ku di destan, çîrokên gelêrî û kultura dengbêjiyê de diyar dibe bi dûr bikeve û xwe li ser hîmine dejenerebûyî ava bike. Ji ber vê hindê, heta ku romana kurdî ji teqlîda xwezayî bi wê de neçe û xwerûbûneke mijar û vegotina edebî di kurdî de ava neke jî, em ê her pirsên weke ya jorê ji xwe bikin.

Vegotina hunera romanê, weke ku di hemû vegotinên nivîskî de weha ye, bingeha xwe ji kultura devkî stendiye. Ev kultura devkî berhema "*bîra giştî*" ye ku dibe "*bîra civakê*". Bi hemû zimanan çandeke devkî heye ku piştî peydakirina nivîsê, hêdî hêdî qels bûye û aktuelbûna xwe wenda kiriye. Nivîsê çalakiya vegotina devkî ji holê rakir, lê belê, tu carî jî dev ji peywendiyên xwe yên bi wê re berneda. Di vê têgehê de, ji bo romannivîsiya kurdî, mixabin pirsgirêkek heye. Lewre, di pêvajoya veguheztina ser forma romanê de, pêywendiya ku diviya di navbera vegotina devkî û ya nivîskî de bihataya avakirin, pêk nehat. Pêvajoya guherîna ber bi pexşanê û formên wê yên biyanî ve jî, beyî ku di kamiliyê re derbas bibe, xwe di ser gellek qadan re çeng kir û xwe da tengala zimanên ku ev nêzî çar sed sal in romana modern dinivîsin.

Hunera romanê li cem Kurdên bakurî rasterast bi teqlîdkirina romana biyaniyan ve pêk hat, beyî ku formên romana biyanî ji kurdî de dawerivin. Di vê teqlîdê de jî, ziman ji dewlemendiya xwe ya devkî bêpar hate hiştin û kêm nimûneyên dijberê wê dikarin werin peydakirin. Hewla nivîskarên ku ferhengan an jî ferhengên biwêjan di pêvajoya nivîsandina romanan de datînin ber xwe, aha ji ber vê sedemê ye, lewre nivîskar ji binî ve ji bingeha zimanê xwe bi dûr ketibûn. Lê, ne bi tenê bikaranîna zimên û şêwaz hate guhertin, hevoksaziya kurmanciyê jî herweha para xwe ji vê dejenerebûyînê wergirt. Wek mînak, rêngdêr û hokerên ku ji bo vegotina bûyeran alî zimên dikin û di wêjeyê de gellekî girîng in, bi awayekî giştî, naşibin rengdêr û hokerên ku em di berhemên dengbêjiyê de dibînin. Lê belê, ew bêtir dişibin rengdêr û hokerên ku em di zimanên ciranan de dibînin. Di vî warî de zimanê tirkî ji zimanê kurdî bêtir ji bo nivîskariya me ya bakuriyan bûye çavkanî. (Elbet mirov nikare ji bo hemû nivîskaran behsa heman helwêstê bike.)

Gava bi giştî mirov bala xwe dide zimanê romanên kurdî, mirov dibîne ku pirraniya nivîskarên me yên hemdem ji naskirina çanda me ya vegotina devkî bi dûr in, lê gellekî nêzîkî edebiyata tirkî ne ku ew bi xwe jî bi teqlîda edebiyata fransî pêk hatiye. Hingê hin romanên kurdî, ji ber vê yekê, dibin teqlîda teqlîdê.

Du mînakên wêjeya kurdî ku taybetmendiyên wê nîşan didin

Pexşan, weke awayê nivîsê, teşeyekî zimên yê bipêşketî ye. Muzîk û rîtmên zimanekî bi lêgerînên pexşanê ve dikarin zimanekî nivîsê yê bipêşketî ava bikin ku, li gora zimanê devkî, bibe zimanekî bikêrhatî him ji bo ragihandinê û him jî ji bo vegotinên wêjeyî yên nivîskî.

Bikaranîna derengmayî û bi dû re jî kêmbikaranîna pexşanê di pêşketina kurmanciyê de şikestineke çilo pêk anîbe jî, nuha girîngtirîn astenga li ber zimanê me ew e ku me hê jî ev pirsgirêka ku çareseriya wê dê ji bo zimanê me bibe şoreşek baş fahm nekiribe û rê li ber vê

seqetiyê negirtibe. Berpirsiyariya vê kêmaniyê, elbet li ser milê nivîskar û weşangeran e.

Beyî ku em bixwazin behsa têkîliya hişî û zimên bikin, divê mirov bibêje ku hişê nivîskariyê çiqasî bipêşketî be, ew ê di bikaranîna derfetên zimên de jî ewqasî zîrek be. Lewra xurtbûna nivîskêr xwe di zimanî wî re dide der. Ev hişmendiya pexşanê ku nemaze di berhema Marcel Proust de (Li Pey dema wendabûyî) xwe bi hevokên kompleks nîşan dide, dikare di berhemeke din de jî bi awayekî din derkeve holê. Lewre pexşan, hemû derfetên zimanekî yên kêmbikarhatî derdixe holê û wan çalak dike. Ji ber wê ye ku divê mirov tucarî nebêje "bipêşxistina zimên". Mirov nikare zimanekî bi pêş ve bixe, lê belê mirov dikare derfetên wî yên ku di ragihandin û ravekirinê de pêwîst in kişf bike û bi xelkê jî bide naskirin. Lewre derfetên hemû zimanan yek in, lê belê hemû ziman mîna hev di hemû waran de nayên bikaranîn.

Li gora Proust, zîrekiya nivîskarekî di hevokên wî de ye û pisporên wî, li ser pirsgirêka hevokên wî yên dirêj, dibêjin ku ji ber wê ye ku Proust hewil daye ku gellek agahiyan di nava hevokekê de û bi carekê bide. Lewre, di jiyanê de tiştên bi hev re di nava peywendiyeke kompleks de ne û hiş wan teva vê peywendiya wan nas dike û madem di navbera wî û zimên de peywendiyeke rasterast heye, hingê wan weke ku werdigire jî diteyisîne ser zimên û ji zimên jî vediguhezîne ser nivîsê.

Ligel gellek nûbûnên din ku bi pexşanê re hatine zimên, di vegotina romanesk û wêjeyî de bikaranîna hevokên kompleks ku weke haveynê zimanê kemilî tê pejirandin, ji bo nuha radeya herî bilind e ku ziman dikare xwe bigihînê, lewre awayên hişî yên tevgerê û dîtina wî ya global û dawerivandina tiştan ya ji aliyê hişî ve, bi tenê bi bikaranîna zimanekî weha ve guncaw e. Heger hiş mirovekî şoqereş û pêlavsor teva hevalê wî yê bêvildirêj û hevala wî ya guhbel û pismamê wî yê kose û dotmama wî ya devçarox dibîne û wî weha li cem xwe nas dike, hingê ziman jî divê vê peywendiya wî ya bi tiştan û kesan re weke xwe bide. Di zimanê nivîsê de jî ev peywendiya jiyanê bi rêya hevokên kompleks û gîhanekan ve tê sazkirin ku di zimanê kurdî de awayên wan yên hêsan di jiyana rojane de gellekî tên bikaranîn. Karê nivîsê îroj ew e ku awayên veşartî derxe holê û sînorên zimanê me bicerribîne.

Di roja îroj de, ji nava derfetên pexşanê, ya ku ji zimanê me kêm maye jî ew e ku ev taybetmendiya pexşanê baş nehatiye fahmkirin. Elbet, ev yek ji bandora zimanê devkî tê. Lê belê, hevokên kompleks, beyî ku bibe armanc, dikarin rêyê li ber qutbûyina vegotinên wêjeyî bigirin ku em di gellek berhemên kurdî de dibînin. Erê, mebest zimanê nivîskî ye, lê ev awa dikare zimanê devkî jî biguherîne.

Ji bo têgihîştinê, çêtir e ku mirov mînakekê bide.

"*Hecî Zorav dixwest, xwe ji Zibeyr xilas bikira. Wî ev kar û bar jî dabû Hesenê Meysê. Roj tune bû ku Hesen bela xwe li Zibeyr neda. Lê Zibeyr nediket dafikên Hacî Zorav. Haya Zibeyrê Ehmê ji bayê dinê hebû.*" (2)

Vegotineke wêjeyî ya pêşketî ku derfetên zimên baş bi kar tîne, dê tucarî van hevokên jorê venehewîne. Divê baş were fahmkirin ku di vê mînakê de behsa stîla vegotinê nabe. Lewre vegotineke wêjeyî dikare bi hevokên kurt jî were kirin. Lê belê, em di stîla vê nimûneyê de bi guman

SERHAD BAPÎR: **Penaber** (2001), Rengên Pastel, 18 x 23 cm

in, lewre tê de jî stîleke vegotinê bêtir, bandoreke zimanê devkî aşkere dibe ku ev bandor ji bo vegotina wêjeyî ya hemdem û gihîştî dikare bibe sedema qelsiya vegotinê. Ji ber wê ye ku di van pênc hevokan de du caran navê Hacî Zorav, du caran navê Hesenê Meysê û çar caran jî navê Zibeyrê Ehmê tê gotin ku mirov ji bihîstina heman navî aciz dibe. Lewre dubarekirina navan û bûyeran û peyvan, di nava wêjeya vegotinê de weke nîşanên qelsiyê tên hesibandin. Ev kar karîbû bi alîkariya cînavan jî bihataya kirin ku dê karê vegotinê hêsantir bikiraya.

Ka em agahiyên ku nivîskar bi van hevokan vedibêje, deynin ber xwe.

1- **Hecî Zorav dixwaze xwe ji Zibêr xilas bike.**

2- **Ji bo vî karî, peywirê dide Hesenê Meysê.**

3- **Hesenê Meysê bela xwe tim di Zibêr de dide.**

4- **Lê Zibêr nakeve dafikên wan.**

5- **Hayê Zibêr ji bayê dunyayê heye**.

Di vê mînakê de, pênc agahî hene ku nivîskêr, beyî ku ji derfetên ziman û nivîsandinê destkewtî bibe, heryek bi hevokekê rave kiriye. Hingê, mirov dikeve wê baweriyê ku ev hemû bûyer ji hevdu cuda tev gerriyane, lê belê bûyera yekem sedema ya duyem e û ya sêyem jî bi wê ve girêdayî ye. Bûyera çaran bi awayekî kronolojîk encama wan bûyeran e, herçend tu peywendiyeke organîk di nava wan de nebe jî. Lê belê, bûyera pêncan ku dibe sedema bûyera çaran, nîşan dide bê çima hersê bûyerên destpêkê bi ser neketine. Hingê, ev hemû bûyer di nava hev de ne û bi hevdu girêdayî ne. Madem hiş van bûyeran di nava hev de weke fikreke giştî qebûl dike, ji bo çi mirov mecbûr dimîne ku di vegotina zimanî de wan bûyeran ji hevdu cuda bike?

Ger em bixwazin ji bo heman agahiyan awayekî vegotinê yê din bi kar bînin, nivîskarî dê bi temamî biguhere:

"*Hecî Zoravê ku dixwast xwe ji Zibêr xelas bikiraya, ji bo vî karî Hesenê Meysê peywirdar kiribû. Digel ku roj tune bû ku Hesenê Meysê bela xwe di Zibêr de nedida jî, Zibêrê ku hayê wî ji bayê dinyayê hebû, tucarî nediket dafikên wan.*"

Mirov dikare bi gihaneka "û"yê, vê mînakê bi hevokekê jî vebêje.

"*Hecî Zoravê ku dixwast xwe ji Zibêr xelas bikiraya, ji bo vî karî Hesenê Meysê peywirdar kiribû û digel ku roj tune bû ku Hesenê Meysê bela xwe di Zibêr de nedida jî, Zibêrê ku hayê wî ji bayê dinyayê hebû, tucarî nediket dafikên wan.*"

Bi guhertina me re, hemû agahiyên ku têkildarî hev in, beyî ku ji hevdu qut bibin, ji bo ku herka zimên û ya vegotinê xera nebe, li dû hev in. Lewre, heger Zibeyrê Ehmê zilamekî zîrek e û hayê wî ji dunyayê heye û vebêjer jî Zibeyrê Ehmê teva van taybetmendiyên wî dadiwerivîne, hingê gava ku mirov navê wî bibêje û behsa bûyera wî bike, mirov nikare van agahiyan ji bîr bike. Heger nivîskar ji bîr bike jî, hiş ji bîr nake. Heger bi rastî jî peywendiyek di navbera zimên û hişî de hebe, hingî divê em tiştan û kesan û bûyeran weke ku di hişî de hene rave bikin. Ziman gava ku kete nava tevliheviyên tevgerên hişî, hingê dikare hemû derfetên xwe yên mirî çalaktir bike.

Erê, kurmancî xezîneyek e, kesê ku daketiye binê bîrê, heta nuha destvala venegeriyaye. Lê dîsa jî derfetên zimanê me yê vegotinê hê baş nayên bikaranîn. Ma gelo divê mirov vê kêmaniyê bixe stuyê kurmanciyê an nivîskariyê?

Îdeolojî an jî ajîtasyona wêjeyî

Gava ku mirov bandora siyasetê û tevlêbûyina nivîskaran ya şexsî jî li berhemên wan zêde bike, hingê mirov divê çend pirsên din jî aşkere bike. Nimûneya ku me bi Zibeyrê Ehmê û diyaloga wî ya dawîn da, li vira girîngtir dibe. Lewre, Zibeyr di dawiya romanê de tê û bi çend hevokan hemû romanê şirove dike û nîşan dide ku armanca Mahmûd Baksî ravekirina şerrê feodaliyê bû ku ev jî ji çepgiriya wî dihat.

Nivîskarek divê li hember bûyerên berhema xwe bi çi helwestê tev bigere? Gava ku mirov bala xwe dide hin berhemên kurdî, mirov zelalkirina hin têgeh û tevgeran, weke pêdiviyekê li ser milê xwe hîs dike.

Di gotarên vegotinî de, demên cuda tên hemberî hev: dema nivîskêr, dema xwendevên, dema vegotinê, dema bûyeran. Gava ku mirov behsa "dema bûyerên romanan" dike, divê em ji bîr nekin ku cudabûnek di nava nivîskêr û vebêjêr û lehangan de heye. Heger ev hersê dem tev li hev bibin, pirsgirêkên avakirinê dikarin di berhemê de peyda bibin. Ji xwe, ger mirov bihêle, weke ku Benvenîst (*Problèmes de Linguistique Générale)* dibêje, "*bûyer xwe bi xwe vedibêjin*" û pêdivî bi vegotina nivîskêr jî tuneye. Bi vî awayî, em dikarin bibêjin ku taybetmendiyeke vebêjeriyê di tevahiya bûyerên berhemekê de heye. Rêlibergirtin an jî qutkirina vê pêvajoya vegotina bûyeran ku xwe bi xwe pêk tê, rêyê li ber avakirina berhemeke têkûz jî digire.

Em mînakekê bidin:
Di çîroka xwe ya bi navê "şeva spî" (*Kakil*, weşanxaneya Sî, 2002) de, çîroknivîsê kurd Dîlawer Zeraq, behsa Muxliso dike ku di bin berfa spî de bi paqijkirina camên erebeyan nanê xwe derdixe. Di vê çîrokê de em Muxliso û serboriya wî ya ku di nava rastiya Kurdan re xwe dide der dibînin û bûyer heta dereke, xwe bi xwe vedibêjin. Ji bo mijara me jî ya balkêş ew e ku nivîskar di devereke çîrokê de (r. 8) sînorên vegotina wêjeyî xirab dike û teva dem û kesayetiya xwe ve, dikeve nava dem û bûyerên çîrokê.

"*Piştre ka bêje ji ber çi ye, kurik gavek bi paş de davêje. Şewla projektorê ji şevê diteyise û li rûyê wî dixe ; şanika ku li ser govika wî ya rastê ye, siyeke zirav û dirêj li ser dêma wî çêdike. Ez wî ji vê şanikê nas dikim.*"

Heta nuha me "*ez*" nedîtibû. Êdî em dibînin ku kesekî nû ji nişka ve dikeve nava çîrokê. Ji ber ku heta dawiya çîrokê kesekî din xuya nabe, em fahm dikin ku ew "ez" nivîskar e û rasterast bi xwendevanê xwe re dipeyive, lewre ew weha bawer dike ku çîroka wî têra vegotina rewşê nake û ji ber wê xwe mecbûr hîs dike ku zelaltir bike.

Nivîskar weha dewam dike:
"Hûn jî wî nas dikin. Ew Muxliso ye. Ew parçeyek ji me ye; hemû encamên şer û pevçûnên hatî jiyîn xwe di rûyê wî de dane der. Wî êşên ku li ser navê me kişandine, li aliyê çepê ya lêva xwe ya jêrîn li hev civandine."

Piştî van hevokên ku herka vegotinê didin rawestandin, nivîskar dîsa dihêle ku bûyer xwe bi xwe vebêjin.

Di berhemên edebî de, ji ber vê taybetmendiya bûyeran, mirov nikare li gora kêfa xwe herka vegotinê rawestîne û tê de nirxandinên xwe yên şexsî bike. Di sedsala 19'an de nivîskaran ev yek dikir, lewre tecrubeyeke xwendinê hê li civakê belav nebûbû. Ji ber wê ye ku, di *Mirovên hejar* (Les Misérables) de, gava ku Jean Valjen di girtîgehê de li ser rewşa xwe difikire, Victor Hugo bûyeran radiwestîne û bi xwendevanên xwe re dikeve nava munaqaşeyekê. Hugo di wî beşî de xwendevanan agahdar dike ku lehengekî romanê dikare xwe bi xwe jî bifikire û wan fêrî vê teknîka vegotinê dike. Hingê, em fahm dikin ku, di dema Victor Hugo de, vegotina wêjeyî hê xwe ava dike. Helwêsta ku Hugo di sedsala 19'an de wergirtibû û helwêsta hin nivîskarên kurd hê jî dişibe hev. Lewre, çanda xwendin û wêjeyê çandeke giştî ye û Kurd jî bi zimanine din fêrî xwendinê bûne. Ji bilî rewşên awarte, Kurdê ku dê romanekê bixwîne, teqez bi zimanine din jî romanin xwendine. Ji ber wê, em dikarin bipejirînin ku çandeke wî ya xwendinê heye. Hingê, êdî pêdivî pê nîne ku em ji wî re bibêjin ku lehengek dikare xwe bi xwe jî bifikire, lewre wî ev yek di pirtûkine din de teqez dîtiye.

Di gellek berhemên kurdî yên edebî de hin helwêstên nivîskaran yên şexsî di nava bûyerên berhemên wan de xwe didin der. Herçî helwêstên wan in, rast in û mafdar in, lê divê mirov ji bîr neke ku bûyerên berhemeke edebî di nava cîhana xwe de hene û rastî û nerastiya wan xwendevanan têkildar nake. Ji xwe, ew bûyer çendî "derew" bin jî, baweriyekê bi mirov re çêdikin, lewre ji ber "xwesepandina" wan, ew bûyerên ku têne vegotin bi me weke ku rast bin xuya dibin. Têvlêbûyina nivîskêr, dê herka vegotinê qut bike û rengê çîrokê jî biguherîne. Bi vî awayî, ew peywendiya dîrokî ya di navbera xwendevên û wêjeyê de jî derban dixwe.

Ev kamiliya nivîskariyê ku me behsa wê dikir jî di vira de baştir xuya dibe. Wêjeyê fahm kiriye ku divê bi kêr were, fahm kiriye ku divê ziman bikemile, lê ji bo kamiliyên din, ji wêjeya kurdî re hê piçekî din jî heye. Heger em bibêjin ku "bîra giştî" çavkaniya wêjeya devkî ye û bi vî awayî dibe çavkaniya wêjeya nivîskî jî, divê em ji bîr nekin ku gava ku bîra giştî veguhêze ser "bîra şexsî" hingê dibe huner û wêjeya ku bi wateya hemdem em jê fahm dikin. Bîra Kurdan ya giştî bi goristanan ve hatiye dagirtin, lê bîra şexsî ya ku yekem berhema wê û herweha yekem romana wê "*Mem û Zîn*" bû, di dema me de, sê sed sal piştî Ehmedê Xanî, tiştekî berbiçav li xwe zêde nekiriye. Bi tenê hewldan hene ku nîşan didin bê mirov dikare çi bike.

Weke ku Sartre digot: "*nîşandayin guhertin e*".

* Mijara ku di vê nivîsê de behsa wê dibe, havîna bihurî di konferans û semîneran de li Colemêrg û Dihok û Mêrdînê jî bi awayekî devkî hatiye vegotin û bi dû re hatiye berfirehkirin.

1 Em mijara berhemên wêjeyî di vê nivîsê de bi zaravayê kurmanciya jorîn bi sînor dikin

2 Mahmut Baksî.- *Gundikê Dono*.- Stockholm: Orfeus, 1988.- 107 r..- (r. 27).

SERHAD BAPÎR: **Mirov I** (1991) Pênus. 29 x 21 cm

WELATEK, NIVÎSKAREK

Ji odeyeke li Glasgowê

JAMES KALMAN *

Ez her tiştê xwe aşkere bêjim: di hilbijartinên giştî yê bihurî yên li Brîtanyayê de min dengê xwe bi kar neanî. Ne di hilbijartinên beriya wê de û ne jî di yên beriya wê de. Ez tu carî dengê xwe di hilbijartinên Brîtanyayê de bi kar naynim. Ez hez dikim carinan qeşmeriyê bikim, lê ya ku ez tercîh dikim qeşmeriya bi neviyên min re ye.

Para bêhtir xelk dibêjin qey yên ku yên tercîha wan weke ya min e, apolîtîk in. Ji me re dibêjin: lê divê hûn dengê xwe bidin! Gellek kes mirin ji bo ku mafê we yê dengdanê hebe! Ka gelo ev rast e yan şaş e, pirs ew e ka gelo hûn ji ku li meselê dinihêrin, lê belê ya ku bi awayekî karakterîstîk îddiayên bi vî rengî derdixin pêş, nezanîna dîroka çepgirên radîkal e. Dij-parlemantarîzm li Skoçyayê aliyê jibîrkirî yê tevgera sosyalîst e. Pirraniya mirovan di vê mijarê de bi tu tiştî nizanin. Û ew li bendê ne ku mirovên mîna min êdî vê mijarê ji bo guhertina mijarê bi kar neynin. Bi fikrên bi vî rengî heke em yekser ne angaje bin, em bi tena serê xwe dimînin. Dîroka gel şervanên bi dawên skoçî li pêştir digire. Ev şervan mezinên eşîran pîroz dikin û zarokên xwe û zarokên zarokên xwe yên ku bindestiyeke heta hetayê qebûl kirine, şermezar dikin.

Dema ku mirov pê dizane ku rewşenbîriya skoçî li ser nirxê bîrbiriya ferdî avabûye, hingê têra xwe îronî jî di rewşê de heye. Berê me cesaret dida ciwanan da ku pirsan bikin. Îroj ciwan rêzgirtina entellektuel an na sertewandinê fêr dibin; ji bo ku bibe weke modela anglo-amerîkî sîstema me ya perwerdeyê hîmên xwe ji dest dan.

Fîlozofiya ku nûneriya dîroka entellektuel a mirovahiyê dike, divîyabû derseke sereke ya perwerdeyê bûya. Ew dike ku em bibînin ka em li ku ne û mumkin e ku sedema hin şaşiyên me jî nîşanî me bide. Ev yek dibe alîkar da ku em van şaşiyan dubare nekin. Ji bo jihevderxistina dunyaya îroj, fîlozofî ewqasî peywendîdar e ku êdî pêşniyarî pirraniya xwendekarên me nayê kirin.

Rasyonalîzma Descartes bû xwediyê sermayeyeke girîng di rêûresma entellektuel a skoçî de. Rêbaza wê xwe dispêre hukmê çavdêriya xwe bi xwe, lê belê ji merhaleya yek kirdeyê nebihurî. Çavdêriya pêvajoya wan bi xwe ya fikrî, ji bo nûnerên fîlozofiya skoçî bes nebû. Wan hewl da pêvajoya mirovên din yên fikrî li ber çavan bigirin "*da ku dunyayê weke ku yên din dibînin, bibînin*".

Skoçyayiyê piçûk bi nezanîna çand û rêûresmên me mezin dibe. Wêjeya me karê "pisporan" e, heta li Skoçyayê jî. Yên ku burokrasiya çandî jî kontrol dikin para bêhtir vê nezanînê bi par ve dikin. Tu alaqeya wê bi mijarê re nîne, ka gelo ew li Skoçyayê ji dayik bûne yan na. Wan awira li dunyayê ya ingilîz ewqasî kiriye ya xwe ku ji wan nayê ku berhemekê li gorî estetîka skoçî binirxînin. Otorîteya herî bilind a çandê li Skoçyayê – serok-birêveberê giştî yê nû – dema ku îsal ev wezîfe peşniyarî wî kirin, hayê wî ji tevahiya cîhana me ya çandî nebû. Ji bo wî û yên ku ew girtiye kar, ji bo wezîfeya navbihurî ne diviya ku derbarê berhemên me de bi tiştekî zanîbûya.

Norman McCaig yek ji helbestvanên skoçî yên herî girîng ên sedsala bihurî ye. Ji bo sedsaliya rojbûna wî, BBC'yê qebûl kir ku bernameyekê diyarî wî bike, lê bi şertê ku komedyen Billy Connolly bernameyê pêşkêş bike. BBC bi tevahî ne ehlê mijarê ye ku hunermendên me ji hev nas bike, lê belê di nava Skoçiyan de dizane ka bê kî çiqasî navdar e... sedema vê navdariyê çi dibe bila be.

Citizen's Theatre a Glasgowê bi salan li Skoçyayê vîtrîna hunera şanoyê bû. Pê re jî ji ber siyaseta fermî berhemeke bi tenê ya skoçî neafirand, ji xwe vê jî tu kes matmayî nehişt: bi rengekî giştî, hunera herêmî ne bi tenê nirxkêm bû, ew bi awayekî xwezayî jî tune bû. Tercîhên Citizenê "bicîhbûna wê ya di asta navneteweyî de" ango serketina wê piştrast dikir.

Dema ku em digihijin temenê mirovên gihiştî, yan ji xwe re li hev tê yan jî ji ber ku em ji her tiştî re dibêjin erê, em bi hebûna dîroka radîkal dihisin. Ez sîh salî bûm û pirtûkeke min a çapkirî hebû dema ez pêhisiyam ku sala 1819'an serhildaneke skoçî pêk hatiye. Vê yekê ez di cîhê xwe de qerisandim. Ji bo ku vê "nûçeyê" belav bikim min lîstikeke şanoyê nivîsî.

Rastiya têkoşîna siyasî kêm caran dikeve nav nîqaşên raya giştî. Angajebûn, "beşdariya" hilbijartinan yan jî endametiya partiyekê ye. Lê belê dema ku stratejiyên alternatîf tên bibîrxistin, stratejiyên ku her cara ku pêwîst dibe, dewlet amade ye ku wan bixe dewrê, tu nîşanên nerazîbûnê nînin.

Ka çi bi şîddeta li dijî karkirên kanan ên di grêvê de hat, çi bi gelê Îrlandayê, bi koçberan û daxwazvanên mafê penaberiyê hat? Ka çi bi mirinên di binçavan de, bi nijadperestiya sazûmankirî, bi şerrê bi sermayeyê re hat ku destûr da ku bi hezaran karkir ji ber nexweşiyên pîşeyî û qezayên kar bimirin? Çi bi kêmkirina alîkariyên civakî hat ku kir ku rêjeya nexwendeyan, ya mirinên zarokên nûjidayikbûyî û êşa kal û pîran zêde bibe? Çi bi piçûkxistina ciwanên me hat, ên ku çawa bûn esker ew fêrî bêrûmetkirin, êşkencekirin û kuştinê kirin û paşê şandin derveyî welêt da ku berjewendiyên çîna birêveber û sermayeyê biparêzin û bihêztir bikin?

Îroj ev pirsgirêk illeh "siyasî" nînin. Cudatiyên di navbera îdeolojiyên partiyên hikumetê de gellekî kêm in yan jî qet nînin. Nîqaşên girîng li ser pirsên birêvebirinê tên kirin.

Di dema şerr de şîrketên mezin encam çi dibe bila bibe, dixwazin xwe xilas bikin. Ew bi her aliyê şerr re di têkiliyê de dimînin û xwe bi wî rengî organîze dikin ku ewlekarî û zêdebûna karê xwe biparêzin. Dewlet jî bi heman rengî dixebite. Ew hewl dide ku tevahiya fikrên raya giştî kontrol bike. Guhertin timî mumkin e, lê belê destûra guhertina şoreşgerî ku kes nikare kontrol bike, dê neyê dayin. Li hemberî ya ku mumkin e ku di guhertinên nîzama civakî de bandorê lê bike, dewlet hay ji xwe heye û ew bi xurtkirina nîzama heyî bersivê dide. Yekemîn armanca dewletê ew e ku hebûna xwe biparêze û hikumet li ser navê wê kar dike.

Şêwazên fikrî bi guherîna serdeman re diguherin. Lê belê hin neguhêrbar hene. Hebûna meqamên birêveber yek ji van neguherbaran e. Dewleta ku nûneriya wan dike ji birêveberiyên ku ji burjuwaya mezin tên, pêk tê, bi elîtan re û li ser navê sermayeyê tev digerin. Bi ser de jî statuyeke mîrateyî dane mafê mêhtingeriya li ser girseyan ku "malbata qraliyetê" û arîstokratî bi giştî dikin ku ruh pê were. Hebûna wan mohra xwe di astekê de li newekheviyên civakî xist ku mirov xwe li rastiya van newekheviyan kerr dikin. "Malbata qraliyetê" weke koleksiyoneke tekûz a xizmên dûr bi rêya nîvnûçeyên rojane yên çapemeniyê li xelkê tê pêşkêşkirin. Di demên hilbijartinan de hindiktir behsa mijarê tê kirin. Dema ku nîqaşa fermî bi awayekî demkî xwe li ser fikreke din daniye, ango behsa fikra îhtimala guhertineke strukturel ya bi rêya parlemantoyê ve dibe, hingê mîrateya dewlemendiyan û awantajên wan û fikra daîmiya newekheviyê, ne mijarên rojevê ne.

Du partî di hikumetê de hev diguherin: Partiya Karkiran û Partiya Muhafizekar ku yek ji wan navenda çepgir û ya din jî navenda rastgir a sîstema "me" ya siyasî pêk tînin. Raya giştî tê teşwîqkirin ku Partiya Karkiran bi "çepgiran" re tev li hev bike. Carinan dibe ku ferdên meyila wan a ber bi çepgiriyê ve heye, cîhê xwe di nava Partiya Karkiran de bigirin lê belê çepgiriya wan li devera ku em li gorî rêûresmê jê re dibêjin "sosyalîzm" bi dawî dibe. Ji mekîneya Partiya Karkiran tê ku van meyilên xeternak tune bike.

Rast e ku berê ji welatiyên çepgir dihat ku dengê xwe di nava Partiya Karkiran de bidin bihîstin, lê belê ew dem guherîn. Di destpêkê de ji xwe ew ne partiyek bû, belê pêkhatineke ji bo nûneriya fikrên çepgir bû ku xwe disipart pirrrengiyeke mezin a dengê proleter û sosyalîstan, sendîka û, di navê de partiya komunîst jî, komên çepgir ên radîkal. Dema dewletê êrîşên xwe yên li dijî çepgirên rastîn û tevgera komarparêz zêde kirin, weke dema ku gelê îrlandî *Sinn Fein* ji bo damezrandina hikumetekê sala 1918'an hilbijart fêr bû, piştî Şerê Cîhanê yê Yekem rewş guherî.

Ji vê demê û pê ve li Ewropayê û seranserê dunyayê guhertinên din jî çêbûn. Tevgera sosyalîst şahidî lê kir ku Enternasyonala Duyemîn li hemberî agirê welatperweriyeke korane ku bi milyonan karkir ber bi komkujiyan ve ajotin, ji hev de ket. Di encama vê de û qebûlkirina argumentên Lenîn û yên Kominternê ku bi serkevtina Şoreşa Çiriya Pêşîn ve hatin pîrozkirin, hindik mabû ku sosyalîstan bawer bikiraya ku divê ew "pirsgirêkên xwe yên herêmî" deynin aliyekî. Ji hingê ve ji bo sosyalîzmê rêyeke nîv fermî heye ku her weha tevlêbûna hilbijartinên ji aliyê dewletê ve organîzekirî jî di nava xwe de vedihewîne. Awayên din ên çalakiyan êdî ji nedîtî ve hatin, marjînal bûn yan jî bi tenê hatin hiştin.

Têkoşîna ji bo adaleta civakî bi demê re diguhere. Ya baş ew e ku em li ber hev bigirin ka em li ku ne û em li ku bûn, da ku em zanibin gelo em bi pêş dikevin yan na. Dîsa jî, nod sal bi şûn ve jî her şewaz sosyalîst beşdarî vê lîstika bi maske dibin.

Di hilbijartinên giştî yên 2010'an de ji pêncî û neh kursiyên Skoçyayê di parlementoya Brîtanyayê de bi tenê yek kete destê namzetekî muhafizekar. Di her hal û karî de û bi desteka partiya hindikahî Demokratên Lîberal, hikumeteke koalîsyonê ya ku muhafizekar wê bi rê ve dibin, nuha li Westminsterê ye. Temenê serokên herdu partiyan jî hema hema weke hev e, herdu jî kêm û zêde bi heman rengî li dibistanên lipêşgirtî yên çîna birêveber perwerde bûn, yek jê ji dûr ve pismamekî melîke Elisabeth II. ye, ya din, peywendiyên wî bi arîstokrasiya împeretoriya Rûsyayê re hene: van hemûyan bi hev re divê kiribe ku herdu nêzî hev bibin.

Ev koalîsyona heyî bi rengekî ku mirovan metelmayî bihêle dişibe "rêya sêyem" a ku di nîvê sedsala 20'an yê duyem de ji aliyê berjewendiyên dewletên brîtanî û amerîkî ve hat destekkirin û parastin. Him bi dizî ketina nav tevgera karker û sosyalîst, him bi bikaranîna kovar û weşanxaneyan ya ji bo propagandayê û him jî bi manîpulekirina nîqaşên entellektuel yên di qada gelemperiyê de, vê destekê xwe da der. Herweha, di nava "hemû derdorên civakî" de kirrîna kesên bi bandor, xwe weke diyarker îspat kir: pîşesaz, sermayedar, esker; aktorên qada dîndariyê, çandî û siyasî; birêveberên sendîka û xwendekaran. Dibe ku "siyasetên wan ên newekhev" hebin, lê belê prensîbeke wan a damezrîner a hevpar heye ku xwe dispêre "nirxên xrîstiyaniyê" yên qaşo, kapîtalîzmeke etnîk a ku li dora Xwedê dizîvire, û angajmaneke dij-komunîst ku armanca wê misogerkirina daîmî ye.

Her ji çar an jî pênc salan carekê birêveberên me bi rengekî neçar in ku ji nû ve êşê bikişînin; hinek ji wan ji nû ve tên hilbijartin, hinek nayên hilbijartin. Di vê navberê de karûbarên bi rastî dimeşin. Weke ku min beriya nuha jî gotibû, ez tercîh dikim ku qeşmeriyê ji neviyên xwe re bikim.

* Nivîskar, pirtûka wî ya dawîn: You Have to Be Careful in the Land of the Free *(Divê mirov li welatê azadiyê bi tedbîr be)*, weşanên Harcourt, New York-London, 2004.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

ROMANNIVÎSÊ BI HEYBET, BÎRDOZVANÊ BÊ HEDAN

Du rûyên Mario Vargas Llosa

IGNACIO RAMONET *





SERHAD BAPÎR: **Helebçe** (1990), Grafîka li ser Lînoleum, 16 x 20,5 cm

Romana nû ya nivîskarê perûyî Mario Vargas Llosa, xelatgirê Nobela wêjeyê ya 2010'ê (1), di roja 3'ê çiriya paşîn, yanî tam di dema wê de, derdikeve pêş xwendevanên îspanyolaxêv. Navê wê *El sueño del celta* (Xewna Seltî) ye û lêhengê wê jî Roger Casement e, kesayetiyeke rastîn û ne ji rêzê. Casement balyozê brîtanî yê li Afrîqayê bû û wî berî her kesî, di sala 1908'ê de, li dijî hovîtiyên dagîrkeriya tunekirinê (deh mîlyon mirî) derket. Ev bûyer li Kongo'yê, ji hêla keyê Belçîkayê Leopold II. ve hatibû birevebirin ku keyî ev welatê pirr mezin û nifûsa wî kiribû mal û milkê xwe yê şexsî... Di ragihandineke din de, Casement bêzariya bê sînor a niştecîhên Amazonyaya perûyî jî aşkere kiribû.

Pêşengê parastina mafên mirovan, Casementê ku nêzîkê Dublînê ji dayik bû, bi pey re tev li refên serxwebûnxwazên îrlandî bû. Tam di nava şerrê cîhanî yê yekem de, ew weha fikirîbû ku *"zehmetiyên Îngilistanê ji bo Îrlandayê fersend in"* û li ser vê, hevkariya Almanyayê xwest da ku li dijî Brîtaniyan têbikoşe. Ew bi îxaneta bilind mehkûm bû û rayedaran jî, li ser esasê qaşo rojnivîseke ku reseniya wê ne ewle ye, ew bi *"kiryarên homoseksuel"* tawanbar kir. Ew di roja 3'ê tebaxa 1916'ê de hat bidarvekirin.

Ji ber ku roman hê jî derneketiye, em nizanin ka çawa ji hêla Vargas Llosa ve hatiye honandin. Lê belê em dikarin baweriya xwe pê bînin. Romannivîsekî îspanyolnivîs yê din tune ye ku weha bikare ji xêzikên pêşîn ve haya xwendevanê xwe zevt bike û wî di çîrokên weha de binoqîne ku entrîqayên tijî evîn, tinazî, zordarî û erotîzm tê de li ser hev dibin.

Hêjayiya pêşîn a vê romanê ji xwe ew e ku ew mesela Roger Casement, *"yek ji Ewropayiyên ku pêşî xwezaya dagirkerî û hovîtiyên wê fahm kirin* (2)*"*, bi me dinasîne û vedibêje. Nivîskarê perûyî vê têgihîştinê par ve dike (bes ew dijberê tevgerrên parastina niştecîhên Amerîkaya latînî ye): *"Hovîtiya bi rengê dagirkeriyê tune ye* - ew di nîqaşeke li ser xwedêgiravî "başiyên" dagirkeriyê de derdibirre - *Birînên Afrîkayê tu carî rehet nebûn. Di dagirkeriyê de tiştekî erênî jî nayê dîtin* (3)*"*.

Cara yekem nîne ku Vargas Llosa şexsiyetên dîrokî derdixîne pêş da ku bêdadiyan şermezar bike. Ew bi şarezayî şêwazên romana dîrokî û romana civakî û rastbîn, heta romana polîsî jî, tev li hev dibe. Du berhemên wî yên herî pêşketî vê yekê îspat dikin: *Şerrê dawiya dunyayê*, çîroka bê hempa ya serhildana civateke xristiyanên ronîxistî ku di bakur-rojhilata Brezîla dawiya sedsala 19'emîn de li utopyayê digerrin; û *Cejna nêriyî* (4) ku bi honandineke pirrdengî ya zengîn re, reşiya dîktatoriya general Trujîllo (1930-1961) ya li Komara domînîkî vedibêje.

Dîroka hemdem bû mijara şahesera wî jî: *Ji katedralê re nîqaş*, şayeseke bê kêmanî ya Perûya general Odria (1948-1956), rastiya latînî-amerîkî ya salên 1950'î û nehêniyên rewşa mirovan. Şîroveyên Nobelê yên li ser xelatdayîna wî, ji bo vê romanê jî derbas dibin: *"Ji bo nexşevaniya wî ya tevnên desthilatdariyê û saloxên wî yên tûj ên berxwedan, şoreş û têkçûyina takekesî."*

Di dema nivîsandina vê pirtûkê de, Vargas Llosa li Parîsê dima û yek ji nifşê nivîskarên ciwan û berhemdar, weke Gabriel Garcia Marquez, Julio Cortazar, Carlos Fuentes bû ku bi dû re wêjeya latînî-amerîkî nû kir. Hemû çepgir bûn û hemû jî piştevanên gerîllayan bûn. Di manîfestoyeke piştgiriya gerîllayên perûyî de, Vargas Llosa weha digot ku, ji bo guherandinê, *"ji têkoşîna çekdarî pê ve rê nîne"*.

Ew bi heman awayî piştgirê şoreşa kubayî jî bû: *"Deh, bîst an pêncî sal bi şûn ve,* - wî di roja 4'ê tebaxa 1967'ê de li Karakasê digot - *dema dadiya civakî dê were, weke ku îro li Kubayê tê, û dê tevahiya Amerîkaya latînî ji împeretoriya ku wê talan dike, ji çînên ku xwîna wî dimêjin, ji hêzên ku anuha wê rezîl û bindest dikin, rizgar bibe. Ez dixwazim ku ev dem zû bi zû were û Amerîkaya latînî taliyê bigihîje rûmeta jiyana hemdem, û sosyalîzm me ji vê bêbinyadî û rezîliya me xilas bike."*

Bi dû re, di destpêka salên 1970'î de, ev şoreşgerê xwîngerm bi xwendina du cerribandinan guherî: *Riya koletiyê* ya Friedrich Hayek, û *Civaka vekirî û dijminên wê* ya Karl Popper. Bi taybetî jî bandora Karl Popper li ser wî çêbû. Wî digot: *"Ez Karl Popper'î weke ramyarê herî girîng ê dema me dinirxînim; min beşekî mezin a bîst salên dawî ji xwendina berhemên wî re veqetand, û ji min dipirsin ka pirtûka felsefeyê ya herî girîng a vê sedsalê çi ye, ez ê bê dudilî* Civaka vekirî û dijminên wê *bibijêrim"*.

Ew yekser dev ji piştgiriya şoreşa kubayî berdide, rabirdûya xwe ya "rewşenbîrê çepgir" înkar dike û, bi çalakiya kesên ku fikirên xwe guherandine, dibe berdevkekî biryardayî yê baweriya nûlîberal. Lêhengên wî êdî Ronald Reagan û Margaret Thatcher in. Ew li hemberî vê yekê, nîşana "şoreşa pasvero", *"heyraniyeke bê sînor, rûmeteke hema bêje bindarî, ya ku min li hember rayedarekî siyasî ya zindî tu carî hîs nekir* (5)*"* vedibêje. Ji ber heyecana wî ya thatcherî, ew li Londrayê bi cîh dibe... Dema ku "Jina Hesinî" di sala 1990'î de ji desthilatê dibe, ew ê baqeke kulîlkan, bi vê peyamê ve jê re bişîne : *" Rêzdar xatûn, di ferhengê de peyv hindik in da ku ez ji ber têkoşîna we ya ji bo azadiyê spasdariya we bikim* (6)*"*.

Di sala 1990'î de, ew bi bernameyeke thatcherî jî dibe berbijêrê serokkomariya Perûyê. Lê belê ew li hemberî Alberto Fujîmorî bi giranî têk diçe. Ji nankoriya hemwelatiyên xwe nerazî, ew bi awayekî mayînde terka Perûyê dike û, bi hincêta ku xelkê perûyî layiqî wî nîne, dev ji welatiya xwe berdide...

Wê demê, ew dibe heyranê rayedarekî din: Jose Maria Aznar, serokê (pirrlîberal) hikumeta îspanyolî ji 1996'ê heta 2004'ê, hevkarê George W. Bush di êrîşa Iraqê de û îroj xebatkarê Rupert Murdoch di şirketa News Corporation de. Ev siyasetmedar di nav lîsteya *"pênc kevnerayedarên dunyayê yên herî xirab"* ya kovara amerîkî *Foreign Policy* (Siyaseta Derve) de cîh digire, lê belê Vargas Llosa difikire ku *"dîroknasên siberojê"* dê Aznar weke *"yek ji rayedarên herî mezin ên dîrokê* (7)*"* binasin.

Ew ji *"şexsiyeta karîzmatîk"* a Nicolas Sarkozy û *"jêhatibûna siyasî ya nedîtî* (8)*"* ya Silvio Berlusconi hez dike. Ji ber ku ev mezinê wêjeyê bi rastî xwediyê kesayetiyeke du alî ye. Xêliya bedew a romanên wî, mezhebkirekî har vedişêre ku ji çil salan û vir ve ye ku pirraniya dema xwe ji bo nîqaşên di televîzyonan de, axaftinên di forûman de û gotarên di kongreyên li çar aliyên cîhanî de vediqetîne. Ew bi israreke hema bibêje fanatîk rêbazên îdeolojiya xwe ên bingehîn dubare dike.

Ajawekarê pirrlîberal e, endamê çalak yê Desteya Sêalî (9) ye, serokê Weqfa navneteweyî ji bo azadiyê, xelatgirê Irving Kristol ku ji hêla American Enterprise Institute ve tê dayin, lê belê Vargas Llosa neokonservatorekî profesyonel e. Wî di sala 2003'ê de êrîşa Iraqê û di pûşpera 2009'ê de jî darbeya Hondurasê rewa dîtin.

Di roja 7'ê çiriya pêşîna 2010'an de, nivîskarê reaganî yê fransî Guy Sorman, di bloga xwe de digot: *"Li Amerîkaya latînî, em pirr caran di hêman sahneyan de bûn, û Mario li wir, weke ku li Fransayê dibêjin, têkoşêrekî pirr lîberal e: ew bê navber li dijî Castro, Morales, Chavez, Kirchner û hemû bernameyên ku hindik be jî sosyal-demokrat in, derketiye."*

Ji xwe, Vargas Llosa bi bîr xist ku xelata Nobelê bi qasî jêhatiyên nivîsîna wî, ji bo fikirên wî jê re hat dayîn: *"Ku fikirên min ên siyasî* (...) *rolek leyistibe jî, pirr baş e. Ez jê pir razî me."*

Heyranê Louis Ferninand Celine ke ku ji bo wî *"romannivîsekî ne ji rêzê" bû*, ew dipejirîne ku nivîskarê *Voyage au bout de la nuit* (Rêwîtiya dawiya şevê) *"şexsiyeteke erjeng"* jî bû. Ew weha dewam dike: *"Lê belê, gellek şexsiyetên bê nirx hene ku nivîskarên bêhempa ne* (10)*"*.

* Berpirsê *Le Monde diplomatique* yê berê

1 Mario Vargas Llosa di nava nivîskarên latino-amerîkî de yê şeşan e ku xelata Nobelê ya wêjeyê wergirtiye.
Berî wî Gabriela Mistral (Şîlî, 1945), Miguel Angel Asturias (Guatemala, 1967), Pablo Neruda (Şîlî, 1971), Gabriel Garcia Marquez (Kolombiya, 1982) û Octavio Paz (Meksîka, 1990) ev xelat wergirtibû

2 *El País*, Madrid, 29'ê tebaxa 2010'an

3 *Ibid.*

4 Bixwîne: "Un romancier d'exception" (romannivîsekî ne weke yên din), *Le Monde diplomatique*, gulan 2002

5 çavkanî: Julio Roldán, Vargas Llosa entre el mito y la realidad, Tectum Verlag, Marburg, 2000, r. 161

6 *Ibid.*

7 *20 minutos*, Madrid, 6'ê tîrmeha 2007'an

8 *Il Corriere della Sera*, Milan, 9'ê adara 2009'an.

9 Desteya sêalî, rêxistineke arizî ye ku di sala 1973'ê de di nava Ewropaya rojavayî, Amerîkaya bakurî û asyaya pasîfîkê de hatiye avakirin û parêzvana bîrdoza cîhanşimûliyê ye.

10 *La Nación*, Buenos Aires, 13'ê adara 2006'an.

Wergera ji fransî: Simko Destan

KULTUR-POLÎTÎK

KEJO BAJAR

Kurd û Hollywood

Du wênekêşên şerr, Frank û David, radihijin mekîneya xwe ya wêneyan û li dunyayê digerin û wêneyên pevçûn û kuştinan dikişînin. Ev herdu wênekêş di 1988'an de, berî êrişa kîmyewî ya li Helepçeyê, ji bo kişandina wêneyên şerrê di navbera Seddam û Pêşmergeyan de, berê xwe didin Kurdistana Başûr. Dibin mêvanê 'klînîkeke şkeftî' şahidê pêşmergeyên birîndar û guhdarê bijîşkekî kurd.

Şerrê dijwar bi David giran tê, tirsa ku wê negihîje ser welidîna destgirtiya xwe jî dikeve ser û dixwaze vegere malê (Dublinê). Frank vedigere malê lê David ne bi wî re ye. Ew di êrişekê de ji her du lingên xwe dibe û qeweta Frank nagihîje ku wî xelas bike. Psîkolojiya rojnamegeran a piştî şerr, trawmaya dîmenên bi xwîn û heqjêderneketina xelaskirina hevalê xwe, wî ji çongan dike û jiyanê lê diherimîne.

Fîlm celebê Triage dram e. Çîroka wî têra xwe xurt e, ji xwe senaryo ji pirtûka Scott Anderson hatiye adabtekirin. Fîlm di 2009'an de hate pêşkêşkirin û derhênerê wî jî Danis Tanovic e ku tev li Oscar û Cannesê xwediyê gellek xelatên din e. Lîstikvanên fîlm jî têra xwe navdar in; Colin Farell rola Mark Walsh, Christopher Lee rola Joaquîn Morales, Paz Vega rola Elena Morales, Branko Djuric jî rola Bijîşk Talzanî û Jamie Sives rola David dilîze.

Ji ber ku mijara vî fîlmî li Kurdistanê derbas dibe, di warê sînorên Kurdistanê de comerd e û bi sedema ku xwedêgiravî pesnê Kurdan dide û bi xerabî behsa Tirkan dike, li Tirkiyeyê nehat pêşkêşkirin, ango bi dest temaşevanên Tirkiyeyê ve neket ku li sînemayê li vî fîlmê serkevtî temaşe bikin.



Lê gelo ev fîlm bi rastî jî pesnê Kurdan dide? Berî her tiştî çîrok (çîroka bingehîn) ne çîroka Kurdan, çîroka trawmaya wênekêşekî rojavayî ye. Erê, weke erdnîgarî çîrok li Kurdistanê derbas dibe lê ji bilî Bijîşk Talzanî (ku aktorekî lubnanî rola wî dilîze) tu Kurdên din ne xwedî ziman, hevok û 'karakter' in. Di fîlm de bi tenê hawar, qajewaj û nalîna wan a bi kurdî tê bihîstin û fîgurên wêneyên bi xwîn in. Hê serê Bijîşk Talzanî jî nezeliliye ka bê dilxwaz an mecbûrê vê berxwedanê ye. Ango weke erdnîgarî Kurdistan û weke netewe Kurd bêtir ji bo fona çîroka David a psikopatolojîk hatine bikaranîn. Ji xwe di sahneya dawîn a fîlm de gava David li xwe û derdora xwe mikur tê, edaba hundirê wî dikişe (diherike) qertên 'triage'ê ji destên wî dikevin û xwe ji trajediya şerr jî ji ezaba mirina hevalê xwe jî pak û paqij dike.

Erê, di fîlm de çawa keys lê anîne, texsîr nekirine û gotine "Kurdistan". Nexşeya Kurdistanê li ser dîwarê mala xwe neqişandine û ji bo Kurdistanê gotine noş, lê çîroka pêşmergeyan nehûnane.

Qewmên bindest ên cîhanê ji berê de xwediyê çîrok û derhêner û lîstikvanên xwe ne û di Hollywoodê de jî fîlmên di derbarê rêxistinên serhildêr ên weke ETA û IRA'yê de ne hindik in, lê ev cara yekem e ku em bi fîlmekî serkevtî, bi berhemeke derhênerekî xelatên mezin girtî û bi lîstikvanên navdar ên weke Colin Farell û Paz Vega û ya herî girîng di asta Hollywoodê de çav li reşê Kurdan dikevin. Bi tenê berhemeke xwerû ji destê hunermendên Kurdan derkeve, dikare kela dilê Kurdan hênik bike, lê te dît dilxweşkirina dunyayê ye.

Cara ewil e ku kadraja Hollywodê li ser rûyê kurdan e.

Navê fîlm: *Triage / Eyes of War* (çavên şerrî)

Derhêner: Danis Tanovic

Lîstikvan: Colin Farell, Paz Vega, Branko Djuric, Jamie Sives

Bîhoka li Pişt Sînor û Gurê Manco

Mayayiyên ku li çiyayên Guatemalayê dijîn ji çîrokbêjê xwe yî herî şareza re dibêjin "hosteyê olanê." Ji ber ku yên li çîrokbêj guhgdarî dikin bi bêdengiyêkê be jî wê olanê li wî vedigerînin. Arjen Arî'yê ku me ew betir bi helbestê wî nas dikir li rex rûspiyan rûniştiye û çîroka birînên xwe di pirtûka bi navê *"Bîhoka li Pişt Sînor"* de ji me re dibêje.

"*Êvarekê ku li dû mewlûd dixwendin, pîrê destê xwe dahiştibû bêrîka xeftanê xwe û bi îskîn gotibû: Berxikê min… ev kêr êdî ya te ye!*" Ew ê Arjen Arî rahêje wê kêrika ku mû dibirre û pê çiyayê bîranînên xwe bikole. Ji kolana wî çiyayî, xarên cîncoqî , hespikên darînî ku zarokan bi wan berra serpişta xewnê xwe dida, tasên sifirê ku xistine serê me û pê porê me jêkirine, nokên sewiyan, General Mahmûdê ku li kolanên Nisêbînê hew maye zarok teneka bi dû wî ve kin, dewleta Mîtanî, û ev rista Mar Efra'îm derkeve. "*Aştiya te bila wan bi şûn de vegerîne, ya Reb!*" Lê Arjen Arî wê venegere ji ber ku ew çav li Gurê Manco ketiye. Gurê Manco, êdî li rex şevreşkê şevan e . Wî rengê xwe û rengê tirsa me guheriye. "*Gur piştî demekê dixuyan ji me ve: Kincinê kesk li wan, hemû bi rext û tiving. Bi şildim bildimeke ku me jê fahm nedikir diaxivîn û li deriyê mala didan!*" Gurê Manco êdî dewlet bi xwe ye ku wê li dû xwe bi hezaran gundên şewitî bihêle. Êdî garana ku ber destê êvarê vedigerê gund wê tozeke xemrî li dû xwe raneke. Ji dêleva wê, bi yekîneyê Gurên Mancoyên cilkesk dê dixaneke reş bi ser gundên Kurdistanê bixînin û wê ew dixan sînoran derbas bike û xwe bigihîne qêrînên sînemaya Amûdê. Welatê ku bi têlên rasayî ji hev hatiye parçekirin dê bi toz û dûmana trajediyê bigihîje hev. Nalîna dara tûyê jî tê de. "*Esker li wê û agir meyzand. Ji pişt têlan serê xwe hejand û bi hêrs bi hêla tûyê de tû kir.*"

"Heft rojên wêneyên wan bi dîwarê bîranînê ve hilawistî."

Xortê ku di salvegera darvekirina sê merivan de (Deniz Gezmiş, Hüseyin İnan û Yusuf Aslan) belavokan li kolanên Nisêbînê belav dike, tê gilîkirin. Sermiyanê mala bavê dest bi mahkûmiya xwe ya heft rojan ku hefs jî tê de ye, dike. Wê ev belavok delîleke baş ji bo destpêka şoreşgeriya Kurd têxe destê me. Naveroka belavoka çep herçiqasî bi qasî pergalên dewletê nebe jî wê bi têra xwe di asîmîlasyonê de rolekê bilîze. Aqile mirov ku ne ji kîsê mirov be. Wê Arjen Arî telaqê çepgiriya tirk û telaqê zimanê Nazim Hikmet û Ahmed Arif têxe destê wan û rêviyê heram yê bi laşê kurmancî ve zeliqî zû bibirre. Ev cihêbûn dê Arjen Arî ber bi nivîsandina kurmanciyê ve bibe û kula nezanîbûna alfebeya kurmancî dê Seyidxan Anter bike yekem mamosteyê wî... "*kuro ew Q ye, ev Ê ye, ev X e, ev jî W ye…. tiştekî din?*"

Arjên Arî yê ku mahra fîllan bi van tîpan re birriye ev sîh sal in ku ew mehr betal nekiriye. Di "*Bîhoka Pişt Sînor*" de helbestkar çîroka çiyayên helbesta xwe ji me re dibêje û bi bîhokeke zerbûyî çîroka dilê xwe yî weke çiyayekî ji me re lê dike.

Navê pirtûkê: *Bîhoka li Pişt Sînor*

Nivîskar: Arjen Arî

Weşanxane: Avesta

Rûpel: 118

ISBN: 978-605-5585-12-9



Xadim: Kurdan çawa ji mêraniyê dixin

Zindana Amedê di hiş û bîra Kurdan de sembola wê hovîtî û barbariyê ye ku bi serê Kurdan de hatiye. Gellek ciwanên Kurd di nav wan dîwarên wê zindanê de rastî pêkanînên nemirovane hatine û bi serboriyên ku bi dû re hatine behskirin, em hîn dibin bê çawa di nav wan dîwaran de xewnên Kurdan li wan bûne şevreşk. Cureyên îşkenceya ku li tu deverên dunyayê nehatibûn ceribandin, di nav wan dîwaran de li ser serê xort û keçên Kurdan hatin ceribandin.

Hovîtî û barbariyeke weha ne pêkan bû ku di wêjeya Kurd de xwe nede der. *Xadim* a *Selahattin Bulut* berhemek ji hovitiya ku li Zindana Amedê hatibû pêkanîn e.

Xadim çîroka jimêranîxistina Kurdan ya di Zindana Amedê de ji me re vedibêje. Di vê "çîroka dirêj" de li ser serpêhatiya lehengê çîrokê Jêhat em wêneyekî ji wêneyên Zindana Amedê dibînin.

Jêhat piştî ku deh salan di Zindana Amedê dimîne û ji zindanê derdikeve, dêya wî Berfê dil dike ku kurê xwe bi Biharê re bizewicîne. Lê Jêhat bersiveke erênî nade vê daxwaze dêya xwe û piştî demeke kin ku ji zindanê derdikeve ji malbata xwe re dibêje ku ew dixwaze biçe Stenbolê û berê xwe dide wê bajarê ku ew belkî ji xwe re tê de bistire.

Dema ku diçe Stenbolê hevalê wî yê bi navê Hesen pêşwaziya wî dike û piştî ku hevalê wî Hesen behsa nexweşiyeke xwe dike û dibêje li Nexweşxaneya Ermeniyan doktorekî baş heye û bi dermanê wî baş bûye, Jêhat jî hêviya xwe bi doktorê Nexweşxaneya Ermeniyan ve girê dide û berê xwe dide wir.

Heta ku Jêhat neçe cem doktor jî em nizanin bê nexweşiya wî çiye. Lê dema ku derdê xwe ji doktor re dibêje em hay ji nexweşiya wî çêdibin:

"Rojekê dîsa deriyê hucra min vebû û polêsek ket hundir. Eynî weke wê rojê dîsa ez şût û tazî kirim, serê jopê rada devê min û ji hucrê derxistim. Ez birim odeya ceyranê. Çend polêsên ku li wira bûn destê min li paş min girêdan, darekî herdu serê wî kindirkirî di bin çengên min re derbas kirin û min bi singilekî tawanê ve daliqandin. Wextê nigê min ji erdê qut bû min got qey piyên min di nav pişta min de avêtin. Dû re çend tas av li min kirin, qabloyek bi serê kîrê min gerandin û cereyan danê. Wextê hilma min diçikiya voltaja ceyranê kêm dikirin, kêliyek derbas dibû dîsa zêde dikirin."

Belê, Jêhat ji mêranî hatibû xistin. Bi hêviya ku mêraniya wî li wî vegere çûbû ba doktor lê tu derman ji xwe re nedîbû. Piştî ku çûbû kerxaneyekê da ku hîn bibe ka gelo mêraniya wî li wî vegeriyaye yan na û dema ku dîtibû rewşa wî veneguheriye:

"Jêhat pişta xwe da pîrekê, kincên xwe li xwe kir û derket. Heşê wî sekinîbû, wê çi bikira, bi kû de biçûya nizanîbû, ne ji bo mirinê ne jî ji bo jiyanê taqeta wî nemabû, ket kuçeyekê, ji wê kuçê ket yeka din û zîz bû… Winda bû…"

Di çîroka *Xadim* ya *Selahattin Bulut* de -ku ew bi xwe jî di sala 1981'ê de hatiye girtin û heşt salan ev hovîtî li Zindana Amedê ditiye-, hûn ê nikaribin xwendina vê çîrokê ragirin. Di pêvajoya xwendina wê de hûn ê qêrînên ku di nav wan dîwaran de olan didin bibihîsin. Hêsirên we dê hêdî hêdî ji kevîkên çavên we biniqutin ser rûpelên pirtûkê.

Zindana Amedê psîkolojiyeke çawa li ser mirovên ku ev hovîtî dîtine dihêle? Ka em guhên xwe bidin Jêhat, dema ku ji zindanê derdikeve di dilê xwe de çi dibêje:

"Tifî li min be... Xîret bi min re nemaye… Ji desthilanînê ketime.. Qidûmê min şikestiye... Çav tirsiyayî bûme... Esker bi kû de del bide bi wir de diçim... Ez newêrek im… Tirsonek im ez… Erê, erê ez tirsonek im… Dilê min êdî ji min dixele... Weke mişkekî seraba me... Pîsekî derê hanê me... Lewitiyekî heram im... Xwîna min pênc pera nake…"

Navê pirtûkê: *Xadim*

Nivîskar: Selahattin Bulut

Weşanxane: Avesta, 2008

Rûpel: 90

ISBN: 978-994-4382-5-26



Qumara li ser înternetê

MARIE BÉNILDE

Jî şeş mehan û vir ve ye ku ez li ser internetê dilîzim, her meh ez % 20 meaşê xwe wenda dikim, nuha ez bê kar im, ji ber wê ez hinekî zêdetir hay ji xwe heme. Bi şev ez ji xewê şiyar dibim ku bilîzim, lê belê ez daxwazên ji bo lîstinê red dikim. Li hemberî kesên biaqil, ez xwe dikim pêkenok." Ev şahîdî li ser Le Monde.fr (1), hatiye weşandin, "Gilles" ne keseke weha ye ku bala medyaya fransî bikişîne. Ji meha hezîrana 2010'ê û bi vir ve ku tarîxa destpêka qanûna "di derbarê reqabetê û qumarê de", sîteyên qumara sportîf û yên pokerê, herweha televîzyon, radyo û komên çapemeniyê, bi armanca ku bala girseyan bikişînin, ketine nava hewldanên taybet. Pereyê ku dê di vê sektorê de bigere, bi qasî 5 milyar euroyan tê texmînkirin, lewre ev sektor bala gellek derdorên pîşesaziya temaşevaniyê jî, ne kêmî sektora gazînoyan, dikişîne ser xwe.

Serbestkirina lîstikan û ya qumara sportîf a li ser internetê, xebateke bi sebr ya lobiyê diyar dike ku li wê derê *bluf*, xirecir û pevçûnên ji bo berjewendiyan heye. Ev qanûn, di roja 12'ê gulana 2010'ê de, bi awayekî lezgîn hatibû qebûlkirin. Mehek bi şûn de, bi destpêka kûpaya cîhanî ya futbolê ku li Afrîkaya Başûr pêk hat, ev bazar vebû; operatorên qumara sportîf, herweha yên *EurosportBet* ku aîdî TF1'ê ye (televizyona fransî ku maçên kûpaya cîhanî diweşandin), hesab kir ku ew ê girseyên amator ên futbolê bikişînin cem xwe. Di dema maçan de, şîroveger Christian Jeanpierre hertim bang li temaşevanan dikir ku biçin ser malpera TF1.fr ku li wê derê derfetên lîstika *EurosportBet* hebû.

Bi Ewropayê tiştê ku ew nabêje bide gotin

Bi dawîbûna pêşbaziyê, roja 11'ê tîrmehê, 1,2 mîlyon hesabên internetê, li ser malpera lîstika *paris en ligne* (qumara înternetê) hatibûn çalakkirin û 83 mîlyon euro hatibûn xerckirin û ev pere ji aliyê 15 operatorên ku destûra xebatê ji saziya lîstikan (Arjel) girtibûn ve hatibû berhevkirin. Ev hejmar du caran ji 43 mîlyon euroyê ku ji aliyê *Française des jeux* (FDJ : Dezgeha fransî ya lîstikan) ve hatiye berhevkirin zêdetir e ku FDJ heta sala 2009'an jî monopola fermî di destê wê de bû. Li gorî FDJ'yê *"Daxwaz pirr zêde nebûne, lê belê ew ber bi teklîfên fermî ve kişiyane". Bikaranîna van lîstikan %* 72 ji aliyê dewletê ve tê kontrolkirin, ev jî dibe sedemên axavtinên rayedarên hikumetê ku dibêjin qanûna nû bûye sedem ku bîst û pênc hezar malperên neqanûnî nikaribin bala girseyan bikişînin ser xwe.

Gelo pêwîst e ku em xwe bi vê rewşa baş bigirin? Kevnewezîrê butçeyê, Eric Woerth, di sala 2009'an de, beriya ku ew projeya qanûnê pêşniyaz bike, dida xûyanî ku *"bi vê projeyê, ji aliyekî ve em berjewendiyên dewletê diparêzin, ji aliyê din ve jî em operatoran zêdetir çalak dikin"*. Bi awayekî din weha tê gotin ku kontrola qels ya dewletê – % 7.5 baca ku ji lîstikên qumara sportif û qumara ser hespan, herweha ya % 2'yê ku ji sîteyên pokerê tê girtin- nikare qaseyên dewletê tijî bike. Ji ber ku, ev nêzîkahî ji aliyê wan ve ya herî rast hatiye dîtin ku ew wê saziya taybet, a ku di sala 1539'an de, li gorî fermana François yê yekem, bi armanca bersivdayîna daxwazan hatibû avakirin, ji holê ranekin û bibin sedema astengkirina daxwazên hê dînamîk, a di derbarê lîstikên înternetê de. Saziya taybet a dewletê- ku li ser lîstikên qumarê "bibandor e"- di rastiyê de ew hêz e ku bersivê dide daxwazan : di sala 2008'an de, saziya lîstikên fransî, 2.5 milyar euro dane dewletê ku ev hejmar dike % 27.7 hatina wê. Di vê navberê de, dê were fahmkirin ku lîstikên *Pari mutuel urbain* (PMU, lîstikên qumarê yên mîna beza hespan bi rê ve dibe), ji hatina xwe % 1,1 milyar euro kêm kiriye ku ev dike % 12'ê xebata wê. Bi tenê gava ku bac jê nayê girtin, pêşketinekê pirr watedar ya bazara qumara ser înternetê dikare were dîtin.

Piştî ku meclîsê dev ji niherîna di derbarê qanûna *Hadopi* berda ku saleke berê li dijî malperên înternetê ku nirxên çandî xirab bi kar tînin dihate xebitandin, wê nexwast qanûneke weha derxîne ku pêşiyê li pêşkêşiyên neqanûnî ên qumara ser înternetê bigire, çendî saziya *Arjel* di derbarê heman mijarê de di nava hin teqîbatan de bû jî. Meclîs hê jî di nava hewldanên ji bo legalkirina operatoran de ye ku hê jî li Fransayê îllegal in. Herweha, ev operator ji çend salan bi vir ve, bi derfetên fîrmaya Stéphane Courbit ya *BetClic*, sponsorê Olympique lyonnais û hevalê serokkomar, di nava hewldanên ketina vê bazarê de ye.

Lobiyên sektora lîstikan karibûne bidin bawerkirin ku daxwazeke Ewropiyan heye ku ew monopolan ji holê bidin rakirin. Piştî biryara Santa Casayê, a di derbarê Portekîzê de ku roja 8'ê îlona 2009'an hatibû girtin, em dizanin ku tu astengî nîne ku rêyê li pêşbaziya vê sektorê bigire. Dê were zanîn ku Bruksel naxwaze di vî derbarî de "xizmetekê" bike: ew dikare di bin kontrola dewletan de bimîne, da ku dewlet bikarin xalên qanûnî û berjewendiyên gelî biparêzin. Biryareke din ku roja 8'ê tîrmeha 2010'an hate girtin, maf da Swêdê ku, bi armanca parastina lotoya xwe ya neteweyî, teklîfên lîstikên bi rêya înternetên medyayê qedexe bike. *"Mafê parastina nirxên çandî, exlaqî û olî dikarin heq bidin dewletê ku ew rêyê li pêşbaziyên di derbarê buhayê lîstikan de bigire. Nayê qebûlkirin ku berjewendiyên şexsî bi rêya derfetên gelî werin pêşxistin, ev dikare bibe sedemê tengasiyên civakê û herweha ên lîstikvanan.* (3)*"*

Tiştekî bi vê baweriya qanûnî ya ewropî ve girêdayî nemaye, qanûna fransî xeteriyên bi medyaya van lîstikan ve girêdayî nas nake. Teksta qanûna mijara gotinê bi awayekî dilxweş diyar dike ku ew nahêle ku zarok di reklama programên lîstikên zarokan de rol bigirin. Lê belê, roja 19'ê gulanê, konseya bilind ya weşanên televîzyona (CSA) ev qanûn zêde êrişker dît, ji ber ku ew destûrên dorfireh dide televîzyonan ku xwe bi xwe "kontrol" bikin, bi taybetî di derbarê hin programên hesas ku ji aliyê ciwanan ve, weke mijarên tele-realîteyê, tên temaşe kirin. Brîtanya weşana teklîfên di derbarê pêşbaziyên lîstikên qumara ser înternetê, di navbera saet 5 û 22.30'yî de, di televîzyonan de, di navbera saet 17 û 24'an de jî di radyoyan de qedexe kiriye (tenê weşanên sportîf ji derveyî vê qedexeyê ne). Saziya nîzama fransî xwedî nêzîkahiyeke weha bû ku dixwast pîvanên Brîtaniyan pêk bîne; lê belê saziyên lobiya televîzyonan bi awayekî din biryar da.

Bi vî awayî, medya di derbarê lîstikên li ser înternetê de, awantajeke mezin bi dest xistiye. Beriya her tiştî, di qada reklaman de, ew ê di salê de nêzîkê 250 mîlyon euroyan qezenc bikin. Ji aliyê din ve, ew operatorên endîrekt yên qumara ser înternetê nîn in, weke TF1 bi *EurosportBe*, an jî koma Amaury (*L'Equipe*, le Tour de France, le Dakar) bi *Sajoo.fr*, ew dîrekt hevpar in: weke nimûne, RTL, ji bo weşaneke li ser pêşbaziyên hespan, bi PMU'yê re hevkariyê dike. Bi pêşkêşkirina li ser înternetê, ew balê dikêşînin ser platformên quara ser înternetê û ew dibe sedem ku bi vê sîstemê ew berjewendiyên curbicur bi dest bixin-ev rewş tiştekî balkêş e, bi taybetî li ser înternetê-. Bi rêya televîzyonên çalak, bi taybetî di dema temaşekirina weşanên sporê de, temaşevan dikarin bi awayekî rasterast biçin ser malperan û li gorî daxwazên xwe bilîzin. Operatorên televizyona qebloyî di van rojan de, di derbarê heman mijarê de, peymanek bi şîrketa *BetClic* re îmze kiriye. Û nuha telefonên destan jî dixwazin ji heman derfetê awantajan bi dest bixin.

Ji bo ku Fransa bibe welatekî elektronîk, hemû tişt amade ne. Dema ku qaseyên dewletê vala bin, rayedar dikevin nava hewldanên klasîk da ku bi rêya lîstikan, bi rêya bacên endîrekt ku mirov jê hêvî dike ku xezîneya dewletê tijî bike, û herweha bi vî awayî tê xwastin ku reaksiyona civakê were qelskirin: *panem* û *circenses* – weke ku bi latînî dibêjin: nan û lîstik. Lê belê vê carê, serbestberdan, bi awayeke esasî, ji bo berjewendiyên hin patronên weke "kluba Fouquet's" ku di gulana 2007'an de bi pîrozbahiyên hilbijartina Nicolas Sarkozy ve hatiye baskirin: Bernard Arnault (herweha kurê wî Antoine, yê ku ji *Bwinê* re dixebite), Stéphane Courbit, Martin Bouygues, û hwd. Herweha, Florence Woerth, jina wezîr û amadekarê wê qanûnê, ji cîhana lîstikên qumara ser hespan dûr nîn e: wê xanimê, tevî jinên patronan, şîrketa *Ecurie Dam's* avakirin, di heman şîrketê de xwediyên hespên lîstikan û endamên konseya bacan jî cih girtine.

Ev arizîkirina qada lîstikan, bi taybetî dema ku operatorekî bi şîrketeke weşanê re yan jî bi rayedarekî wê re dikeve nava têkiliyên teng, dibe sedema nakokiyên berjewendiyan. Ya girîng ew e ku şîrovekarek di derbarê qadeke pêşbirka sportîf de biaxife û balê bikişîne ser wê. Ji ber ku, weke ku serokê *BetClicê* Nicolas Béraud jî dide xûyanî, malperên qumara sportîf ji aliyê *bookmakers'*an ve tên birêvebirin ku karê wan *"bazirganiya navendî"* ye (4). Ev kes lîstikên ser înternetê bi rê ve dibin û bi awayekî kêmkirina rîskan, rêjeyan bi curbicurî diguherînin. Ev nakokiya herî piçûk ya hikumetê ye ku îddia dike ku bi pêşxistina vê "aboriya gazîniyan", ew morale dide kapîtalîzmê. Ev nêzîkahî zêde ji sextekariya Bernard Madoff dûr nîne: di derbarê lîstika pokerê de, mirov dikare bernameyekê ji ser înternetê daxîne û lîstika gellek lîstikvanên xeyalî bi rê ve bibe, da ku pereyên safikan ji wan bibe.

Li vê derê, divê em sextekariya pereyê reş jî ji bîr nekin. Di adara 2007'an de, raporeke koma xebata aboriyê (GAFI) dida xûyanî ka bi rêya kîjan operasyonên lîstikên ser înternetê pereyê reş tê paqijkirin. Û roja 4'ê hezîrana bihurî, dadgeha ewropî, biryara qedexekirina lîstikên ser înternetê li Hollandayê erê kir. Ev biryar bi armanca têkoşîna li dijî sextekariyê û sûcdariyê hatiye girtin.

Êrişkirin weke qalîteya yekem e

Xeteriyên di qada tenduristiya giştî de zêdetir mezin in. Ji sala 1980'ê û bi vir ve, lîstikên bi pereyan weke sedema bingehîn a nexweşiyên psîkolojîk hatiye tespîtkirin, di bingeha pêşketina wê de xelat û diyarî hene. Heger em bihesibînin ku % 1 heta 3 kesên ku dilîzin dibin nexweşê van lîstikan, firehiya ku di nava vê girseyê de çêdibe bi serê xwe pirsgirêkek e. Herweha, xelatên ku ji aliyê operatoran ve tê pêşniyazkirin-ji bo pokerê 500 euro li ser *Sajoo.fr* – bi serê xwe hacetekê teşwîqa lîstikê ye. Li gorî Marc Valleur, şefê bijîşkên nexweşxaneya Marmottan li Parisê, ev qanûna ku rêyê li reqabetê vedike *"beriya her tiştî, ji ber sedema reklama ku tê kirin, pirsgirêkên nexweşiya ji ber van lîstikan jî dê zêdetir bibe* (5)*"*.

Divê em rewşa psîkolojîk ya lîstikvanên ku bi rêya înternetê dilîzin û yên din ji hev cuda bibînin (6), profesorê li zanîngeha brîtanî ya Nottinghamê Mark Griffiths texmîn dike ku, ji ber sedema potansiyela nenas, saxlemî, bêsînoriya demê, û herweha nepenîbûnê, lîstikên ser înternetê zêdetir mirovan teşwîq dikin û bi xwe ve didin girêdan. Gelo ev tedbîrên ku hatine girtin bi tena serê xwe bes nîn in ku teşwîqa van lîstikan bi sînor bikin?

Têkoşîna li dijî girêdana bi van lîstikan, ya ku li gorî qanûna fransî tê xwestin, piştî vê qanûna di derbarê vekirina operatorên nû de, zehmet dixuye ku bigehîje armanca xwe. Li vê derê formeke neqanûnî ya civakî heye, heman mijar ji aliyê Aurélie Filippetti ve, parlementera partiya sosyalîst, weha hatiye şîrovekirin : *"Inserm'ê* (7) *daye xuyanî ku ev lîstik li gel xizanan zêdetir bi bandor bûne û pirsgirêkên sosyal mezintir kirine. Çendî hejmara pereyê ku pê tê leystin kêmtir be jî, bi tevahî rêjeya xercên van lîstikan li cem xizanan zêdetir e"*. Çendî qanûn destûrê nade ku kes ji hesabê xwe yê banqeyê zêdetir bilîze jî, ev nabe sedemê ku mirov pereyan deyn nekin û ji xwe re derfetên dîtir peyde nekin.

Bê guman êdî pêwîst nîne ku mirov xeyal bike ka berjewendiyên çawa li pişta vê dayina destê nû hene. Franck Daninos, di pirtûka xwe ya *Dîroka pokerê* de (8) dide xuyanî ku, wateya vê lîstikê bi tenê ew e ku bi pereyan were lîstin. Televîzyonan, bi rêya kamerayên minyatur ku dikare kaxezên lîstikvanan bide dîtin, zêdetir û bi awayekî dorfireh rûyê nû yê pokerê daye naskirin *"sportîf, dramatîk û kêfxweşî"*. Hunermendên weke Nicole Kidman û Ben Affleck (an jî Patrick Bruel li Fransayê) karibûn, bi awayekî rewa, lîstikeke weke *"pireya çandî"*, a ber bi Amerîkayê ve bidin xuyanî, di heman demê de "*ew serxweşiyeke desthilatdariyê ye ku divê li ser maseyekê tu bikarî qelsiyên kesên li hemberî xwe bi kar bînî"*. Lîstikeke bi pereyan e, mirov dikare bi taximan jî bilîze, bi tena serê xwe jî, ne li dijî banqeyekê, lê belê li dijî *"xwe bi xwe"*, di demên weha de êrişkerî dibe kalîteya yekem û herweha xapandin û sextekarî jî weke "*bluf*" tê dîtin. Pirraniya wan di dawî de dibin *groggy*, weke Alexis Ivanovitch, lîstikvanê Dostoyevskî : *"Bi sergêjiyeke mezin ez ji ser maseyê rabûm"*.

*Rojnamevan, nivîskara berhema *Em mêjiyan baş dikirin. Reklam û medya* Raisons d'agir, Paris, 2007.

1 8'ê çiriya pêşîna 2009'ê

2 Agence France-Presse (AFP), Paris, 14'ê tîrmeha 2010'ê

3 AFP, 8'ê tîrmeha 2010'ê

4 *Cf.* Nameya pîşesaziya lîstikên bi perey ên înternetê (www.igamingfrance.com), 16'ê tîrmeha 2009'ê

5 *Le Monde*, 2'yê tîrmeha 2010'ê

6 Mark Griffiths, "Gambling online - problem gamblers more susceptible, research shows", Nottingham Trent University, www.ntu.ac.uk

7 Enstîtûya neteweyî ya lêgerîna tendurustiyê û dermanan

8 Franck Daninos, *Dîroka pokerê. Avatarê dawî yê xewna amerîkî*, Tallandier, Paris, 2010

Wergera ji fransî: Ahmet Dere

WÊNESAZÊ VÊ HEJMARÊ

Serhad Bapîr

Di sala 1964'an de li Bakûrê Kurdistanê, li bajarê Tetwanê ji dayîk bûye. Ji ber beşdariya tevgerên polîtîk, di sala 1983'yan de serê wî bi cûntaya Tirkan ya wê demê re kete belayê û lê geriyan.

Di sala 1984'an de, weke penaberekî polîtîk, derbasî Yûnanîstanê bû. Ji sala 1987'an heta 1992'yan beşê Wêne û Hunerên Pratîk yê Akademiya Hunerên Ciwan a Zanîngeha Aristotelis a Selanîkê xwend.

Di beşê wêneyê de li atolyeyên Prof. Vangelis Dimireas û Dimitris Kondosda ders wergirtin. Ji bo xwendina xwe ya hunerî ya zanîngehê, di navbera salên 1985-1992'an de ji Enstîtuya Kurdî ya Parîsê bûrs stend.

Di navbera salên 2001 û 2006 an de, di Beşê Grafîkê yê heman zanîngehê de, li atolyeya Prof. Ksenefon Sahinis xwend.

Ji sala 1995'an heta 1997'an li Navenda çandî ya Stavrupolis a Selanîkê wek mamosteyê resim xebitî. Ji sala 1997'an û bi vir ve di dibistana navîn de kar dike.

Ji sala 1993'yan û bi vir ve endamê Komela Hunermendên Nîgarkarî ya Bakûrê Yûnanîstanê (K.H.N.B.y.), ji sala 1994'an pê ve jî endamê yekîtîya Hunerên Nîgarî ya Yûnanistanê ye û ji sala 2005'an şûn ve endamê yekîtîya Grafîkçêkerên yûnan e.

Ji sala 1985'an vir ve li Selanîkê dijî.

Serhad Bapîr, tevî gellek Pêşengehên şexsî û giştî bûye ku çend minak ji wan ev in:

Li Yûnanistanê gellek pêşengeh li dar xistine. Li derweyî Yûnanistanê jî, mina bajarên Stockholm/Swêd û li Qahîre/Misirê jî tevî pêşengehên navneteweyî bûye.

Jiyan bi kurdî xweş e

**Gelê me yê bextewar û serbilind,
Ziman, hunerê milletekî yê herî mezin e.
Ziman, raman û ruhiyet e. Hebûn, nasname
û navnîşana milletekî ye.
Civat, gel, yan milletê ku zimanê xwe ji bîr kirine,
ketine reşaşiya dîrokê û tune bûne. Yên ku parastine,
bûne sazî, bûne komar û mezin bûne û ruhê wan jî
şên bûye. Ji ber ku dunyaya xwe rengîn kirine. Ji ber
ku ziman rengîniya jiyana mirovatiyê ye.
Ji ber vê yekê, bi vê renginiya zimanê me,
raserî welatê me, raserî hemû parên Kurdistanê,
me ziman di destê xwe de hiştiye.
Ji ber ku welatê me perçe perçe kirine, hemû
êymetên welatê me ji destê me girtine.
Edebiyata me şewitandine, dîroka me reş kirine,
ji nava pirtûka dîrokê çirrandine û avêtine.
Lê, zimanê kurdî ewqas dewlemend e, di nava
xwe de bi cuda û rengîn zaravayan, zazakî,
kurmancî, soranî, goranî, loranî, her çi be…
Li malên xwe bi zarokên xwe re bi zimanê
xwe biaxivin, ji kerema we.
Ji ber ku nasnameya me, navnîşana me,
hebûna me, ev ziman e.
Zimanekî dewlemend e.
Enstîtusyon, komele û hemû saziyên kurdî
bi pêş xin, alîkariya wan bikin, da ku ew jî
xizmeta me bikin.
Ji ber wê yekê, di destê me de hunera
me ya herî mezin ku vê gavê heye, lê,
di destê we de ye çawa bê parastin.
Li mêrgan, li çiyan, li zozanan, li gund
û bajaran, bi hev re bi kurdî biaxivin.
Bi zarokan re bi kurdî biaxivin, da
ku ruhê zarokan, ramanên zarokan
bi zimanê kurdî bê stirandin û
pêşeroja me ronahî bike.
Ji ber ku pêşeroja me di destê
zarokên me de ye.
Û hebûna me jî di destê zimanê
me de ye.
Bi zarokên xwe re, bi zimanê xwe
biaxivin, hebûna me ê şên bibe.
Zimanê kurdî gellekî xweş e.
Biaxivin.
Bi kurdî qise bikin.**

Şivan Perwer

NAVEROK

ÇIRIYA PAŞÎN 2010

Zengila fransî
Serge Halimi
▶ R. 1

Guman
Îbrahîm Seydo Aydogan
▶ R. 1

Bila her kes li ber
hêlîna xwe bireqise
Dr. Selîm Temo
▶ R. 2

Şoreşa bêhnfireh pêk nehat
Benoît Bréville
▶ R. 3

Qazakistan an jî
jeopolîtîkaya Ewrasyayê
Régis Genté
▶ R. 4

Hevpeyvîn bi Kanat Saudabayev re
Gaël Guichard-Sherbina
▶ R. 5

REHE, rêxistineke
ewlekariyê ya kêmnas
Fabio Liberti
▶ R. 6

Rehendê mirovane
Caroline Fleuriot
▶ R. 7

Li ser "ewlehiya bi hevkariyê"
Alain De Neve
▶ R. 8

Encamên Çernobîlê yên tenduristiyê
Alison Katz
▶ R. 8

Rewşa awarteya daîmî
Slavov Zizek
▶ R. 9

Rasta amerîkî û serkevtina wê
Walter Benn Michaels
▶ R. 10

Tevgera Tea Party'ê li Teksasê
Robert Zaretsky
▶ R. 11

Ji têkoşîna bo xweseriyê
ber bi meyla serxwebûnê ve
Chris Kutschera
▶ R. 12

Misir bi ku de çû ?
Sophie Pommier
▶ R. 15

Hevkariyeke nedîtî û nixumandî
Hevaltiya Îran û Hindistanê
ya taybetî
Isabelle Saint-Mézard
▶ R. 16-17

Ji odeyeke li Glasgowê
James Kalman
▶ R. 20

Du rûyên Mario Vargas Llosa
Ignacio Ramonet
▶ R. 21

Kultur - Polîtîk
Kejo Bajar
▶ R. 22

Qumara li ser înternetê
Marie Bénilde
▶ R. 23

Forma Abonetiyê

Nav:
Name

Navnîşan:
Address

Koda Postayê:
Postcode

Bajar:
City

Telefon:

E-Mail:

Abonetiya salane (12 hejmar!)

☐ Almanya (50 €)

☐ Derveyî Almanyayê (60 €)

☐ Abonetiya dîjîtal (20 €)

Independent Kurdish Media Group GmbH (IKMG)
Carnotstr. 4 - D-10587 Berlin

Berliner Volksbank - Hesab/Account/Konto: 2284 1230 10 - BLZ: 100 900 00
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 10 - BIC/SWIFT: BEVODEBB